

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Ferda BİNGÖL

KÜRT (KURMANCI) EDEBİYATINDA MİTOLOJİK BİR KAHRAMAN
OLARAK RÜSTEM-İ ZÂL

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2021

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Ferda BİNGÖL

KÜRT (KURMANCI) EDEBİYATINDA MİTOLOJİK BİR KAHRAMAN
OLARAK RÜSTEM-İ ZÂL

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ

Doç. Dr. Ayhan TEK

MUŞ-2021

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Ferda BÎNGÖL

DI EDEBIYATA KURDÎ (KURMANCÎ) DE WEK LEHENGEKE
MÎTOLOJÎK RUSTEMÊ ZAL

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Doç. Dr. Ayhan TEK

MÛŞ-2021

NAVEROK

NAVEROK	I
ÖZET.....	II
KURTE	III
ABSTRACT	IV
PÊŞGOTIN	V
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

ŞEHNAMEYA FIRDEWSÎ Û LEHENGÊ ŞEHNAMEYÊ: RUSTEMÊ ZAL

1.1. ŞEHNAMEYA FİRDEWSÎ	5
1.2. DÎ ŞEHNAMEYA FİRDEWSÎ DE EPÎZODÊN RUSTEMÊ ZAL.....	11

BEŞA DUYEM

EDEBİYATA HEMASÎ Û AFIRANDINA LEHENGAN: RUSTEMÊ ZAL

2.1. BÎNYADA ÇÎROKA RUSTEM Û WEK LEHENGEKÎ TAYBETİYÊN RUSTEMÊ ZAL.....	23
2.2. TEORİYÊN LÎ SER LEHENGAN Û RUSTEM WEK LEHENG.....	30

BEŞA SÊYEM

DI ÇANDA KURDAN DE ŞEHNAMEYA FIRDEWSÎ, ŞEHNAMEYA KURDÎ Û RUSTEMÊ ZAL

3.1. DÎ EDEBİYATA KURDÎ YA KLASÎK DE RUSTEM.....	50
3.1.1. Di Hin Helbestên Modern De Rustem	54
3.2. DÎ EDEBİYATA KURDÎ YA GELERÎ DE RUSTEM.....	58
ENCAM.....	71
ÇAVKANÎ.....	74
KURTEJIYAN	79
ÖZGEÇMİŞ.....	80

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

KÜRT (KURMANCİ) EDEBİYATINDA MİTOLOJİK BİR KAHRAMAN OLARAK RÜSTEM-İ ZÂL

Ferda BİNGÖL

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Ayhan TEK

2021, 86 sayfa

Zaloğlu Rüstem, Firdevsi'nin *Şehname* adlı eserinde yer alan olağanüstü özelliklere sahip kahramanlardan biridir. Rüstem-i Zal, yüzyıllar boyunca yalnızca İran'da değil, Ortadoğu'nun Farsça dünyası dışındaki kültürlerinde de yansımaları bulmuş bir kahramandır. Kürt edebiyatında da kahramanlık anlatılarının en çok bilinen ve üzerine en çok konuşulan-yazılan karakterlerden biri olmuştur. Rüstem ile ilgili hem klasik Kürt edebiyatında hem de halk edebiyatında oldukça zengin materyaller, göndermeler ve folklorik-tarihi öğeler bulunmaktadır. Rüstem-i Zal karakteri, tek bir zamanın ve tek bir olayın kahramanı değil, farklı zamanlarda farklı olaylarda kurtarıcı rolünde karşımıza çıkmaktadır. Dolayısıyla zamanlar-üstü bir mitolojik kahraman olarak özellikle İranî toplumsal bellekte varlığını sürdürmektedir. Rüstem-i Zal bir kahraman olarak daha çok Fars edebiyatında karşımıza çıkmakla beraber Kürt edebiyat ve kültüründe de yaygın olarak işlenmiştir. Bunun ötesinde, Kürtçe *Şehname* örneklerinin yazılı kültürdeki varlığı dikkat çekicidir. Bu bağlamda pek çok Kürt anlatıcı ve edebiyat tarihçisine göre, Rüstem zaten "Kürt bir kahraman"dır. Bu çerçevede, elinizdeki bu çalışmada Firdevsi'nin *Şehname* eserinden yola çıkarak Kürt edebiyatında Rüstem anlatılarının yansımalarını tespit etmeye çalışacağız. Bu amaçla *Şehname*'deki Rüstem'i tanıtip Kürtçe edebiyatın sözlü ürünleri ve klasik şiirinde bu karakterin yayılım alanını göstermeyi amaçlamaktayız. Diğer taraftan efsanevi-mitolojik bir kahraman olarak Rüstem-i Zal'in kahramanlık özelliklerini hamasi edebiyat bağlamında analiz etmeye çalışacağız.

Anahtar Sözcükler: Rüstem-i Zal, Hamasi Edebiyat, *Şehname*, Kürtçe Şehnameler, Kahramanlık, Pehlivanlık.

KURTE
TEZA MASTIRÊ
DI EDEBIYATA KURDÎ (KURMANCÎ) DE WEK LEHENGEKE MÎTOLOJÎK
RUSTEMÊ ZAL
BÎNGÖL, Ferda

Şêwirmend: Doç. Dr. Ayhan TEK

2021, 86 Rûpel

Rustemê Zal, yek ji lehengên xwediyê taybetmendiyên derasayî yê berhema *Şehnameya Firdewsî* ye. Rustemê Zal, bi sedan salan ne tenê li Îranê, yanî ji xeynî cihana Farisî di gelek çandên Rojhilata Navîn de lehengekî naskirî ye. Di edebiyata Kurdî de jî ji bo vebêjeyên hemasî bûye kesayetê zêde hatiye zanîn û li ser hatiye nivîsîn û gotin. Di derheqê Rustem de hem di edebiyata Kurdî ya klasîk de hem ya gelêrî de materyalên gelekî berfireh, hêmanên folklorîk-dîrokî cih digirin. Rustemê Zal, lehengekî tenê yek-wext û yek-çîrokê nîne, di demên cûda û bûyerên cûda de wek lehengekî xelasker derdikeve pêşberê me. Ango Rustemê Zal, wek lehengekî mîtolojîk yê der-zemanî bi taybetî ji bo gelên Îranî di hefizeya civakî de hebûna xwe didomîne. Digel vê yekê Rustemê Zal di edebiyata Farisî de gelek zêde hatiye bikaranîn. Digel vê yekê, hem di edebiyata Kurdî ya nivîskî de hem jî di çanda Kurdî ya devkî de jî wek lehengekî muhim derdikeve pêşberî me. Ji xeynê vê, *Şehnameya Kurdî* di çanda nivîskî de xwediyê cihekî taybet in. Ligel vê, li gorî gelek nivîskar û vebêjerên Kurd, Rustemê Zal “lehengekî Kurd” e. Di vê çarçoveyê de bi vê xebatê, em dê hewl bidin ku ji *Şehnameya Firdewsî* heta numûneyên di edebiyata Kurdî de nîşan bidin, ta ku dengvedanên vebêjeyên Rustem bêne dîtin. Bi vê yekê em dê Rustemê Zal bidin nasîn û hem di helbesta klasîk de hem di çîrokên gelêrî de bi tevê vana di çanda devkî de em li pêy şopa Rustem ketin. Ji aliyê din ve em ê di çarçoveya edebiyata hemasî de li ser taybetmendiyên lehengîya Rustemê Zal bisekinîn û tehlîla wan bikin.

Peyvên Sereke: Rustemê Zal, Edebiyata Hemasî, *Şehname*, *Şehnameya Kurdî*, Qehremanî, Pehlewanî

ABSTRACT
MASTER’S THESIS
RUSTEM-I ZAL AS A MYTHOLOGICAL HERO IN KURDISH LITERATURE

Ferda BİNGÖL

Advisor: Assoc. Prof. Ayhan Tek

2021, Page: 86

Rustem-i Zal is one of the protagonists who have extraordinary features from Ferdowsi’s work named *Shahnameh*. Rustem-i Zal is a hero who has reflected not only in Iran but also in the Middle East cultures outside the Persian world for centuries. He has also become one of the most well-known and most talked and written-about characters of heroic narratives in Kurdish literature. There are quite rich materials, references, and folkloric-historical elements about Rustem in classical Kurdish and folk literature. The nature of Rustem-i Zal is not the hero of a single time and a single event but appears in the role of savior in different events at different times. Therefore, as a mythological hero above the times, he continues to exist in Iranian social memory. Although Rustem-i Zal appears as a hero in Persian literature, he is also widely used in Kurdish literature and culture. Furthermore, the presence of examples of Kurdish *Shahnameh* in written culture is remarkable, and according to many Kurdish narrators and literary historians, Rustem is already a “Kurdish hero.” In this context, in this study, we will try to determine the reflections of Rustem narratives in Kurdish literature based on Ferdowsi’s work, *Shahnameh*. For this purpose, we will introduce Rustem in *Shahnameh* and trace this character in the oral works of Kurdish literature and classical poetry. On the other hand, we will try to analyze the heroic features of Rustem-i Zal as a legendary-mythological hero in the context of epic literature.

Key Words: Rustem-i Zal, Epic Literature, *Shahnameh*, Kurdish *Shahnameh*, Hero, Wrestler.

PÊŞGOTIN

Efsane, destan û vebêjeyên mîtolojîk ji demên borî yê meçûl heta van rojan di gerdûna manewî ya mirovan de wek hêmanên bawermendiyê cih girtine. Bi taybetî jî çîrokên mîtolojîk herçend derasayî bin jî ji bo nêrîna gelên qedîm wek “heqîqetên serdemên beriya dîrokê” hatine qebûlîkirin. Yek ji meşhûrtirîn lehengên mîtojojiya Rojhilata Navîn, Rustemê Zal e. Bêguman ew, ji bo gelên Îranî wek sembola hêz, serfirazî û wêrekîyê ye ku cihê wî di hafizeya civakan de xwediyê cihekî girîng e. Li gorî baweriya Kurdan jî Rustemê Zal bi xwe Kurd e. Ji ber vê baweriyê jî di edebiyata Kurdî de bi formên cûr bi cûr em rengvedanên vî lehengî dikarin bibînin.

Çawa ku hêmanên mîtîk û lehengên mîtolojîk di nava zargotina milletan de bi rengên nû her car xwe dubare dikin û xwe ji nû ve bi me didine sehkirin, xebatên zanistî yê li ser van mijaran jî “nû” yan jî “ji nû ve” tên nivîsîn. Lewma çawa ku veguherîna metafor û mîtan tebi’î û “ji xwe” û “xwe-ber” pêk tînin, gotinên min yê li dor vê xebatê jî girêdayî vê tradîsyona vegotinê ne. Çunku çîroka Rustem çiqas tete gotin evqas tete nasîn û lehengê çîrokê ji nû ve dibe lehengê vegotinê. Yanî di her carê de Rustem ji nû ve di hafizeya xwûner û guhdaran de dihête însakirin. Ji ber wê jî min niyet kir ku di nav vegotinê de, yanî di nava wê alema “hatî gotin” de ji nû ve bidin zanîn ku ka Rustem qehremanekî çawa ye. Yanî min xwest analîzek bête kirin ku ka li ser metnên Kurdî di hafizeya civakî de Rustemê Zal heta îro çawa hatiye.

Ji aliyê din ve di zargotina Kurdî de çîroka Rustemê Zal sembola vegotina dûr û dirêj e ku di dawiya çîrokê de guhdar ji çîrokê dipirsin ku ka Rustem jin bû yan mêr bû... Ev yek, ji îşareta dirêjbûna çîrokê wêdatir, ji aliyekê ve xelekên girîft û metaforên la-mekan yê çîrokê ve girêdane ku ew hêman guhdaran ji dema xwe dûr dixin û dibine biyaniyên dem û çîrokê.. ji aliyê dî ve jî ewqas vegotin û hêza gotinê serdest dibe ku guhdar lehengê çîrokê Rustemê Zal jibîr dikin ku ew ji kirasê cinsiyetê derdikeve û ji nû ve di dema vegotina çîrokê de -wek zarokek nû hatî dinyayê- tete sazîkirin... Wêca di vê çarçoveyê de digel kûrbûna mijarê, xebatên hatî kirî jî bûne sebeb ku ez gotinên xwe kurt bibirim. Lewra min nexwest di xebateke zanistî de gotinan dubare bikim. Ligel wê -helbet kêmasî li aliyekê- hêvîdar im ku tesbîtên di vê xebatê de hatine diyarkirin, deriyên nû li ber xebat û lêkolînerên vê qadê vekin.

Di dawiyê de jî, ji bo sebr û eleqeya ku nîşanê min daye û ji bo hemû alîkariyên wî spasiyê li şêwirmendê xwe Ayhan TEK dikim.

MUŞ-2021

Ferda BİNGÖL

DESTPÊK

Ebu'l-Qasim Firdewsî (940?-1020?) yek ji navdartirîn şairê edebiyata Farisî ye ku ew bi berhema xwe ya bi navûdeng *Şehnameyê* ve dihête nasîn. Wî bi *Şehnameyê* dîrok, mîtolojî û vebêjeyên lehengiyê di nava hev de bi aheng bi kar aniyê. Berhemên bi vî awayî beriya wî jî kêr zêde hebûn, lê naveroka tu yekî wek *Şehnameyê* dewlemend nebûye. *Şehname*, derîyekî nû li çanda rojhilata navîn vekiriyê. Firdewsî bi vî berhema xwe hem li edebiyata nivîskî hem li edebiyata devkî bandorekî mezin kiriye ku *Şehname* bi teqlîd û wergeran gelek belav bûye. Ji aliyekî din ve jî mijarên têde bi tena serê xwe gelek bal kişandine ser xwe. Helbet em dizanin ku Firdewsî, mijarên *Şehnameyê* tenê ji ber xwe ve nehonandine. Wî ji çavkaniyên cur bi cur sûd wergirtiye. Lê nayê înkarkirin ev naveroka ku bêriya *Şehnameyê* jî dihat zanîn, bi vî berhemê re zêdetir eleqe dîtiye û ji jibîrkirinê xelas bûye. Ji ber wê jî *Şehname* aliyekê ve jî dîrok, hafize û hişê hevpar yê çanda Iranî ye. Di nava wê hafizeya ku *Şehnameyê* jî xîmên wê saxlemtir kiriye de, Rustemê Zal wek “lehengekî nemir” derdikeve pêşberê me. Loma jî Rustemê Zal, ji bilî şahan di *Şehnameyê* de kesê herî naskirî ye ku mirov dikare bibêje navê wî li tevahiya rojhilata navîn belav bûye.

Lêkolîner dema ku *Şehnameyê* li gorî serdeman binbeş dikin senifandinê wiha dikin: Serdema mîtolojîk, serdema lehengiyê û serdema dîrokî (Yıldırım, 2015: 396). Ji vî senifandinê jî xuya ye ku mîtolojî û lehengî di *Şehnameya* Firdewsî de xwediyê roleke girîng e. Rustemê Zal, li gorî *Şehnameyê* lehengê herî navdar yê dema Keyaniyan e û ji bo serdema lehengiyê kesê herî berbiçav ew e (Yıldırım, 2015: 396). Rustemê Zal, di *Şehnameyê* de ji hêmanên serdema mîtolojîk nehatibe hesabandin jî em dikarin bibêjin ew wesfên lehengên mîtolojîk dihewîne. Ji bûyîna wî hetanî mirina wî em di her gavê de simbolên mîtolojîk dibînin.

Tevahiya gelên pêşhatî, lehengên xwe yê netewî, bi çîrok û efsaneyan mezintir dikin, çîroka van lehangên bi hêmanên fantastîk tîr xemilandin, di gelên cuda de be jî taybetiyên van lehangên gelek dişibin hev (Rank, 2018: 9). Ji bo hişmendiya gelan çawa ku lehengên wek Rustemê Zal; tu car bi bin nakevin û her dem serfiraz in, artêşa û gelê ku xwediyê van lehangên e bi heman awayê tu car bi bin nakevin, her dem serfiraz in. Ji ber vî gel, li lehengên ku xwediyê hêzekî derasayî ne xwedî derdikeve.

Heman rewş di çanda Kurdî de jî derdikeve pêş. Lehengên netewî yên mîtolojîk êdî ji efsane, destan û çîrokan derketiye û keteya nava jiyana rojane. Li gorî nêrîna gelê Kurd ev leheng bi hêz, feraset û xisletên xwe ve bêhempa ne.

Herçend navûdengê Rustemê Zal bi *Şehnameyê* re gihîştibe asta herî jor, ji bo Kurdan ciyê wî cuda ye. Li gorî hin nêrînan Rustemê Zal Kurd e, di nava Kurdan de hin kes Rustemê Zal wek Kurd dihesibînin û wisa lê xwedî derdikevin. Dengvedanên efsane û vebêjeyên li ser Rustem di edebiyata Kurdî de jî bi vî şiklî derdikeve pêşberî me. Di edebiyata Kurdî de ji berhemên gelek kevn yên nivîskî bigire hetanî vebêjeyên gelek kevn ên devkî em dikarin navê Rustemê Zal bibînin. Di her cûreyê edebî de em dikarin mînakên nîşan bidin: helbestên klasîk, destan, efsane, çîrokên gelêrî, stranên gelêrî, biwêj û hwd.

Di vê xebatê de em ê li ser Rustemê Zal ê lehengê sereke yê *Şehnameyê* bisekinin. Da ku bidin berçav ka Rustemê Zal di edebiyat û çanda Kurdan de bi çi awayê hatiye nexşandin. Bi vê armancê em dê hem di edebiyata Kurdî ya kalsîk de hem di edebiyata Kurdî ya devkî de bikaranîna Rustem û lehengbûna wî binêrin. Berhem û mînakên ku em lê hûr bûne yên Kurmancî ne.

Berhemên ku heta niha di qada Kurdî -Kurmancî- de li ser Rustemê Zal hatine nivîsîn, zêdetir wek berhevkirina çîrokên gelêrî yên menzûm û mensûr in. Hin berhevkar rasterast çîrokên ku bihîstine neql kirine. Lê hin ji wan çîrokên cûr bi cûr ên Rustemê Zal ên ku ji çavkaniyên cuda berhev kirine, bi xwe cardin honandine û berhemên nû di formên çîrokan an jî romanên de saz kirine. Em di vê xebatê de dê ji van berheman îstifade bikin. Di qada edebiyata klasîk de Rustemê Zal, bi gelemperî wek mezmûn hatiye bikaranîn. Di helbestên klasîk ên Kurmancî de Rustemê Zal –bi gelemperî- ne serlehengê berheman e, lê ew wek sembola hêz, wêrekî û pehlewaniyê derdikeve pêş.

Xebatên akademîk ên Kurmancî yên di derbarê Rustemê Zal de hatine amadekirin jî hene. Bi qasî ku me dest xistiye, du tezên lîsansa bilind di Zanîngeha Mardin Artukluyê de bi şewirmendiya Shahab Valî hatine amadekirin. Yek ji wan xebata Sami Çelîktaş ya bi navê “Tîpolojîya Lehengê Kurd Li Çarçoveya Nêrînan Joseph Campbell –Bi Mînakên Rustemê Zal û Memê Alan-” e. Ev xebat; bi teoriyên monomîtê û rêwitiya leheng ya Joseph Campbell, du mînakên lehengê Kurd yên navdar vedikole. Li gorî van

teoriyan tîpolojiya lehengê destanên Kurd –Rustemê Zal û Memê Alan- hatiye analîzkirin. Ya din xebata Rojbir Çalîşir: “Destana Rustemê Zal (Metn-Lêkolîn)” e. Ev destana ku xebat li ser wê hatiye sazîkirin destanekî ji “Şehnameya Kurdî” ye. Serlehengên destanê Rustemê Zal û kurê wî Cihangîr e. Di wê xebatê de, ev destana ku bi tîpên Erebî -lê bi zimanê Kurmancî- hatiye nivîsîn bi tîpên Latînî hatiye transkîrîbe kirin. Armanca xebatê lêkolîn û danasîna vê destanê ye û zêdetir li ser têgeha destanê û di helbestên epîk de rola lehengê hatiye sekinîn. Bi nêrîn û teoriyên Joseph Campbell lehengê destanê hatiye analîz kirin. Di van her du xebatan de jî Rustemê Zal, tenê bi yek mînakê berhevkerî ya jî çanda gelêrî û bi heman teoriyê hatiye şîrove kirin.

Armanca me ew e ku bi vê xebatê em di çanda Kurmancî de cih û mîsyona Rustemê Zal zelaltir bikin. Di qad û kategoriyên cuda de, bi berhemên cihêreng edebiyat, zargotin û hişmandiya Kurdan de wek leheng rola Rustemê Zal em ê derxin holê. Di vê çarçoveyê de hem di helbestên klasîk de hem di çîrokên gelêrî yên ku ji aliye lêkolîner û xebatkarên vê qadê ve hatine berhevkerin û wek berhemên nivîskî hatine çapkirin de li pêy şopa Rustemê Zal bikevin. Da ku em ê bi vê awayê cihê “leheng”ê ya civakî bibînin. Lehengên wek Rustemê Zal ku carinan wesfên lehengên mîtolojîk lê bar dibe carinan jî di wesfa lehengê efsaneyî derdikeve pêşiya me, di nava gel de tenê wek hêmanekî edebî nayên dîtin. Ew kesayeteke nemîr û zindî ye. Em dixwazin li ser vê taybetiya Rustemê Zal bisekinin.

Dema ku em behsa Rustemê Zal bikin, divê pêşiyê em *Şehnameya Firdewsî* û *Şehnameya Kurdî* bidin ber çav. *Şehnameya Firdewsî* bi çîrok, kesayet, bûyer û hêmanên xwe yên dîrokî ji bo çanda Kurdan berhemeke balkêş e. Heke em bixwazin lêkolînê li ser Rustemê Zal bikin divê em bandora *Şehnameya Firdewsî* ji bîr nekin ku di vê berhemê de Rustem roleke girîng dilîze. Rustem di edebiyata cîhanê de zêdetir bi *Şehnameya Firdewsî* hatiye naskirin. Rustemê Zal hem di *Şehnameya Kurdî* de hem di *Şehnameya Firdewsî* de kêm zêde bi heman awayê derdikeve pêş.

Beşa yekem ya xebata me dê li ser Firdewsî û *Şehnameya wî* be. Di vê beşê de em dê hewl bidin ku agahiyên derbarê Firdewsî û berhema wî *Şehnameyê* de neql bikin. Dîsa di vê beşê de em dê serpehatiyên Rustemê Zal ên li *Şehnameyê* vebêjin û bi kurtasî bûyerên herî meşhûr veguhêzîn.

Çarçoveya beşa duyem dê li ser teoriyên derbareyê lehengan û afirandina lehengan be. Da ku em bikaribin li ser teoriyên sereke yên li dor lehengên mîtolojîk û efsaneyî rawestî û Rustemê Zal jî di vê kontekstê de binirxînin. Piştî em dê peydabûn û belavbûna lehengiyeke mîtîk ya Rustemê Zal ya di nav çanda devkî û edebiyata nivîskî de vekolîn. Digel wê, em dê hewl bidin ku van teorî û agahiyên li dor lehengan hatine, li ser vebêjeyên Rustemê Zal hatin tetbîqkirin.

Di beşa sêyem de em dê li ser nêrîna Kurdan rawestî ku ka Kurd girîngiyeke çawa didin Şehnameyê û digel wê çavekê li “Şehnameya Kurdî” bigerînin. Lewra *Şehname*, hin efsaneyên li ser rehên Kurdan dihewîne. Em jî dê li ser van efsaneyan bisekinin û di *Şehnameyê* de ciyê Kurdan binêrin. Ji aliyê dinê em li belavbûna *Şehnameyê* ya di nav Kurdan de û *Şehnameyên* bi zimanê Kurdî hûr bibin.

Cardin di vê beşê de em dê bibînin ku di berhemên edebiyata Kurdî ya Klasîk de Rustemê Zal bi çi awayê û bi çi niyetê hatiye bikaranîn. Di vê beşê de çend mînakên sereke yên helbesta klasîk yên ku navê Rustemê tede derbas dibin em dê wek numûne neql bikin. Bi vê neqlê mebesta me ew e ku bi vê awayê em ê li gorî nêrîna helbestvanên klasîk mîsyona Rustemê Zal derxin holê.

Di serenava dawî jî dê li ser efsane, destan û çîrokên Rustemê Zal ên di edebiyata Kurmancî ya devkî de be. Ji bo vê beşê em ji çend berhemên çanda devkî çîrokên Rustemê Zal hatine berhevkirin îstîfade bikin.

BEŞA YEKEM

ŞEHNAMEYA FIRDEWSÎ Û LEHENGÊ ŞEHNAMEYÊ: RUSTEMÊ ZAL

1.1. ŞEHNAMEYA FIRDEWSÎ

Şehnameya Firdewsî berhemeke menzûm e ku bi awayê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Ev berheme dîroka Iranê ya kevn vedibêje ku di merkeza wê de jiyana siltanên Irana kevin heye. Hem ji aliyê vegotina estetîk û edebî hem jî ji aliyê naveroka xwe ya li dor çarçoveya edebiyata hemasî, *Şehname* wek berhemeke kanonîk û bingehîn hatiye qebûl kirin. Ji ber wê jî wergerên wê di gelek zimanan de çêbûne û xebatên ilmî yên girîng li ser wê hatine kirin. Ji ber taybetiyên wisa, *Şehname* ne tenê li Îranê di gelek edebiyata rojhilatê de bêguman cihekî gelek girîng digire. Ev berhem di nava xwe de hêmanên wek mîtolojî, dîrok, çand, kevneşopên netewî, bawerî, destan û efsaneyan dihewîne; bi tevê van hêmanan berhem dewlemendtir û biqîmettir dibe. *Şehname* ya ku hem wek berhemek dîrokî hem jî wek berhemek edebî dikare were hesibandin, ji dema hatiye nivîsîn heta niha bi sedan salan -di serî de li edebiyata rojhilatê- tesîreke gelek mezin li edebiyata cihanê kiriye. Herwisa wek me li jorê jî gotî, ev berhema Firdewsî ya ji gelek çavkaniyên devkî û nivîskî sûd girtiye, bûye metneke kanonîk. Lewra tesîreke mezin li gelek berhemên li pey xwe jî kiriye.

Derbarê jiyana Firdewsîyê muellifê *Şehnameyê* de agahiyên têr û tije di destê me de nînin. Bi qasê ku tê zanîn nasnameya wî “Ebu’l-Qasim” e û ji bo navê wî yê rastî di çavkaniyan de agahiyên cuda cih digirin. Li gorî van agahiyên navê Firdewsî ya rastî ji van navan yek e: Ehmed, Hesên, Mensûr. Ew li bajarê Tûsê di sala 940’an de hatiye dinê. Wî perwerdehiyeke baş dîtiye, zimanên wek Erebî û Pehlewî dizanibû. Firdewsî, xwestiye xwe bigihîne Siltan Mehmûdê Xezneyî û *Şehnameyê* îthafê Siltan Mehmûd (971-1030) bike. Li gorî rîwayetan gelek astengî derketine pêşîya Firdewsî: Şair û wezîrên Siltan Mehmûd destûrê nedane ku ew qîmeta *Şehnameyê* ya ku heq dikir bide Firdewsî. Axirê xelateke biçûk dane Firdewsî. Firdewsî jî wî xelatê kêmqîmet li çend kesan belav dike. Dîsa li gorî rîwayetê piştê vê bûyerê Firdewsî ji bo Siltan Mehmûd hîcwîyeyekê dinivîse. Li ser têkiliya Firdewsî û Siltan Mehmûd rîwayeta din jî wiha ye: Siltan ji bo lehengê efsaneyî yê *Şehnameyê* Rustemê Zal dibêje: “Di nava leşkerên min de gelek ên wek Rustem hene.” û Firdewsî dibêje “Xweda kesek wek Rustem neaniyê rûyê erde.” Siltan ji vê gotinê gelek aciz dibe, hers dikeve, fermana kuştina Firdewsî

dide. Lê Firdewsî xwe ji Siltan xelas dike, direve Heratê. Li wir ji bo Siltan hîcwîyeyek nivîsiye. Firdewsî piştê nivîsîna *Şehanmeyê* heta dawîya emrê xwe bi feqîrî jiyaye. Lê dîsa tê rîwayetkirin ku Siltan Mehmûd ji kirina xwe poşman bûye. 60 hezar zêr ji bo Firdewsî şandîye lê heta ew xelat tê derê bajar, cinazeyê Firdewsî rabûye. Firdewsî bajarê ku lê hatibû dinê, li Tûsê, wefat kiriye. Ji bo dîroka mirina wî agahiyên cuda hene: Di hin çavkaniyan de 1020 (H. 411), di hin çavkaniyan de 1025 (H. 416) tê gotin (Kanar, 1996: 125-127; Ritter, 1993: 643-649; Kültüral & Beyreli, 1999: XVII).

Firdewsî herçend di jiyana xwe de zehmetî dîtibe û ji aliyê hikimdar û mezinan ve qîmetek nedîtibe jî, berhema wî ya navdar li pey mirina wî heta van rojan bi sedan salan wek şaheser hatiye zanîn. Ew yek nîşanê me dide ku, berhemên nivîskî çawa dikarin bibin binyadê hişmendîya gelê xwe. Bîlasebeb nîne ku *Şehname* wek “Qur’an’a Farisan” tê binavkirin (Yıldırım, 2015: 374). Berhema Firdewsî ne tenê edebiyatê, dîrok, çand, kevneşop, rê û rêbazên jiyana rojane, efsane û destan, adab û usûla gelê Îranê jî dihewîne. Gel bi van mijarên wê yên berfireh, misyoneke muhîm li *Şehnameyê* bar kiriye.

Dîroka Firdewsî dest bi nivîsîna *Şehname* kiriye yan sala 980 yan sala 990 e. Di sala 1018’ê de qediyaye. Cara pêşîn beş beş hatiye nivîsîn û li dû xebatên bi salan, bi rêzeke kronolojîk hatiye lidarxistin. Em nizanin ka Firdewsî, ji kîjan beşê dest bi nivîsê kiriye. Lê li gorî awayê dawî bûyer bi rêza dîrokên xwe, ji afirandina mirovê yekem Keyûmersî destpê dike û heta Ereb li Îranê dibin serdest bi dawî dibe. Di *Şehnameyê* de ji dewrên Pîşdadî, Keyanî, Eşkanî û Sasanîyan bûyerên epîk û efsaneyî cih digirin. Çîrokên kesên navdar yên wek Cemşîd, Dehhaq, Gave (Kawa), Ferîdun, Zal, Rustem, Efrasîyab, Keyqawus, Keyxusrew, Îsfendîyar, Dara, Îskender hatine vegotin (Kanar, 2010: 289; Ritter, 1993: 643-649; Kültüral & Beyreli, 1999: XVIII). Firdewsî bi van mijarên gelek berfireh ku ji mirovê yekem dest pê dike û heta desthilatdariya Ereban ya li Îranê didome; ji mîtolojiyê, efsane û destanan bigire heta bûyerên rastî yên dîrokî hêmanên gelek dewlemend li berhema xwe reşandîye. Jixwe ev mijarên berfireh û dewlemend in ku bûne sedem ta ku *Şehname* bibe metneke ev qas bibandor. Çimkî bi kîjan çavê bê xwendin, *Şehname* dikare tesîrê li her xwendevanan bike. Lewra hem naverok dewlend e hem uslûb û zimanê berhemê di asteke bilind de ye hem jî teknîka vegotina şairî xweser e. Ji ber van hemû sedeman *Şehnameya* Firdewsî bûye metneke

kanonîk ku hem çanda vegotinê ya li ser qehremanîyê li gor uslûba xwe ji nû ve saz kiriye, hem jî li hember hafîzeyaya millî ya koleketîf a Iranîyan zindî kiriye.

Bi gotina Firdewsî, *Şehname* ji 60 hezar beytan pêk tê, lê di nusxeyên bi dest ketine de hejmara beytan di navbera 48 hezar û 52 hezaran de diguhere (Ritter, 1993: 648). Firdewsî bi hişmendiya xwe ya netewî, bi zaneyî xwe ji peyvên Erebi dîr hêlaye. Di nava bi hezaran beytan de tevê navên taybet û peyvên hatiye dubarekirin de tenê 669 peyvên Erebi cih digirin û ji zimanên din jî bi tevahî tenê 20 peyv hene; ji xeynî van peyvên yanê din hemû bi Farisî ne (Yıldırım, 2015: 376). Xuya ye Firdewsî ne tene ji aliyê mijar û naverokê ve herwisa ji aliyê zîmanê berhemê ve jî bi hişmendiya netewî tevgeriyaye. *Şehname* ji aliyekî ve nemirbûna destan, efsane û çîrokên dîrokî yanê Îranî pêk anîbe, ji aliyekê ve jî li hemberî zimanên serdest hêza zîmanê Farsî derxistiye pêş. Ji taybetiyên girîng yanê *Şehnameyê* yek jî zîmanê Firdewsî yê zelal, şewaza wî ya sade û safî, uslûba wî ya fesîh e.

Me gotibû naveroka *Şehnameyê* ji mijarên gelek berfireh pêk tê: Wek her mesnewiyê di serî de bi hemd, sena û pesndayîna Xwedê destpê dike û bi beşên wek pesndayîna aqilî, afirandina cîhanê, afirandina mirovan, afirandina rojê, afirandina hîvê, pesndayîna pêxember û eshabên wî, sebebê nivîsîna *Şehnameyê*, serpehatiya şair Deqîqî (m. 976?), nivîsîna kitêbê û şîreta destekî, pesndayîna Ebû Mensûr, pesndayîna Siltan Mehmûd didome. Piştê van beşên wesfa destpêkê, şair derbasê mijara esas dibe. Ji Keyûmersî -hem mirovê yekem hem padişahê Îranê yê yekem e- heta Yezdîcerdê padişahê dawîn yanê Sasaniyan, pencî padişah û dewrên padişahiya wan li *Şehnameyê* cih digire (Firdevsi, 1994). A rastî ev berhem herçend wek dîroka padişahan xuya bike jî ji mîten afirandina mirovan û tiştan, felsefe û exlaq, çand û kevneşopî, şîret û pend, lehengî, evîn, çanda gel heta welatên cînar bi teswîrên xurt li *Şehnameyê* hatine reşandin.

Li gor nêrîna hevpar ya lêkolîneran *Şehname* divê di sê serdemên sereke de were dabeşkirin: serdema mîtolojîk, serdema lehengî û serdema dîrokî (Yıldırım, 2015: 391; Şişman & Kuzubaş, 2017: 85). Em dikarin bibêjin Firdewsî ji bo ji serî heta dawî dîroka Îranê binivîse hem ji vebêjeyên mîtolojîk hem ji efsane, destan û çîrokan hem jî ji heqîqetên dîrokî sîd wergirtiye. Ji aliyê din ve em dibînin ku Firdewsî vegotina xwe bi

desthilatdariya Ereban ya li Îranê bi dawî kiriye, bêguman ev yek jî bêsebeb nîn e. Ihtimal e ku ev yek girêdayî bi fikrên Firdewsî yê welatparêziyê bin.

Şehname, di wesfa ansiklopediya çand û şaristaniya gelê Îranê de ye (Yıldırım, 2015: 390). Li dinyayê tu millet, xwediye berhemek wek *Şehnameyê* ku hemû kevneşopên dîrokî yên gelê xwe bihewîne nîne (Ritter, 1993: 646). Dîroka gelekî bi destê şaîrekî ve ji bo gel, bi zimanekî fesîh, safî û paqij hatiye nivîsîn.

Elbet *Şehname* bûye çavkaniya gelek berhemên li dû xwe û bi heman awayê ji gelek berhemên bêriya xwe jî istifade kiriye. Di nava van çavkaniyan da em dikarin metnên dînî yên wek *Avesta*, *Qur'an* û *Tewrat*, metnên dînî-edebî yên bi zimanê Pehlewî hatine nivîsîn, *Hudaynameya* ku Enûşîrvanê padişahê Sasaniyan daye nivîsandin ku wek dîroka fermî ya Sasaniyan tê hesabandin, *Şehnameya* Ebû Mensûr û *Şehnameyên* din ên bêriya Firdewsî hatine nivîsîn û *Goştasbnameya* Deqîqî bijmêrin (Yıldırım, 2015: 377-384). Bi tevê van berhemên nivîskî Firdewsî ji çend rîwayet û efsaneyên di nava gel de tê gotin jî îstifade kiriye (Ritter, 1993: 648). *Şehnameya* Firdewsî bi vî şiklî bûye wek deryayekî ku ava gelek çeman dikeve serê û ew derya ev hezar sal in bûye îlham û çavkaniya edebiyatê.

Di edebiyata Farisan de ji berhemên zêdetirîn hatine teqlîdkirin yek *Gulistana* Se'diyê Şîrazî (m. 1292) ye, ya din *Şehnameya* Firdewsî ye (Kanar, 2010: 290). Berîya Firdewsî hin *Şehnameyên* cûr bi cûr, *Hûdayname*, *Goştasname* û hwd. hatine nivîsîn lê dîsa jî yên din ne li ser gel ne li ser edebiyata li pey xwe evqas bandor nekirine. *Şehname*, bi çîrokên mêrxasiyê, destan, heqîqetên dîrokî, nesîhetên exlaqî, bûyerên efsaneyî, û çîrokên evîne ku di nava xwe de dihewîne deriyê li berhemên dû xwe vekiriyê.

Eger em behsa mesnewînûsên girîng ên edebiyata Farisî bikin, bêguman di serê wan de divê navê Firdewsî bê zikirkin. Firdewsî berhema xwe ya navdar *Şehname* bi teşeya mesnewiyê nivîsiye û di demeke zû de bingeheke xurt a mesnewînûsiya edebî avêtiye (Adak, 2019b: 250). *Şehnameya* Firdewsî di edebiyata Îranê de ji bo mesnewiyên mêrxasiyê mînaka yegane û sereke ye (Ritter, 1993: 648). Li pey Firdewsî di edebiyatên Rojhilatê de tradîsyona *sehname*-nivîsînê destpê kiriye. Çendîn helbestvan bi berhemên xwe yên musteqîl ên li dor lehengên *Şehnameyê* saz kirî, berdewamî û bicîhbûna vê tradîsyonê pêk anîne. Herwiha wisa tê qebûlkinin şeweya

“name”yê ku li Asyaya Navîn ji bo vebêjeyên destanî tê bikaranîn bi *Şehnameyê* dest pê kiriye (Şişman & Kuzubaş, 2017: 14). Nivîsîn û belavbûna *Şehnameyê* derî li nivîsîna berhemên wek xwe yên nû vekiriye. Di nava van berheman de yên herî girîng ev in: *Samname*, *Gûrşasbname*, *Feramurzname*, *Cîhangîrname*, *Behmename*, *Berzuyename* (Pala, 2018: 425).

Di varyasyonên *Şehnameyê* de ên ku tenê li ser lehengekî saz bûne -wek *Îskendername*, *Gûrşasbname*, *Samname*- jî hene, ên ku ji serî heta dawî wek *Şehnameyê* bûyerên cûr bî cûr dihewînin jî hene.

Firdewsî, bi *Şehnameyê* dîroka gelê Îranê nivîsiye. Ji bo gelên Îranî *Şehnameya* Firdewsî ji serê heta dawî heqîqeta dîrokî ye (Goodrich, 1999: 4). Ji vê aliyê ve em dikarin *Şehnameyê* bişîbînin *Historiaya* Heredotî. Mijara vê berhema Heredot (B.Z. 484-425?) şerên di navbera Yewnaniyan û Persan e. Berhema Heredotî ji bo dîroka Arîyan yek ji çavkaniyên herî kevn e (Bakır & Altıngök, 2011: 386). Lê gelên Îranê, wek gelên Rojavayî dîroka bi tenê bi Heredot re girêdayî nedîtin, di destê wan de zêdetir çavkanî hebûn; Rojavayî malbatên Îranî bi navên ku Heredot neql kiriye –wek Darius, Kyros, Kambyzes- nas dikirin lê Îranî şahên xwe bi navên wan ên Persî ve nas dikirin (Goodrich, 1999:4). Di *Şehnameya* Firdewsî û *Dîroka* Heredotê de mijar û kesayetên hevpar jî hene. Wek mînak Alper Tunga yê hikimranê Tirk ku Heredot bi navê “Modova” cih dide, di *Şehnameyê* de “Efrasiyab” e; mînakekî din jî Kyros jê behs dike, di *Şehnameyê* de şahê Îranê Keyxûsrew e (Bakır & Altıngök, 2011: 408).

Heredot dibêje; ên ku yezdanan dide nasîn û wesfên wan vedibêjin Homeros û Hesiodos in, ango dibêje ew -vebêjerên efsaneneyan û mîtolojiyê- pêxemberên dîne serdemên ewilîn in (Erhat, 1996: 7). Gotinên Heredot ji bo Firdewsî jî derbasdar in. Firdewsî jî bi *Şehnameya* xwe ji afirandina mirovê yekem bigire heta kesayetên mîtolojîk û menqîbeyên dîrokî di qadeke gelek berfireh de bûye rêber. Ango çawa ku pêxember ji bo kesên jirêzê qencî û xirabiyê ji hev veqetînin û rastiye bizanibin rê nîşanê wan didin, Firdewsî jî bi heman peywirê rê nîşanê gelê xwe dide. Berhema wî ji wek kitêbên pîroz qedrê dibînin. Firdewsî hem dîroka gelê xwe hem baweriya gelê xwe ji serî de afirandiye. Ji ber vê ye ku ji bo *Şehnameyê* “Qur’ana Eceman” tê gotin. Çawa ku di nava qisseyên pêxemberên dem û baweriyên cuda de bûyerên, kesayetên, motîfên hevpar hene di çîrokên *Şehnameyê* de jî bi berhemên cuda re hevparî heye.

Çawa ku rehên *Şehnameyê* bi jêderên cur bi cur ve girêdayî ye, *Şehname* jî ji bo berhemên li pey xwe bûye kaniyekî xurt. Efsane, mîtos û çîrokên ku Firdewsî berhev kirine û ji ber xwe ve tiştan li wan zêde kirine, li pey Firdewsî berbelavtir bûne.

Şehname; bi saya naveroka xwe ya rengîn, dewlemend, balkêş -ne tenê li çand, huner û edebiyata Îranê- li hemû çandên rojhilata navîn bûye berhemek ku gelek li ser hatiye sekinîn. Li şaristanên cîranê Îranê wek Kurd, Ereb, Tirk û hwd. ev berhem li gelek welatan hem bi awayê wergerê hem bi awayê adaptasyonan pir caran cih girtiye. Çîrok, efsane û destanên li *Şehnameyê* wek vebêjeyên serbixwe di çanda devkî de jî di edebiyata nivîskî de jî dihêne dîtin.

Şehname ji bo zimanên cuda hatiye wergerandin. Li gor çavkaniyan *Şehname*, cara yekem ji aliyê dîroknasê dewra Eyyûbiyan Bûndarî ve *Şehname* di sedsala 12. de bo Erebî hatiye wergerandin (Kantar, 2010: 290). Li gor Pala jî di vî warî de xebata yekem wergera Erebî ya kêma ku dawiya sedsala 12. ji aliyê Kivamuddîn Ebu'l Fettah îbn Elî ve hatiye çêkirin e (2018: 425).

Şehnameyê bandorekî mezin li edebiyata Tirkî jî kiriye. Di edebiyata Tirkî de ji bo kesên wek meddah ku çîrokên ji berhemên Erebî û Farisî hatine wergerandin dixwendin, “Şehnamehan” dihat gotin (Şişman & Kuzubaş, 2017: 14). Îskender Pala agahiyên wisa dide: Wergera duyem û tam ya *Şehnameyê* bi Tirkî ye û di sala 1510’an de ji aliyê Tatar Ali Efendi ve hatiye kirin û ji Kansu Gavri re hatiye pêşkêşkirin (2018: 425). Lê Zuhâl Kültüral dibêje ku ev agahî şaş e (2010: 290). *Şehnameyek* Tirkî ya Şerîf-î Amîdî (mirin: 1514) jî heye. Mehdî, bi pexşanî wergerandiye Tirkî (Pala, 2018: 425). Her wisa hin kesayetên û bûyerên xeyalî yê *Şehnameyê*, di helbesta Tirkî de derbas dibin (Onay, 2016: 30). Muallim Cevdet hin beşên berhemê bi navê “Şarkın İlyadası (İlyadaya Rojhilatê)” weşandiye û 20.000 beytên *Şehnameyê* ji aliyê Necatî Lugal ve hatiye wergerandin (Kültüral, 2010: 291).

Şehname, ji çandekî nas û nêzê Kurdan, ji çanda qedîm a Îranî derketibû holê. Kurd gelek aşînayê mijar, bûyer, çîrok û vebêjeyên *Şehnameyê* bûn. Ji aliyê din ve girîngiya *Şehnameyê* ji bo Kurdan ev e: di vê berhemê de çîrokeke li ser kokên gelê Kurd heye (Firdevsi, 1994: 57-59). Li gor vê çîrokê Kurd û Faris ji heman kokan tî. Ji ber van xalan *Şehname* ji bo Kurdan zêdetir watedar e. Kurd tenê bi nêrînek edebî nêzîkê vê berhemê nebûne. Bi çaveke dîrokî û çandî jî lê dinêrin.

Wek cureyeke edebî *Şehname* di nava gelê Kurd de jî belav bûye. Di derheqê *Şehnameya Kurdî* de zêde agahî di destê me de nînin ku di beşên pêş de em ê zêdetir li ser vê mijarê bisekinin.

Ji bilî van wergerên ku me li jorê behs kir, *Şehname* ji bo zimanên cuda jî hatiye wergerandin. Latînî, Îngîlîzî, Almanî, Fransîzî, Îtalyanî ji van zimanan hinek in (Pala, 2018: 425; Ritter, 1993: 648-9).

Profesorê Amerîkayî Norma Lorre Goodrich, di berhema xwe ya bi navê *Ancient Myths* de beşeke li ser Rustemê Zal jî nivîsiye. Ev beş ji aliyê Nergîza Torî ve ji bo Tirkî hatiye wergerandin û ev beş wek pirtûk bi navê *Sam, Zal ve Oğlu Rüstem* (Sam, Zal û Kurê wî Rustem) hatiye weşandin. Di vê berhemê de Goodrich dibêje:

Naveroka vê beşê, ji cilda yekem a *Şehnameyê* û ji nivê cilda duyem pêk tê. Di vê wergera xwe de min ji çend wergerên *Şehnameyê* sîd girt:

1. Wergera Fransîzî 3500 rûpel Jules de Mohl
2. Wergera Îtalî 400 rûpel Îtalo Pizzi
3. Wergera Îngîlîzî 4500 rûpel G.em E. Warner
4. Wergera Îngîlîzî 412 rûpel Atkinsin (weşanger). (1999: 4-5)

Goodrich lê zêde dike; hin beşên *Şehnameyê* ji Almanî û zimanê din jî hatiye wergerandin, lê dîsa jî xwendevanên Rojavayî *Şehnameyê* bi helbesta navdar ya Matthew Arnoldê ya bi navê "*Sohrab and Rustum*" nas dikin (Goodrich, 1999: 5).

1.2. DÎ ŞEHNAMEYA FİRDEWSÎ DE EPÎZODÊN RUSTEMÊ ZAL

Ji bo serpehatiya Rustemê Zal ya dirêj em ê ji du wergerên *Şehnameyê* yên bi Tirkî sîd bigirin: Ya yekem wergera Necatî Lugal û Kenan Akyüz e ku ji aliyê MEBê ve di sala 1994an de hatiye weşandin. Lê ev wergereke nîvcuyî ye. Ya duyem jî wergera Şerîfî ye û ji aliyê Zuhâl Kültürâl û Latîf Beyrelî ve hatiye latînîzekirin. Ev berhem jî di sala 1999an de ji aliyê weşanên TDKyêve hatiye çapkirin. Li gorî van wergerên *Şehnameyê*, çîroka Rustemê kurê Zal wiha ye:

Samê kurê Nerîman yek ji pehlewên navdar ê Şah Menûçehrî ye. Çi kurên Sam çênebûne û ew ji ber vê yekê gelekî xemgîn e. Axirî Sam digihîje mirazê xwe, keçikeke rûheyv û ciwan ji Sam hamle dimîne. Çendek dû re Xwedê kurekî dide Sam. Rûyê lawikî wek tavê bûye lê porê wî wek yê kal û pîran spî bûye. Kesên li derdorê pêşî ji

Sam tirsiyane ku jê re bibêjin ku ew kurê ku ewqas li hêviyê bû bi vî awayê porspî hatiye dinê. Dema Sam bi vê bextreşiyê dihesse dibeje: “Qey ev ceza ye ku ji Rebbê mezin hatiye, ka pehlewaniyê navdar pê bihesin ezê bêjim çi? Ew ê bi min bikenin.” Ferman daye maiyeta xwe ku vî zarokê ecêb ji welatê wî dûr bixin. Çiyayê Elbruzê ji warê mirovan gelek dûr bûye, hêlîna Sîmirx jî li wir bûye. Zarokê dibin, li wî çiyayê datînin. Sîmirx li wî zarokê bêkes xwedî derdikeve. Sal û dem diborin, zarok li wî çiyayî qewî dibe. Şanê lawikî li derdorê belav dibe, dawiyê ev agahî diçe guhê Samî jî.

Sam, di xewna xwe de dibîne; kurê wî li Çiyayê Elbûrze sax û silamet e. Bi niyeta kurê xwe ji wir bîne dikeve rê. Sîmirx, dema Sam û mirovên pê re dibîne têdigihîje ev bavê vî lawikî ye û ji bo kurê xwe hatiye. Sîmirx, bi salan lawik xwedî kiribû, hemû feraset û ilmê xwe neqlê wî jî kiribû. Êdî ji bo wî zarokê bêkes, wextê pehlewaniyê û padişahiye hatiye. Sîmirx navê “Destan” li zarokî kiriye, ji bo demên bêçar pûrtekî ji baskê xwe dayê û wî ber bi bavê wî bi rê kiriye.

Sam, navê kurê xwe yê çeleng, qewî û bihêz daniye “Zalê Zer.” Hatina Zalê navdar li nava gel belav bûye. Şah Menûçehr jî pê hesiyaye û bang li wan kiriye. Li Sam şîret kirine ku ew, lawê xwe wek şervan û cengawereke baş perwerde bike. Bi tevê diyariyên biqîmet ji welatê xwe hukimraniya axên Zabilistanê dide Zalî û ew bi rê kirine. Sam hemû huner û agahiyên di derbarê padişahiye de hîne lawê xwe kiriye. Zal, bi wê perwerdehiya saxlem di demeke kurt de navê xwe yê meşhûr li tevahiya welatî belav kiriye.

Zal rojekê ji bo seyranê li welatê xwe geriyaye û hatiye gihîştîye axên Kabilê. Li vî welatî jî padişahê navdar Mihrab li ser hikmi bûye. Mihrab ji eslê Dehhaqê Erebbûye û pûtparêz bûye. Mihrab dema bi hatina Zal hesiyaye çûye serdaniya wî û gelek qedrê wî girtiye. Piştî Zal, saloxiya Rûdabeya keça Mihrabî ya bedew û qeşeng girtiye. Li aliyê din Rûdabe jî ji nav û dengê Zal agahdar bûye. Cariyeyên Rûdabeyê di navbera her duyan de navincîtiyê dikin û her du evîndaran tînin ba hev. Ew çawa ku çav bi hev dikevin bûne dildarê hev. Wisa soz û peyman didine hev ku her çi dibe dila bibe ji hev re sadîq bimînin. Lê Zal bi tevê vî evîna hezdar xemgîn jî bûbû. Çimkî Rûdabe ji aliyê esl û dîniyê ve ne ji wan bû. Zal digot ev yek ne bi dilê bavê wî Sam bibe û ne bi dilê Menûçehrê ku padişahî bexşê wî kiribû bibe. Sam û Menûçehr dema ji vî tiştî haydar bûne, derhal munecim kom kirine, li falan nihêrîne. Di falê de xuya kiriye ku ev zewac

wê gelek bêyom be û ji vê zewacê dê pehlewaneke hêzdar ê navdar were dinê. Mihrab jixwe qayil bû keça xwe bide Zal. Pey re Zal û Rûdabe bi şolenên demdirêj zewicîne (Firdewsî, 1994: 198-212; Şerîfî, 1999: 158-175).

Bûyîna Rustemî

Di demekî kin de Rûdabeya bedew ji Zal ducanî maye. Barê wê gelek giran bûye. Êdî rakirina vî barê lê giran hatiye. Rûdabe êdî ji destê van êşan diyax nekir û her çiqas çû giran bû, bêkeys ketiye. Zal li ber vî halî bêçare û xemgîn bûye. Dawiyê pûrta baskê Sîmurx hatiye bîrê ku Sîmirx ji bo rojên teng dabûyê. Zal agir berdaye perî, çawa dû bi esmanan ketiye Sîmirx wek ewr ji jorê hatiye xwarê. Bi gotina Sîmirxî zikê dayîkê hatiye qelaştin, zarokê sîpûsax jê girtine û zikê dayîkê dirûne. Bi alîkarî û şîretên Sîmirxê lawekî rind û bibejnûbal hatiye dinê. Hetanê vê rojê tu kesî zarokekî bi vî awayî bi heybet nedîtibû. Hîn yek rojî bû lê wek yek salî xuya dikir. Rûdabe di nava birînan de ji xwe ve çûbû. Dema bi xwe ve hat û çav bi lawê xwe ketiye di maneya “Xelas bûm!”, got “Rustem.”¹ Ev gotin bû navê wî zarokî.

Rustem zarokek ecêb bû. Ji deh jinan şîr dimijiya. Dema ji şîr vedibû îcar bi qasî penc mirovan xwarin dixwar. Di heşt saliya xwe de wek dara selwiyê bejn avetibû. Ji aliyê bejn û bal, sîma û aqil ve li bapîrê xwe yê Sam çûbû. Heta niha tu kesê ku di vê salê xwe de wek şêran bixuyê nehatibû rûyê erdê.

Xebera Rustemê kurê Destan ê wek şêran hat gihîşt Samê. Sam ji ber vê xeberî gelek dilşad bûye û hema bi rê ketiye da ku biçe vî şêrê pesndayî bibîne. Çawa Rustem dîtiye, fehm kiriye ku ewqas pesn bîlasebeb nebûne. Çendek li cem wan ma, şîretan li wan kir û bi dilrehetî ji Zabilistanê vegeyriyaye (Firdewsî, 1994: 328-337; Şerîfî, 1999: 242-248).

Kuştina Fîlê Spî û Çûyina Çîyayê Sîpendê

Rojekê Rustem û bavê xwe Zal bi tevê dost û ehabên xwe û bi pehlewaniyên navdar li baxçeyî mey vedixwarin. Di dawiya civata bezmê de herkes li aliyekî belav bûye. Rustem jî bi sermestiya meyê li nava ciyê xwe di xew re çûne. Demek dû re bi dengêkî hişyar bûye. Dît ku filekî spî ji bendên xwe filitiye û êrîşê derdorê dike. Bûye qîjeqîja mirovan. Hema ji ciyê xwe rabûye, rahiştiye gurzê ku kalê wî dabûyê. Hicûmê

¹ Di zimanê Şehnameyê ya esas Farisî de “Rustem (ristem)” te maneya “Ez xelas bûm.” Restem

filî kiriye. Rustem wek şêran, bêters ber bi filî beziye. Bi gurzê destê xwe li nava serê filê xistiye. Fîlê qirase ketiye erdî. Zal, dema bûyera filî seh kiriye, carek din bi kurê xwe yê egîd serbilind bûye.

Ji kalên Rustem Nerîman; bi daxwaza Ferîdûn, êrîş biribûye ser çiyayê Sîpendê. Lê li wir bi ser neketibû û jiyana xwe ji dest dabû. Pey re Sam jî ber bi vî çiyayî û kelaha li wir derketiye seferê lê ew jî dest vala vegeyriyabû. Zal, niha ji Rustem dixwest here wî çiyayî û keleha lê ye zeft bike ku bi vî awayî tola kalên xwe hilîne. Rustem derhal xwe amade kiriye û bi rê ketiye. Dizanibû ku pêwîstiya kesên li wê kelehê bi tenê bi xwey hebû. Ket dilqê kerwanê xwêy, axirî bi wî awayî ketiye kelehê. Rustem gurz û şûrên xwe di nava barê xwêy de veşartibû. Gava ku ketiye hundir bi vana hemû leşker û pehlewaniyên kelehê têk biriye. Her wiha xezîneya ji zêr, dur, mucewheran pêk dihat bi dest xist. Rustem mizgîniya serfiraziyê bi nameyek ji bavê xwe re şand (Firdewsî, 1994: 342-351; Şerîfî, 1999: 248-2257).

Derdestkirina Rêxşî

Li pey mirina Menûçehr, Efrasiyabê fermandarê Tirk gelek caran êrîş bi axên Îranê kiribû. Zal, pê zanibû ku dê dawîya van êrîşan zû bi zû neyên. Ji bo parastina axên xwe êdî hewcedarê alikariya Rustem bû. Rustem dê di dema şerî de alikariya pehlewaniyên welatê xwe bikira. Ji bo vê, kêmasiya Rustemî tenê hespekî lêhatî bû. Dema peydakirina hespekî munasîb ji bo Rustemî hatibû. Lê tu hespê qayîm ku li gorî qeweta Rustem be nedihate bidestxistin. Rustem rojekê di nava rewîya hespan de çav bi mehînekê û canîkê li ber wê ya gir û çavreş ket. Li derdorê pirsî jê re gotin ev bêxwedî ne lê heta niha tu kesekî nekaribûye van ajalên kûvî zeft bike. Navê hespî “Rexş” bû. Rustem hest kir ancax ev hespê bêhempa ji wî re bibe. Hema kemend avêtiye gerdena hespî û ew zexm pê girt. Mehîne, hewl daye ku wî ji destê Rustemî xelas bike lê bi ser neketiye. Ew hespê ji aliyê bedewî û qewetê ve bêmîsal ji vê şunda bû hevrêyê Rustemê Zal (Firdewsî, 1994: 26-32; Şerîfî, 1999: 312-317).

Heft Xana Rustemî

Keyqawus, bi niyeta dagirkirina welatê Mazenderanê dest bi tevgerê kir. Heta wê rojê tu hikumdarê Îranê newêrabû êrîşê Mazenderanê bike. Aqilmend û pehlewaniyên li dorê bi tevê Zal, tev bûn yek lê pênekarîbûn. Keyqawus, şervaniyên herî biqewet û pêwle dane ba xwe û bi hev re çûne Mazenderanê. Lê li wir Keyqawus û şervaniyên pêre

êsîr ketin. Zal ji bo rizgarkirina Keyqawus, Rustem bi rê kir. Ji bo çûyinê du rê hebûn. Yek rêya dirêj û bêxeter ya din rêya kin û xeternak. Rustem neçar bû, divê ji rêya kin biçûya da ku xwe zû bigîhîne Keyqawusî. Di vê rêyê de heft qonaxên bazor li pêşiyê bû. Rustem di vê rêyê de ji heft îmtihanên girîng derbas bû.

Rustem bi tevê Raxşî gelekî rê çû û bêtaqet ket. Ji bo bêhnvedanê li rastekî agir vexist û raket. Wextê Rustem di xew de bû, şerek hat û dil kir ku xwe bavêje ser Rustem. Rexş çawa pê hesiya şêr qefalt û zexm pê girt. Şêr li erdê gindirî, nekaribû li ser xwe bisekine. Rexşî, şêr bi bin xist. Di wê kêliyê de Rustem hişyar dibe û dibîne ku Rexşî şêr têk biriye.

Her du hevre cardin li rêya xwe ketin. Îcar rêya wan li biyabanekî ger û bêav ket. Divê ji vir bi lez û bez derbas bana. Çimkî ev der çolê qijilandîbû. Li ser vê çolê Rustem û hespê wî ji germa û bêavbûnê bêmecal ketibûn. Tu tişt ji destê nedihat, sekinî û lavayî rebbê xwe kir, dua kir. Dît ku miyekê têrxwarî ji wî aliyê tê. Hez kir rabû ser xwe û da pêy miyê, mî wan bir ber devê kaniyê. Rexş û Rustem bi têra xwe av vexwarin, tîna xwe vekuştin. Wê şevê li wir raketin.

Rustem hîn di xewê de bû, ejdehayekî gir ber pê hat. Li ser Rustem û hespê wî kir gurînî. Rexş bi hîrînê Rustemê ji xew hişyar kir. Rustem bi şûrê xwe bi ser ejdehayê ve çû, aliyê din Rexş bi diranê xwe rahişt sermilên ejdehayê û milên wî jê kir. Rustem ji bi şûrê xwe serê wî jê kir avêt.

Rê li hêviya wan bû, nesekinîn cardin bi rê ketin. Rêya niha lê derbas dibûn warê cadûyan bû. Li pêşiyê avekî zelal û li ber avê sifre li ber raxistî bû. A rast ev sifre ya cadûyan bû. Rustem li ser sifrê rûnişt, cadûyê dema dengê Rustem bihîst xwe xist dilqê keçekî bedew û hat balê. Qedeha meyê dirêjê Rustem kir. Rustem bi navê Xwedê dua kir û mey vexwar. Dema navê Xwedê hat bilêvkirin, cadû veguherî dirûvê pîrejinan. Rustem çawa ku pê derxist ew cadû ye, hema şûrê xwe lê xist, ew kir du qet.

Dîsa ketin rê, ji ber rêveçûnê betilîn, li mêrgekî raketin. Parezvanê mêrgê li ser Rustemê rûnişt û hêrs ket. Bêhna Rustemî teng bû, hema dest avêt her du guhên zilamî û guhên wî jê kir û avêtin. Cerdevan di nava xwînê de ma, bi vê halê rabû çû cem Êladê pehlewane meşhûr ya wî welatê. Êlad şervanên xwe kom kir, bi ser Rustem de çû. Lê Rustem bi yek derbê carê çend mêran xist xwarê. Kemendê avêt stûyê Êlad, wî qefalt.

Rustem bi şertê ku cihê Keyqawus jê re bêje û rê nîşanê wî bide canê Ûlad bexş kir. Ûlad rê nîşanê wî da, lê ew agahdar kir ku ev rê tijê hût bû.

Rustem bêsekan dîsa bi rê ket. Li gorî jê re hatibû gotin warê Erjengê hût ê hêwilnak li ser vê rêyê bû. Zanibû heke Erjengî têk bibe êdî tu hûtên vê deverê newêribe derkeve pêşiya wî. Hêdîka hat ber hûtê. Şûrê xwe kişand, bi carek de lê xist serê Erjengê jê kir û avêt ber hûtên din. Axirê Rustem xwe gihand Keyqawusê û şervanên pê re. Keyqawus jê re behsa dêwê spî kir, dêw dema pê bihese Rustem Erjengê kuştiye û Keyqawusê rizgar kiriye dê bi tevahiya dêwên din bide pey wan û wan sax nehêle. Ji bo serketinê astengiya dawî dewê spî bû.

Dîsa bi rêberiya Ûlad, Rustem ber bi şikefta dêwê spî bi rê ket. Dêwê spî di xew de bû. Rustem bi şûrê derbekî zexm lê xist. Destekî û lingekî dêw jê bû, lê dîsa jî ew gelek bi qewet rahişt ser Rustem. Demek dirêj hevdu birin û anîn. Dawiyê Rustem dêwê spî kuşt (Firdewsî, 1994: 109-151; Şerîfî, 1999: 350-369).

Hikayeta Rustem û Sohrab

Rustem li nêçîrê bû. Şeva xwe li wê deştê ber agir derbas dikir. Wê gavê çend siwarê ji wir derbas dibûn çav bi Rexş ketin û Rexşê qefaltin birin. Rustem dema hişyar bû dît ku Rexş ne li wir e, ket pêy ber bi Semenganê ve çû. Padişahê Semenganê bihîst ku Rustemê Zal hatiye, ji bo pêşwaziyê hat. Rustemê Zal li qesra wî bû mêvan. Keça padişahê Tehmîne û Rustem çawa li wir hevdu dîtîn ji bo zewacê destûr ji padişahê xwestin. Her kes ji vê zewacê kêfxweş bû.

Lê dema çûyina Rustem hatibû, hewce bû êdî biçûya welatê xwe. Nîşanekî li ba Tehmîneyê danî ku eger zarê wan çêbû, vê mohrê bidê. Neh meh pêy çûyina Rustem kurê wî Sohrab hat dinê. Sohrab hin di deh saliya xwe de bûbû pehlewaneke wek şêran. Rustem ji tirsê dijminan nedixwest kes bi Sohrabê bihese, ji ber vê Sohrabê neanî ba xwe. Tehmîne jî bi heman sedemê qayil nebû kurê wî were naskirin.

Sohrab êdî gihaştî bû, tu pehlewaneke nekaribû li ber bisekine. Daxwaza Sohrab ew bû ku Keyqawusê ji text bixe û bavê xwe Rustem bîne şunê. Bi vê awayê Îran û Turan bi hev re diket destê wan. Sohrab kar û barên şerê temam kir, ji toxma Rexşê hespekî jî bi dest xist. Ber bi Îranê ve bi rê ket. Efrasiyab hay ji niyeta Sohrab hebû. Çend pehlewaneke xwe pê re şand ku ew nehêlin Rustem û Sohrab hevdu nas bikin.

Sohrab li Îranê êrîşê Kela Spî kir, vê kelehê zebt kir. Xeber hat Keyqawus, fermandarê Turanê ji bo Qawus ji text bixe hatiye û Kela Spî zebt kiriye. Keyqawus bi tevê Rustemê û pehlewên din bi rê ket, hatin kelehê. Tehmîne birayê xwe bi Sohrab re şandi bû ku eger ew Rustemê bibîne ji Sohrab re bêje. Xalê Sohrabê li wir hat kuştin. Diya wî ji Sohrab re, elametên Rustemê yên ku pê were naskirin yek bi yek gotibû. Sohrab di qada şer de çavê xwe li Rustemê gerand. Ji fermandarên ba xwe yekî pirsî, “Ew Rustem e yan na?” Lê fermandar got qey Sohrab, ji navê Rustemê bitirse û vekişe û bi vê ramanê jê re negot ew pehlewên Rustem e. Sohrab cardin ji hevalbendên xwe pirsî, Rustem li wir di qada şer de ye yan na. Lê ew bi heman ramanê jê re negotin Rustem li wir e. Sohrabê digot qey Rustem ne li wir e, rahilda ser artêşa Keyqawus. Rustem jî li hespa xwe siwar bû, baz da çû cem Sohrab. Jê re got em her du, bi tenê beramberê hev şer bikin.

Sohrab û Rustem li tengeyek li ber hev rabûn. Şik di dilê Sohrab de hebû, ji Rustem pirsî, “Tu kî yî, bav û kalên te kî ne, tu dişibî Rustemê Zal?” Rustem got, “Ez ne Rustem im, ew pehlewaneke mezin e, lê ez miroveke ji rêzê me.” û dest bi şer kirin. Nava wan de şerêke dijwar derbas bû. Di vê şerê de kes bi ser neket. Dema tarî ket erdê, soz dan hevdu ku sibê cardin li heman ciyê şerê xwe bidomînin. Sohrab hin jê guman dikir ku ew pehlewên Rustem e. Lê şervanên Efrasiyab jê re gotin ku heke ew Rustem ba niha te têk biribû, teqez ew ne Rustem e. Roja din dîsa hatin ba hev. Şerê duyem de Sohrab; Rustemê bi bin xist, xençerê da ber stûyê Rustem da ku wî bikuje. Lê poşman bû, dev jê berda. Cara ewilî bu ku yekî Rustemê bi bin xistibû. Rustem bi vê xemê cardin derket pêşberê Sohrab. Rustem îcar bi êşa têkçûnê bi ser Sohrab de çû. Sohrabê avêt erdê, xençera xwe li singê wî da. Sohrab di nava xwînê de ji Rustem re got, “Ji bo bavê xwe Rustemê Zal bibînim bi rê ketim hatim, xwezî min carek bavê xwe bidîta û hîn bimirama.” Êdî hiş di serê Rustem de nema, xwe winda kir. Di wî kêliyê de Sohrab mohra diya wî dabûyê nîşanê Rustem da.

Rustem yekser xeber şand Kawus, ku ew jê re dermanê birînan ji xezîneya xwe bişîne. Ev dermanên bitesîr bûn. Keyqawus, bi endîşeya Sohrab û Rustem bibin yek û wî ji text rakin dermanê neşand jê re. Sohrab, di destên Rustem de can da. Ev bûyer di demekî kin de li her aliyê belav bû. Zal, Rustem û Tehmîne bi vê êşa kûr gelek kesirîn (Firdewsî, 1994: 285-429; Şerîfî, 1999: 443-525).

Rustem û Efrasiyab

Fermandarê Turanê Efrasiyab, di dastanekî Tirkan ya navdar de bi navê Alp Er Tunga cih digire (Pala, 2018: 135; Onay, 2016: 31). Di *Şehnameyê* de şerê Îran û Turanê cihekî muhîm digire. Ev şer gelemperî li derdora Rustem û Efrasiyab derbas dibe. Efrasiyabê kurê Peşeng, ji neseba Tûrê kurê Ferîdun bû. Ferîdûn, axên di bin destê xwe de di nava kurên xwe Selm, Tûr û Îrec de parve kiribû. Lê kurên wî Selm û Tûr ji vê dabeşkirinê razî nebûn. Di dilê wan de welatê Îranê biqîmettir bû û ev der bûbû para Îrec. Çavên Tûr, her dem li vê axê bû, dil dikir vê welatê bi dest bixe. Lê pêy mirina Tûr, Efrasiyab ji bo heyfa kalê xwe sond xwaribû.

Piştê mirina şah Gerşasbê, divê Keykubadê ji neslê Ferîdun derketa ser text. Zal; ji bo Keykubadê ji çiyayê Elbruzê bîne, Rustemê şand. Keykubad çawa derket ser text, bi alikariya leşker û pehlewaniyê pêbawer şer li Turanê vekir. Rustem û Efrasiyab cara yekem li vir rastî hev hatin. Beriya vê şerê ew her du navûdengê hevdu bihistibûn. Rustem di vê cengê de Efrasiyabê derdest kir lê Efrasiyab ji destê wî filitî. Leşkerên Keykubadê, Tirkan tîk birin û li dawiyê peyman hat danîn.

Li pêy Keykubad, Keyqawus derket ser text. Dema Keyqawus destê padişahê Hamaweranê de dîl û destgîr ket, Efrasiyab bi vê fersendê rahişt ser welatê Îranê. Rustemê Zal bi van bûyeran hesiya û pêşiyê Keyqawusê xelas kir, piştê bi tevê Keyqawus û şervaniyê din leşkerên Turanê tîk bir.

Rojek Rustem û Keyqawus çûn nêçîrgeha Efrasiyabê. Efrasiyab, ji ber vê gelek aciz bû. Pîlsemê pehlewaniyê qewî bi ser wan de şand. Lê Rustem, zora Pîlsemê bir. Dema Pîlsem tîk çû, Efrasiyab jî ji tirsê revî.

Rustem, Siyaveşê kurê Keyqawus li cem xwe perwerde dikir. Siyaveş roj bi roj mezin bû, kemilî. Bi piştgiriya bavê xwe û Rustemê derket seferê. Efrasiyab ji vê seferê xemgîn bû. Ji êrişê Siyaveş tirsîya, bi hev re peyman girêdan ku ew tu tişt bi hev nekin. Keyqawus herçend ji vê peymanê dilxweş nebe jî Siyaveş û Efrasiyab li hev kirin. Demeke dirêj bi hev re rabûn û rûniştin. Lê kesên fesad wan berda hevdû. Axirî Efrasiyab, Siyaveşê da kuştin.

Rustem li ser vê bêbextiyê sonda heyf hilanînê da û êriş bir ser Efrasiyab û welatê Turanê. Di vê şerê tund de Rustem û Efrasiyab hatin hemberî hev. Rustem heta jê hat dirêjê Efrasiyab kir, lê Efrasiyab cardin ji destê Rustem filitî. Efrasiyab revîbû lê

Rustem text, qesr û xezineya wî bi dest xistibû. Rustem heft sala li texta Turanê rûnişt. Piştê heft sala vegeriya welatê xwe Îranê.

Di vê navberê de Husrewê kurê Siyaveşê ya ji keça Efrasiyab Ferengîsê hatibû dinê. Hûsrew jî hin di ciwantiya xwe de sonda heyfa bavê xwe xwaribû. Bi pêşengiya Keyhusrew navbera Îran û Turanê de şerên domdirêj pêk hatin. Rustem di van şeran de gelek pehlewên Turanê kuşt. Efrasiyab, ji ber xofa Rustem reviya Çînê.

Di vê cenga dijwar de Îran û Turan, Rustem û Efrasiyab pir caran bi hev ketin. Efrasiyab ji destê artêşa Îranê, di şikeftê de veşartî bû. Li wir Keyhusrew wî bi dest xist û kuşt.

Cenga Rustem û Dêwê Ekwan

Dêwekî pêşgarî garanê Keyhusrewê bibû. Çêreya garanê li warê dêwê Ekwan bû. Keyhusrew ji bo dêw garanê talan neke, deng li Rustemê kir. Rustem derhal li wî deştê li pey dêw ket. Sê rojan lê geriya, roja çaran dêwê dît. Çawa kemenda xwe avêt, dêw ji ber çavan winda bû. Rustem fêhm kir, dêw ne bi zorê ancax bi hîleyê bi dest dikeve.

Dêw cardin bi Rustem ve xuya, Rustem rahişt tîrê xwe, kevanê şidand lê dêw dîsa ji ber çavan winda bû. Rustem roj û şeveke din li dêwê geriya. Bû şev, Rustem bêtaqet ket, li ber kaniyê di xew re çû. Wê demê dêw hat, Rustemê rakir hetanî asîmanan bir. Rustem bi xwe ve hat, dît ew maye ku dêw wî bikuje. Rustem ji dêw re bi qestî got: “Dixwazî min bikuje, lê nevêje nava avê.” Dêwê Ekwan, Rustemê ji asîmanan ji jorê avêt nava behrekî pê ku Rustem can bide. Lê Rustem bi sax û selamêfî ji avê xelas bû

Rustem ji bo Rexşê vegeriya ser kaniyê, Rexş ne li wir bû. Li pêy rêça Rexşê xwe gihand nava refa hespên Efrasiyabê. Erfasiyab, leşkerên xwe şand, lê Rustem hem leşkeran yek bi yek kuşt hem jî dest da ser mal û hespên Efrasiyabê.

Rustem cardin dest bi lêgerîna dêwî kir, divê êdî fersenda hîleyê neda dêw. Îcar kêysa xwe lê anî, xwe avêt serê û dêwê ji navtengê qefalt. Bi gurzê ser û milên dêwê Ekwan kerî kerî kir (Firdewsî, 1994: 279-297; Şerîfî, 1999: 894-909).

Rustem, Bîjenî Xelas Dike

Bîjenê kurê Gîwî, yek ji pehlewên Îranê yê bijarte bû. Keyxusrewî, Bîjen ji bo çûyina welatê Ermanê peywirdar kiribû. Bîjen, di rê de bi gotina hevrê xwe çûye seyrangeha Turaniyan. Menîjeya keça Efrasiyabî jî li vê seyrangehê bûye. Bîjen û

Menîje li wir hevdu dîtine, Bîjen sê rojan di nava kêf û zewqê de li kona Menîjeyê maye.

Dema Bîjen bi rê ketibû ku biçe, Menîje wî bi dermanan bêhiş kiriye û bi dizîka biriye qesrê. Efrasiyab, ji yekî hîn bûye ku Bîjenê pehlewane Îranê li qesra wî ye. Hema Bîjen da derdest kirin. Efrasiyab ji tirsra tola Îraniyan Bîjen nekuşt lê dest û milên wî zexm daye girêdan û ew di bîrê de li serserkî daleqand û devê bîrê bi zinaran da girtin.

Çend roj derbas bûbû, tu deng ji Bîjenî nehatibû. Gîw, neçar ji Keyxusrewî alikarî xwest. Xusrew ji qedeha efsunî ya raznîşan, cih û halê Bîjenî dît. Xusrew, derheqê rewşa Bîjenî de bi nameyekê agahî ji Rustem re şandiye. Rustem di cih de bi ser Turanê ve bi rê ket.

Divê Rustem bi awayekî bêdeng biçûya ku Bîjenî bi selamê bîne. Wek bazirganekî bi pehlawanên din re kerwan saz kiriye. Bi vî awayî çûne Turanê. Menîje bihîstiyê ku karwanek ji Îranê hatiye, hema çûye pêşiya karwanî. Nizanibû ku ew Rustem e, jê re got: “Bîjenê kurê Gîwî, di bîrê de destgîr maye. Hûn ji bavê wî re xeberê bişînin da ku ew were kurê xwe rizgar bike.” Rustem ji Menîjeyê re rastî negotiye, tenê ji bo bigihîne Bîjenê xwarinê dayê. Menîje bi nezanî çûye ber devê bîrê. Xwarin dirêjê Bîjenî kiriye. Rustem bi dizîka gustîlka xwe xistibûyê. Bîjen dema tê de gustîlka Rustemê dîtîye êdî zaniye azadî nêzik e. Rustem û heft pehlawanên pê re çûne ber bîrê. Tev bi hev re dest avêtine lê nikarîbûn zinarê tund bileqînin. Rustem dua li Xwedayê xwe kiriye û bi carek ve zinar ji cî rakiriye. Paşî kemenda xwe avêtîye nava bîrê û Bîjen ji bîrê xelas kiriye.

Rustem îcar ji bo heyfa Bîjenî berê xwe daye qesra Efrasiyabî. Hemû leşkerên li qesrê daye ber şûran û paşî çûye odeya Efrasiyab lê radizê. Efrasiyab çavê xwe ji xew vekiriye û dîtîye ku Rustem li hember wî ye. Ji destê Rustem reviya. Rustem tac û texta Efrasiyabê talan kiriye (Firdewsî, 1994: 303-423; Şerîfî, 1999: 934-953).

Rustem û Îsfendiyar

Şah Goştasb kurê xwe Îsfendiyar, bi ser Rustem de şandiye ku Rustemî bikuje. Çimkî Rustem bi gotina Goştasbî nekiribû û li ber fermana şahî serî rakiribû. Heke Îsfendiyarî Rustem bikuşt bavê wî tac û text jê re dihîşt. Dilê Îsfendiyar ji daxwaza bavê xwe razî nebû, dîsa jî dilê bavê xwe nehîşt, bi gotina wî kir.

Îsfendiyar bi tevê kurê xwe Behmenî ve ber bi Zabilistanê ve çû. Rustem wan bi izzet û ikram pêşwazî kiriye. Sond li ser dilsoziya padişah xwariye û poşmaniya xwe derbiriye. Îsfendiyar pê bawer nebûye. Digot qey dê Rustem bi tevê leşkerên xwe li dijî şah serî rake. Behmen cehd kir ku Îsfendiyarî ji vê daxwazê vegerîne. Lê Îsfendiyar guh nedayiyê û Rustem jî ji bo şer xwe amade kiriye.

Navbeyna Rustem û Îsfendiyar de cengekî zor dijwar derbas bûye. Her du alî jî gelek xusaret dane. Îsfendiyar ji vê cengê xenîmetên têra dilê xwe bi dest xistine. Rustem ji bo xwe tîrekî du şaxî dabû çêkirin. Di şer de Rustem ev tîre avêtiye û tîr li nava çavên Îsfendiyar ketiye. Her du çavên Îsfendiyar li wir kor bûne. Dûre jî Îsfendiyar ber vê êşê miriye.

Rustem ji bo canê xwe xelas bike, neçar mabû ku Îsfendiyarê bikuje. Lê dîsa jî ji ber vê kirina xwe gelek poşman û xemgîn bûye. Aliyê din Goştasb jî pir kesiriye, şîna kurê xwe girtiye. Ji bêwîjdaniya xwe poşman bû (Şerîfi, 1999: 1179-1230).

Rustem di Bîrê de

Kurekî Zalî ji Zûhreyê çêbûye. Navê wî danîne Şagad. Dema Şagad hat dinê stêrnas li fala wî nêrîn. Ji Zalî re gotin mirina Rustemê ji destê wî ye. Zal, bi vî derdê giran kesirî. Nezanibû çi bikira. Dibe ku falika munecîman şaş ba. Dilê wî bi Şagad şewitî, wî ew ne kuşt.

Zal, ji bo Şagadî dûr bixe ew şandibû cem şahê Kabilê. Sal di ser re derbas bûn. Şagad mezin bû, kemilî. Şah, keça xwe bi Şagad re zewicand. Rustem ji şahê Kabilê bac distend. Ev, li Şagad xweş nehat. Jixwe ji Rustem hesûdî dikir. Bi ser de ji bo ku tu alikarî û qenciye lê nake gazindan li Rustem dikir.

Şagad, li Zabilistanê xwe gihand Rustemî. Wî Rustem ji bo bi hev re herin nêçîrê xapand. Ew bi tevê gelek leşkeran çûne nêçîrgehê. Li wir şahê Kabilê jî hatiye cem wan. Leşker tev bo nêçîrê li derdorê belav bûne.

Rustem, Şagad û şah jî bi hev re li pêy nêçîrê bûn. Rustem haya wî ji dekên şah û birayê xwe tunebû. Şagadî li wê nêçîrgehê berê bîr dabû kolan. Rustemê ber bi bîra veşartî ve birin. Devê bîrê bi çîmenê hatibû peçavtin/ nixumandin. Di nava bîrê de jî şûr û xençer hatibûn daçikandin.

Rustem bi tevê Rexşê xwe ketibû nava bîrê. Hem ew hem hespê wî ji ber xençeran birîndar bûne. Rustem êdî pê zanibû ev dekhên birayê wî ne. Rustem û Rexş bi hev re di nava xwîn û xirarê de mabûne. Şagad jê re gotiye: “Eve tola wê xwînê ye ya ku te rijandiye.” Rustem ji bîrê tîrek davêje li birayê xwe dixê, Şagad li wir dimire lê Rustem jî ji destê birayê xwe di wî bîrê de can da. Leşkerên dû re hatin halê wî dîtîn, xeberê jî Zal re şandin. Mirina Rustemê şînekî giran li Îranê da girtin (Şerîfî, 1999: 1235-1246).

BEŞA DUYEM

EDEBIYATA HEMASÎ Û AFIRANDINA LEHENGAN: RUSTEMÊ ZAL

2.1. BÎNYADA ÇÎROKA RUSTEM Û WEK LEHENGEKÎ TAYBETIYÊN RUSTEMÊ ZAL

Peyva “hemasî” bi esasî di wateya mêrxasî û wêrekî de ye lê bi gelemperî ji bo helbestên epîk tê bikaranîn. Zêdetir di edebiyata gelên wek Erebi û Farisan de helbestên Hemasî wek cureyekî serbixwe derdikeve pêşberî me. Gelên ku dîroka xwe bi ceng û serfiraziyên pîroz dixemilînin edebiyatekî hemasî ya dewlemend afirandine. Ji bo van gelan bi berhemên edebiyata hemasî çîrok çiqas bê dubarekirin, ew şerên pîroz jî ewqas tê dubarekirin û çiqas bê dubarekirin ewqas zindî dimîne.

Wateya “hemase”yê li gorî ferhengên; ji bo dîn tundi, yemanî û sextî ye lê tê wateya qehremanî, egîdî, wêrekî û çalaktiyê jî (Durmuş, 1997: 437). Berhemên -bi taybetî helbest- ku mijara wan ceng, şer, qehremanî, mêrxasî ye; wek berhemên edebiyata hemasî tînan qebûlînin. Xala ku di berhemên edebiyata hemasî û helbestên epîk de derdikeve pêş lehengê xwediyê taybetmendiyên derasayî ye. Lehengê edebiyata hemasî ji bo armanca xwe ya pîroz -dîn, welat, gel û hwd.- şer dike û pîrî caran bi ser dikeve. Heke di vê rêya pîroz de têk biçe jî ji aliyê efsane-afirîneran ve tê pîrozîkirin. Lehengên edebiyata hemasî ji bo gelê xwe an jî ji bo dîn û baweriyaya xwe fidakariyên muhîm kiriye, çavê neyaran tirsandiye, bi tena serê xwe dewletan hilweşandiye.

Peyvên wek hemaset (şecaat) di edebiyata Erebi ya beriya Îslamiyetê de tê maneya êrîşkarî û çalaktiya bêtirsîyê, peyva “cahiliye” yê jî di heman maneyê de ye (Çağrıçı, 2010: 402). Di Kurmancî de jî peyva “cahil”ê ji xeynî wateya nezan/nexwendayê ji bo “ciwan”an jî tê bikaranîn. Ango em dikarin bêjin hêza hemasetê û hêza ciwanî/cahiliyê bi heman awayê ye. Lehengê edebiyata hemasî, ciwan û cahil bi heman bêtirsî û çavsoyîyê tev digerin.

Pêşketin û pêkhatina edebiyata hemasî bi şer re girêdayî ye. Di van berhemên de ceng, mêrxasî, tol hîlanîn, meydana şer, serfirazî û têkçûn tîne teswîrîkirin. Şair di van helbestan de pesnê cengawerên gelê xwe dide, fezîlet û mezintayîya qehremanên xwe vedibêje (Durmuş, 1997: 437-438). Dema ku em van pênasayan bidin ber çav *Şehnameya Firdewsî* û *Şehnameya Kurdî* wek berhemên edebiyata hemasî dikarin bînin hesabandin. Di *Şehnameyê* de ji serî heta dawî li ser şerê başî û xirabiyê, şerê Îran û

Turanê, şerê Rustemê Zal û Efrasiyabê hatiye avakirin. Rustemê Zal, bi hemû taybetî û serpêhatiyên xwe, di helbestan de jî di çîrokên gelêrî de jî wek hêmaneke edebiyata hemasî ye.

Rustem di rola pehlewaneke mêrxas de di çand û edebiyata Fars, Kurd û Tirkan de derdikeve pêşberî me. Wek lehengeke mêrxas cihekî girîng di vebêjeyên nivîskî û devkî de digire. Ji ber vê rola xwe -rola lehengê xelasker û her daîm biserketî- ji aliyê gel ve bi rehetî lê hatiye xwedîderketin.

Çîroka Rustem ewqas eleqe dîtibû ku kesê bi navê Nasr b. Haris li Mekkeyê ji Pêxember re serpêhatiyên Rustem vedigot. Dema Pêxember *Qur'an* dixwend wî kesî çîroka Rustem vedigot (Ritter, 2011: 61). Herçend em nikaribin rastiya wî îspat bikin jî hin rivayetên li ser naskirina Mihemmed Pêxember ya Ristemê Zal di nava gel de belav bûye. Edîb Polat riwayeteke wiha tîne ziman:

Li gor rivayetan, dibêjin rojê Hizretî Elî şerekî dijwar dike û gelekî diweste. Hz. Mihemmed jê re dibêje “Ya Elî! Te îroj şerekî Ristemî kir. Te pîroz dikim!” Hz. Elî ew roj gelekî miraq dike, dibêje “Gelo Ristem kî bûye ku Pêxember jî nav û dengê wî bihîstiye! Qey ji min jêhatîtir bûye?” Ew şev Ristem tê xewna wî. Hz. Elî dibîne ku babaegîdek li hespekî suwar e, ber bi wî ve tê. Suwarî tê û silavê lê dike. Ji ber heybeta suwarî zimanê Hz. Elî nagere, nikare silava wî bigire. Dema bi xwe ve tê, bi xwe re dixeyîde: “Çawa yekî mîna min ku ez şerê Xwedê me, ji tîrsa suwarekî silava Xwedê jî ji bir bike!” Diçe cem Pêxember, xewna xwe jê re dibêje. Hz. Mihemmed wuha bersiv dide wî: “Ya Elî! Dest di ser dest re heye, suwariyê ku hatiye xewna te Ristem e. (Polat, 2007: 8-9)

Firdewsî pirtûka xwe li gorî hêmanên cihê yê epîk nivîsiye, carinan mîtolojîk carinan jî dîrokî nivîsiye. Wisa xuya ye ku nivîsên epîk ên çavkaniya ewil a Firdewsî ne dîrokên wisa ne ku tu bingeha wan tune be. Hin kesayetên mîtolojîk û epîk kesayetên dîrokî bûn ku nav û şopa wan li ser nivîsên netewî û dînî yê Îranî hatine nivîsîn (Vali, 2018: 71). Wêca Rustemê Zal jî yek ji van kesayetên e. Di derbarê Rustemê Zal de agahiyên herî têr û tije heta niha ji *Şehnameya* Firdewsî hatiye bidestxistin. Firdewsî herçend berhema xwe wek dîroka Îranê ya qedîm saz kiribe jî bêguman Rustemê Zal bi tevê malbata xwe -bav û kalên wî Gerşasb, Keriman, Nerîman, Sam, Zal û kûrê wî Sohrab- ya bi pehlewaniyê meşhûr bûne gelek cihekî mezin digire. *Şehname* esasen

“nameya şahan-şahê nameyan” ango kitêba padişahan e. Lê ji şahan zêdetir li ser Rustemê ku ne şahê Îranê ye hatiye sekinîn. Rustemê Zal ji serdema şah Keykûbad heta serdema şah Goştasbê nêzikê heft sed salan jiyaye. Ji heşt saliya xwe heta heft sed saliya xwe bi hêz û qeweta bêhempa çavê hemû dijminan tirsandiye. Hemû padişahên demê pê bawer bûn ku bi destgiriya Rustem li rûyê erdê ji bo wan têkçûn tune. Mîsyona Rustem ne tenê pehlewani û şervani bû, ew ji aliyekî din ji bo padişahan aqilmendekî ewle jî bû. Rustem tu car di rola emirqûlê şahan de nebû; belkî wek hevrê, pîştvanek, xelasker bû.

Helbet, Rustemê Zal lehengekî aidê Firdewsî nîne. Bêriya *Şehnameyê* jî vebejêyên Rustem di nava gelên cuda de dihat zanîn û gelek berbelav bû. Jixwe Firdewsî jî di bin bandora van vebêjeyan de berhema xwe afirandiye. Lê nayê înkarkirin ku esas navdar bûna Rustem di saya *Şehnameyê* de bûye.

Lehengên *Avesta* û *Şehnameyê* wek Rustem û Gerşasb, bi gelek taybetiyên xwe wekê yezdanê hevpar ê çanda Hînt-Îranî ya kevn “Indra²”yê ne. Taybetiyên Indra, yên ji edebiyata Sanskrît maye bi Rustem re wesfên hevpar nîşan dide. Li gorî hîn nêrînan jî Rustem, nûnerê Indrayê ya li rûyê erdê ye (Yıldırım, 2008b).

Di her demê de wek mijarê edebiyata hemasî Rustemê Zal balê kişandiye ser xwe û dema ku behsa edebiyata hemasî were kirin ji bo gelên Îranî Rustemê Zal tê bîra mirovan. Li ser jêdera çîroka Rustemê Zal em dikarin li ser hin agahî û teoriyên ji hev cuda bisekinin.

Ya rast heta niha tu delîlên qethî bi dest neketiye ku em bizanibin Rustem kesayetek rastî ye yan hatiye vehonandin. Derbarê vê mijarê de bi tenê em dikarin behsa texmîn û teoriyan bikin. Wek Hellmut Ritter radigihîne: kesên ku ji bo Rustem kesayetekî dîrokî digerin wî dişibînin padişahê bi navê Gundaferah yê di sedsala yekem de dema Arsakiyan jiyabû (Ritter, 2011:61). Li gorî texmînan bêriya zayinê di sedsala 4. de jiyaye (Pala, 2018: 382). Lê divê em ji bîr nekin ev agahiyên qethî nînin. Di vê çarçovê de li ser Rustemê Zal, Nimet Yıldırım van agahiyan dide:

Di edebiyata Pehlewiyan de bi awayê “Rostahm” û “Rostethem” derbas dibe, tê wateya “laşgir, qewî” yê. Carinan bi bernavka “Tehemten”ê re jî tê bikaranîn. Tê zenkirin Rustemê Zal bi eslê xwe lehengekî ji giregirên

² Li gorî çanda Hint û baweriya Hinduîzmê yezdanê cengê û hewayê ye.

Eşkaniyan e û dema ketiye nava destanên neteweyî, xisletên efsaneyî lê hatiye barkirin (Yıldırım, 2008a: 294).

Lehengê navdar ê Îranê, di *Şehnameyê* de bi pesn jê tê behs kirin. Bi navên “Rustem-ê Dastan, Rustem-ê Zal, Pûr-ê Zal, Pûr-ê Dastan, Tehemten” tê yadkirin (Pala, 2018: 382).

Ahmet Talat Onay, li binî sernava “lehengên Ecem” qala Rustem jî dike; derbarê de dibêje lehengekî efsaneyî di *Şehnameyê* de navê wî derbas dibe, pehlewane cihanê, emîru'l umera.³ Onay, di heman sernavê de nivîskarên leşkerên Tirk dişibîne lehengê Ecem rexne dike; vê şibandinê ji bo Tirkan wek heqaret dihesibîne (Onay, 2016: 33). Li gorî *Şehnameyê* Rustemê Zal cengên herî dijwar bi artêşa Tirkan re kiribû. Şerê Ecem û Turan li *Şehnameyê* ji mijarên sereke yek e. Reqîbê Rustemê yê herî zordar ji şervanê Tirk Efrasiyab bû. Herçend ji ber berzkirina reqîbê pesnê Efrasiyab gelekî hatibe dayin jî dawiyê biserketiyê vê şerê Rustem bû.

Di *Ferhenga Etîmolojiyê* ya Ramazan Çeper de di xala Rostem (Rustem) de ev agahî hatine dayîn:

Navê lehengê mitolojik e Kurd û Fars. Bi ramanê xweyî kûr, zîrekî û wêrekiya xwe tê zanîn. Bi Brometheus'ê Yewnanî re di heman hevsengiyê de hatiye watedar kirin. Peyva Rostem peyvek hevedudaniye û ji peyvên reuze û tehem pêk hatiye. Reuze (hêzdar), tehem (werek û leheng). Rustem > rostem: Lehengê werek û hêzdar. (Çeper, 2018: 242)

Di beşa yekem de li agahiyên ser *Şehnameyê* me gotibû, Firdewsî çavkaniyên cur bi cur istifade kiriye. Ji bo çîroka Rustem jî teqez ew ji hin çavkaniyan sûd girtiye. Di nava vana de yên gelêrî û devkî jî hebûn yên nivîskî jî.

Firdewsî dema berhema xwe ya navdar saz kir, berhema bi navê “Xeberên Rustem” bi dest xistiye. Ev berhema Azad Serv (sedsala 9.), rîwayetên li ser Rustem û malbata wî dihewand û ev berhem wek yekemîn berhema mîtolojik ya bi Farisiya nûjen hatiye nivisandin tê pejirandin (Yıldırım, 2015: 360).

Firdewsî berhema xwe bisûdgirtina ji hin çavkaniyan nivîsandibû. Behsa Rustemê Zal di nava hinek ji van çavkaniyan de cih digire. Yek ji çavkaniyên *Şehnameyê* yek jî

³ Di wateya serfermandarê de.

Avesta ye. Lê li *Avestayê* navê Rustem qet derbas nabe (Yıldırım, 2015: 263). Ji bo tunebûna Rustemê Zal ya di *Avestayê* de Shahab Vali dibêje ku:

Tunebûna Rustem a di kevneşopiya Zerdûştiyan de bûye mijara gelek nîqaşan. Li gorî hin lêkolîneran nivîskarên *Avestayê* Rustem nas dikirin lê behsa wî nedikirin, lewre tevgerên Rustem dijî vî dînî bûn. Lê hin lêkolîner jî vê fikrê qebûl nakin û dibêjin heke wisa biba, van nivîskaran dikaribûn wek lenetkirî behsa Rustem bikirana, çawa ku ji bo gelek kesayetan jî kirine. (Vali, 2018: 288)

Hellmut Ritter ji bo çavkaniyên Rustemê Zal dibêje: Çîrokên li ser Rustemî yên di *Şehname* û *Hûdaynameyan* de hene ji van du berheman hatiye, pirtûka bi navê *Sekîsran* ku *Murûcuzzeheba* Mesûdî de ye lê mixabin ev berhem li ber dest tune ye û ya din pirtûka bi navê *Rustem û Îsfendiyar* a ku ji aliyê Cebele bin Salih ve ji bo Erebi hatiye wergerandin (Ritter, 2011: 61).

Heciyê Cindî, di pêşgotina berheme xwe ya bi navê “Şaxêd Êposa Rostemê Zalê Kurdî”⁴ de ji bo çiroka Rustemê Zal, ji çavkaniyên bi Rûsî van agahiyan neql dike:

Derheqa şaxên “Rostemê Zal” da cara pêşin akadêmîk V. V. Bartold malûmatîyên hewaskar û balkêş nivîsîne û gorî wan salixa di sedsala 3a berî dewrana me da “dema hukumdarîya arsakîda da çend milletên mayîn jî, ku ji Asîya Navîn hatibûn, bûne binecîyên Îranê. Yek ji wana sakî bûn, yên ku navê Seyistan (an jî Sakîstan) li devera xwe kirin û tesîra xwe li ser destana gelê Îranê kirin. Di wê destanê da dîdemên here balkêş ji sakîya derketîya: ew serpêhatîya derheqa Rostemê navdar da ne. Îranîstê bi nav û deng, profêsor V. Î. Abayêv jî ser wê bawerîyê ye. (Cindî, 1977)

Rustemê Zal, navûdengê qenc yê bav û kalên xwe domandiye. Wek mezinên xwe hem pehlewaneke çeleng û wêrek hem dilpak û rast bû. Ew bi aliyekî xwe lehengekî xwediyê hêza bêhempa ye, tew navê hesp û gurza wî jî çavê neyaran diritsîne ji aliyê din mirovekî dilsoz û rastgo ye. Tu car jî rêya rast neqetîya ye. Tu car jî gotinên bavê xwe Zalê û kalê xwe Samê derneket, bi şîretên wan li piya ma.

⁴ Ev berhem di dala 1977’ dan de bi kîrîlî hatiye nivîsandin û li ser malpera krd.riataza.com ji aliyê Mîdîya Têmûr û Dîdara Têmûr ve hatiye latînzekirin.

Wesfê Rustemê yek jî ku wî ji lehengên din vediqetîne bawermendiya wî ye. Bawer dike ku hêza xwe ji Xweda digire, baş pê dizane îtiqada wî çiqas zexm be şûrê wî jî ewqas zexm e. Di her tengasiyê de xwe dispêre Xwedayê xwe. Beriya şeran dua dike, piştî şeran şikir dike.

Ji hûnerên Rustemê yek jî nêçîr e. Bi qasî şerê di nêçîrê de jî jêhatî ye. Di derbekî de, bi yek tîrê ajalan dikaribû biqefalta. Bê şer û nêçîrê dema Rustem bi civata şahiyê, bezm, mey xwarinê derbas dibû. Ji aliyê xwarin û vexwarinê de jî kes xwe nedigîhand Rustemê. Bi tena serê xwe bi carekê de koviyekî dixwar, ji her kesê zêdetir meyê vedixwar lê pê serxweş û sermest nedibû.

Rustemê Zal bi tevê van taybetmendiyên xwe ji nava mîtolojiyê û efsaneyan derketiye, ji helbestên klasîk bigire heta çîrokên gelêrî di her cureyên edebî de derdikeve pêşberî me. Di helbesta klasîk de ji lehengê esas zêdetir wek hêmanê teşbîhê hatiye bikaranîn. Lê di çanda gelêrî de wek serpehatiyên wî yên li *Şehnameyê*, di çîrokên serbixwe de bûye lehengê sereke. Çîroka wî di hin varyantan de ji bûyîna wî heta mirina wî tê vegotin, di hinekan de jî her bûyer bi awayekî musteqîl wek çîrokekî tê saz kirin.

Rustem, di helbesta klasîk de bi taybetî li qesîdeyan wek nîşana lehengî, serfirazî û qewetê tê yad kirin. Yek ji navên bavê Rustem jî “Dastan” bû. Wateya Dastanê “fêl(hîle)” ye. Ji ber vê navê Rustem bi taybetiyên fêlbaz û kujer wek “zulf”, “birû”, “çav” û “xemze” re tê bikaranîn (Pala, 2018: 382).

Dursun Ali Tökel, ji bo Rustemê Zal agahiyên berfirehtir dide: Rustem lehengekî mezin e ku bi nava efsaneyan ketiye, ji aliyê helbestvanan bi sedemên cuda hatiye bikaranîn: a. Rustem zêdetir ji bo kesê pesndayî bûye hêmanê hevberî yê. Helbestvan dema behsa egîdî û mêrxasiya yekî bike, navê Rustem bi lêv dike û wî kesê ji Rustemê çêtir dibîne. Ango ewqas bihêzê ku Rustem li berê qels dimîne. b. Rustem ji aliyê hin helbestvanan ji bo vegotina evînê hatiye bikaranîn. Gelemperî bijangên dildarê ji aliyê bêrehm bûn û kujerî yê ve şibandine kevana Rustemê. Yek ji navên Rustemê “Dastan”, di wateya hîleyê de ji bo binavkirina çav, bijang, birûyên dildarê hatiye bikaranîn. c. Rustem û lehengiya wî ya bi navûdeng di mijarên cur bi cur de wek hêmana berawird kirinê hatiye bikaranîn (Tökel, 2016: 200-202).

Di edebiyata tesewûfi ya Farsî de Rexşê hespê Rustem bûye amûrekî girîng ji bo pêkanîna wate û ramanên bilind. Helbestvanên mutesewif, şerê di navbera Rustem û dêwê spî de wek şerê di navbera mirov û nefse de dîtine (Yıldırım, 2008b).

Heciyê Cindî jî tîne ziman ku di nava çanda gelê Kurd de serpêhatiyên derheqê Rustemê Zal di deverên cuda de bi versiyonên cuda belav bûbû û lê zêde dike: Herçend gelê Kurd ji Firdewsî û *Şehnameyê* haydar bin jî çîroka Rustemê dibe ku bêriya *Şehnameyê* jî li nava Kurdan hebe. Li aliyê din şaxên vê destanê yên ji *Şehnameyê* hatine girtin, gav bi gav hin tişt lê hatine kêmkirin an jî zêde kirin (Cindî, 1977). Şerefxan Cizîrî, wek lehengeke mîtolojîk mîsyona Rustemê Zal wiha vedibêje:

Di binbîra Kurdan de Rustemê Zal êdî bûye sembola berxwedanê û hêzê. Li vir armanc afirandina simbolên erênî û belavkirina wan a di nava gel de ye. Dema ku ev armanc tev li xeyalên gel bibe, lehengeke gel yê mikemel derdikeve pêşberî me. Ji niha pê ve êdî her kes Rustemê Zal li gor hêvî û rewşa xwe ya civakî şîrove dike. Êdî her ferdê wê gelê xwe wek Rustemê Zal dihesibînin û tevlî şeran dibin. Dîrok cihê xwe ji mîtolojiyê re dihêle. Rustemê Zal, hêdî hêdî ji Rustemê Zal ê dîrokî û rastî dûr dikeve. (...) Mebesta “wek Rustem bûn”ê di nava Kurdan de nîrxên îdeolojîk pêk anî. Navê Rustemê Zal, ji vê pê ve dibe bangewaziya berxwedanê. Armanc li vir ev e: çalakkirina lehengê simbolîk û fikrên ku ew temsîl dike ye. (Cizîrî, 2017: 356)

Li ser Rustemê Zal di her çavkaniyê de agahiyên ji hev cuda hatiye ragihandin. Lêkolîner li ser xala kesayeta Rustem ya rastî bi hev nakin, ji bo agahiyên rasteqîn yên jiyana wî ramanên cur bi cur li ber destê me hene. Lê mixabin lêkolîner bi xwe jî ji van teoriyan piştrast nînin. Lewra delîlên qethî yan belgeyên dîrokî li ber dest nîn e. Ji bo Rustemê, gotinê ku bêguman em bikaribin bêjin ev e, ew wek leheng bûye nîşana hêzê. Ji bûyîna heta mirinê taybetiyên derasayî nîşan dide. Rustem wek lehengekî, li cihekî di navbera mîtolojiyê, efsane û destanan de disekine. Herçend xwediyê hin taybetiyên sermirovî be jî wek kesayetên mîtolojîk lehengekî sermirovî nîne.

Gelên wek Fars, Kurd, Tirk, Ereb, Ermenî û hwd. bi sedan salan vê vebêjeyê bi hêmanên netewî xemilandine û di her qada edebî-çandî de bi kar anîne. Ji ber vê yekê divê em tenê wek çîroka şer û lehengiyê li vebêjeyên Rustem nenêrin. Dema bi çavekî

baldar lê were nêrîn; tê de şopa mîtolojî, efsane, çand, ol, bawerî, kevneşop, dîrok û jiyana rojana ya gelan tê dîtin.

2.2. TEORİYÊN LÎ SER LEHENGAN Û RUSTEM WEK LEHENG

Di vê beşê de em ê pêşî pênaseyên peyva “leheng” bikin, pişt re bi taybetî teoriyên li ser lehengên efsaneyî û mîtolojîk bisekinin. Li dawiyê van teorî û pênaseyan li ser Rustemê tatbîq bikin.

Li gorî ferhenga Oxfordê ya elektronîkî peyva “hero (leheng)”yê bi van avayan tê pênasekirin: 1- Mêrê nemir yan jî nîv-yezdanî ku hin di serdema antîk de ji aliyê yezdanan ve jê re hêz, wêrekî û huner hatiye bexşkirin. 2- Mêrê ku bê têkiliya kar, xelat û saziyan dîsa jî wêrekî, zexmî û kemiliyê derasayî nîşan dide. 3- Kesê karê esil û cesûr dike, şervanê navdar. 4- Mêrê bûye mijarê efsane yan jî mîtan, karakterê helbest an jî çîrokê.

Di ferhenga Cambridge de ji bo vê peyvê ev tînen gotin: 1- Kesên wêrek, kesê ku karên baş û merdane yên bandora rêz û heyraniyê li ser mirovan dike. 2- Gelemperî karakterê mêrê e pirtûk an jî filman.

Li ser malpera TDK’yê jî pênaseya peyva “kahraman (leheng)”ê wiha ye: 1- Kesê li ceng an jî rewşên xeternak de bi kêr tê, egîd, mêrxas. 2- Kesê di bûyerekî de cihekî girîng digire. 3- Di roman, çîrok, şano û hwd. cureyên edebî de kesê herî girîng.

Turan Karataş; dema vê peyvê îzah dike dibêje, di metnên wek roman, çîrok, şano, destan gîredayî vegotinê ne de kesê ku bûyer li serê diqewimin (2007: 256).

Dema em li peyva “leheng”ê binêrin bi taybet du xalên sereke di hişê mirov de geş dibe. Yek kesên girîng yên di cureyên edebî ên nivîskî yan jî devkî de cih digire. Ya duyem egîd, şervan û pehlewane di şer û cengê de mêrxasiyê nîşan dide. Em dikarin Rustemê li her du xalan jî bi cih bikin. Lewra Rustem hem di *Şehnameyê* de lehengê berhema edebî ye hem li gor baweriya gel kesayetiyeke resen e mêrxas û pehlewane. Ji aliyê xwediyê taybetmendiyên derasayî ye wek kesekî efsaneyî ya binyada xwe ji mîtolojiyê digire. Ji aliyê din ve di bîra gel de wek lehengekî dîrokî û heqiqî cih digire.

Ev gotinên jorê, tenê wek bêjeyekî pênaseyên “leheng”ê bûn. Xuya ye ku kême zêde ev tarîf nêze hev in. Lê ji bo me kême dimînin. Ji bo têgihîştinekî têr û tije lazim e piçek kûr li vê meseleyê were nêrîn.

Pênaseya Rosenberg, ya li ser lehengê mîtolojîk wiha ye, zarokên yezdanê yên ku bi awayekî der asayî hatine dinê, xwediyê hêzekî derasayî, bi çekên taybet cinawiran dikujin, derdikevin rêwîtiyên dijwar, ji ber peywirên xwe dadikevin binê erdê û bi awayeke derî adetan dimire (2003: 18). Ev penasê ji serî hetanî dawî wek leheng li Rustemê Zal tê. Rustem jî bi awayekî derasayî ji dayik bibû, hin di zaroktiya xwe de wek şêran bi hêz bû, bi gurza xwe dêw kuşt, ji bo rizgar kirina Keyqawus ji heft xanê dijwar derbas bû, ne binê erdê lê ji bo armançekî derket ser çiyayê Elbruzê û bi defika birayê xwe di bîrê de hat kuştin.

Teoriya J. G. Von Hahn ya bi navê “Modela Lehengê Aryan” , ji ber ku di qada toeriyên li ser lehengên çanda devkî de ji xebatên sereke û pêşane yek e gelek girîng e. Ev model diparêze ku, di çîrokên çanda gelerî yên li ser “mîten lehangen” de, leheng li gorî model û nimûneyek tên saz kirin. Modela ku wek “Modela Biyografîk ya Lehengê Aryan” tê binav kirin bi vê awayê ye:

Bûyîn:

1. Leheng bi awayekî xeyrî meşru tê dinê.
2. Diya wî prensesê welatê ye.
3. Bavê wî yekê biyan e an jî yezdan e.

Ciwanî:

4. Elametên berzbûna lehengê hene.
5. Ji ber van elametan hatiye terk kirin.
6. Ew, ji aliyê ajalan ve hatiye mijandin.
7. Ji aliyê şivanên bêzarok ve hatiye xwedî kirin.
8. Ew, xortekî rihbilind e.
9. Ew di welatekî biyan de li pey karê xwe ye.

Veger:

10. Leheng, bi awayekî serfiraz vedigere welatê xwe.
11. Ew, dijminan bi bin dixê, dibe serdar an jî şahê welatê xwe û dayika xwe rizgar dike.

12. Ew, bajaran rizgar dike.

13. Ew, bi awayekî derasayî dimire (Çobanoğlu, 2010: 208).

Dema em li gorî vê teoriyê li çîrok û destanên Rustemê Zal binêrin xuya ye ev teorî, di gelek xalan de bi serpêhatiyên Rustemê Zal re lihevhatî ye. Diya wî jî prensesê welatê xwe ye, keça padişahê ye. Hîn di zaroktiya wî de elametên mêrxasî û pehlewaniyê bi Rustem re hene. Rustem ne, lê bavê wî Zal ji aliyê ajalan –Sîmirx- ve hatiye xwedî kirin. Rustem xortekî hêja û rihbilind e. Herçend çûbe welatê biyan jî dawiyê cardin vedigere welatê xwe, dijminan bi bin dixê. Gelek bajaran ji destê dijmin xelas dike û welatê xwe rizgar dike.

Ji teoriyên sereke yên li ser lehengan yek, teoriya “Lehengê Kevneşopî” ya Lord Raglan e.⁵ Raglan, dema ku çîrokên lehengên Yewnanî vedikole, çîrokan ji hev dike û dibîne di piraniya çîrokan de tîpê bûyeran wekhev e. Li ser vê yekê van bûyerên tîpîk rêz dike û li ser çîrokên gelek lehengan tatbîq dike. Li gorî teoriya Raglanê çîroka lehengê bi vê awayê ye:

1. Dayîka lehengê bakîreyekî ji esilzadeyan e
2. Bavê wî şah e
3. Pîrî caran bavê wî ji xizmên diya wî ye
4. Bi şert û mercên derasayî dikeve malzaroka diya xwe
5. Leheng wek kurê yezdanê tê dîtin
6. Carinan bavê lehengê hewl dide ku wî bikuje
7. Ji ber vê hewldanê leheng li cihekî nepenî tê veşartin
8. Leheng li wî ciyê ji aliyê malbatekî ve tê xwedî kirin
9. Derbarê zarokatiya wî de jê re tu tişt nayê gotin
10. Dema digîhîje diçe welatê paşerojê de lê dibe şah
11. Bi şah, dêw, ejdeha yan jî ajalekî re şer dike û bi ser dikeve
12. Leheng bi keça şahekî re dizewice
13. Dibe şah
14. Çendekî bêyî teşqele serweriyê dike
15. Qanûnan datîne

⁵ Wergera nivîsa Lord Raglan ya li ser vê teoriyê ya ku ji aliyê Metin Ekici ve hatiye kirin, di sala 1978'an de di kovara *Millî Folklorê* de hatiye weşandin.

16. Dûre leheng piştevaniya yezdan yan jî gelê winda dike
17. Ji textê û bajarê tê bidûrxistin
18. Leheng bi awayekî razdar dimire
19. Bi piranî li ser çiyayekî dimire
20. Zarokên wî li pey wî nayên ser text
21. Termê wî nayê veşartin
22. Lê dîsa jî li cihekî yan jî li çend cihan gora wî ya pîroz heye. (Raglan, 1978: 126)

Manendiyên navbera çîrokên lehengên kevneşopî ji rasthatinekî tesadîfî zêdetir in û afirandinên aidê rîtulekî ne. Em dikarin bêjin piraniya lehengan aidê mîtan in. Lehengekî rastîn be jî, hewce ye ji bo tîpa lehengê bikeve dirûvekî guncav. Bûyerên mîtik bere bere dikevin nava çîroka kesên dîrokî jî (Raglan, 1978: 137). Vê ramanê Raglan em ji Rustemê Zal jî dikarin bêjin. Li gorî hin agahiyan Rustem kesayetekî dîrokî ya rastî ye. Lê dibe ku taybetiyên mîtolojîk li çîroka wî hatibe zêde kirin. Raglan dîsa dibêje: “Pir kêma kes li pey heqîqetên dîrokî ne, mirov derbarê heqîqetê de ‘afirandina edebî (fiction)’ çêtir digirin (1978: 137).”

Xwendevan berhemên Homerê,⁶ bi armanca lêgerîna heqîqetên dîrokî naxwînin. Ji ber ku çîrokên baş dinivîse tê xwendin (Raglan, 1978: 138). *Şehname* herçend “nameya (kitêba) dîroka şahana” be jî qedrê vê berhemê esas ji ber nirxa edebî ye. Firdewsî efsane û mîtolojiyê dîrokekî afirandî derxistiye holê. Dîrokê bi hêmanên edebî xemilandiye. Xwendevan li ser rastiya bûyerên *Şehnameyê* nasekine, li ser balkêşbûna bûyeran disekine. Jixwe gelê Îranê dîroka li *Şehnameyê* wek rastiye dibînin.

Raglan, vê şablonê li ser çîrokên lehengên wek Oedîpus, Herakles, Dîonyos, Apollo, Zeus, Moses (Musa), Joseph (Yusuf) û hwd. nîşan dide. Tê dîtîn ku tev bi hev re nebin jî, piraniya van xalan bi çîrokên lehengan re lihevhatî ne. Em jî vê şablona rêz kirî li ser çîroka Rustemê Zal yê li *Şehnameyê* tathîq bikin. Çîroka Rustemê Zal herçend bi awayekî rasterast û kronolojîk nebe jî bi gelemperî li vê teoriyê rûdinê. Bi kurtasî serpêhatiyên Rustemê li gorî van xalan bibînin:

1. Diya Rustemê bakire ye û keça şah Mihrabê ye.
2. Bavê wî ne şah e, lê ne kesekî jî rêzê ye, pehlewaneke navdar e.

⁶ Mebest jê Homerosî nivîskarê “Îlyada” û “Odysseia”yê ye.

4. Ketina zikê diya xwe na, lê ji dayîk bûna wî bi awayekî derasayî ye.
11. Pir caran Rustemê Zal bi şah, dêw, fil û pehlewanan re şer dike û her tim bi ser dikeve.
12. Tehmîneya diya Sohrab keça şahekî ye.
13. Li welatê Turanê dibe şah.
14. 7 salan li ser texta Turanê rûdinê.
16. Dema welatê xwe dihêle û li texta Turanê rûdine yan jî bi gotina Şahê Îranê nake, gel bertek nîşanê wî dide.
18. Bi defîka birayê xwe tê kuştinê.
19. Ne li çiyayekî lê di çalekî de dimire.
22. Di nava gel de cihen ku wek gora Rustemê Zal tê pêjirandin heye.

Joseph Campbell, teoriyên xwe yê li ser lehengê û teoriya xwe ya monomîtê di bin serenava “Rewîtiya Lehengê ya Bêdawî” de kom kiriye. Campbell bi vê armancê, wateya rastî ya li bin figûrên olî û mîtolojîk digere. Li gorî nêrîna Campbell, di çîroka lehengan de zimanekî sembolîk heye. Di berhema xwe de bi rêya psîkanalîzê li pey van wateyên sembolîk dikeve. Campbell, rêwîtiya lehengê bi çend qonaxên sereke vedikole. Em ê nêrînên Campbellê bi kurtasî neql bikin û vê teoriyê çîroka Rustemê Zal li ser pratîze bikin. Teoriya monomîtê ya Joseph Campbell di bin sê gavên serekede ji hevdeh qonaxan pêk tê. Derbarê analîza teoriya monomîtê li ser serpêhatiyên Rustemê Zal xebatekî heye.⁷ Ji ber vê li vir heman gotinan dubare nakin. Em ê li ser taybetmendî û fonksiyonên lehengê bisekinin.

“Ol, felsefe, huner, şêweya cîvakî ya mirovên kevnare, dahênandinên zanistî û teknolojîk, xewn tev ji xelesa sereke û efsûnî ya mîtan derdikeve holê. Dawerên mîtolojiyê hilberandî nîn in; nayên daxwaz kirin, li hev anîn û serkut kirin. Ruh wana ji ber xwe ve çêdike û ji wan her yek hêza xwe di hindurê xwe de dihewîne. Nivîsên psîkanalîstan ji bo xwendevanên mîtolojiyê girîng e. Psîkanalîstên wek Freud û Jung nîşan dan ku sûdê mîtolojî û lehengan hetanê demên nûjen hatîna (Campbell, 2015: 13-14).” Pênase û nêrînên Joseph Campbell yê li ser lehengê ev in, “Leheng, jin an jî mêrê ku li pey pevçûnê ji sinorên dîrokî û mekanî derbas bûye û gihaştiye dirûvê mirovî yê asayî û daîmî. Fikir, tesewir û îlhamên kesên wiha; ji jiyana û ramanê mirovan bi awayekî candar derdikeve. Ew ne ji civakê û ruhê, ji çavkaniya civakî ne. Leheng wek

⁷ Ji bo agahiyên berfireh bnr. (Çeliktaş, 2018).

mirovêkî nûjen miriye, lê wek mirovê ebedî –mirovê gerdûnî, bêkêmasî, nediyar- cardin hatiye dinê. Wek karê yekem divê leheng, rûyê erdê vekîşe û dijiwariya di kûrahiya ruhê de çareser bike, bi tena serê xwe dijiwariyan ji holê rake û bigihîje tecrûbeya yekser û rast. Peywir û armanca wî ya duyem ji nû ve, vejerina li me û ji me re rê nîşandan e (Campbell, 2015: 25).

Li gorî teoriya monomîtê, rêya serencama lehengê mîtolojîk ji sê gavên sereke pêk tê: veqetîn, têgihîştin, vejerîn. Ev rêwîti tevgerêkî çerxî ye. Gava yekem leheng ji cîhana asayî der dikeve û ber bi alêmen ecêb ve diçe, gava duyem leheng li vê alemê li dijî hêzên efsaneyî şer dike û teqez bi ser dikeve, gava seyem de leheng hêzekî raser bi dest dixê û vedigere (Campbell, 2015: 35). Vê çerxê em dikarin çîroka li Rustemê Zal bibînin. Çîroka Rustem ji tek bûyerê pêk nayê. Em dikarin bêjin ku di serencama Rustem de ev her sê gav pir caran tê dubare kirin. Rustem carê ji bo armancakî pîroz bi rê dikeve. Yê li hemberê wî kî be jî -fil, dêw, şah, pehlewani, leşker, Efrasiyab, Sohrab, Îsfendiyar- wê têk dibe. Bi vê serbilindiyê her carê navê xwe bilindtir dike û vedigere.

Çawa ku Rojava ji aliyê “deh ferman”ê Musayê ve hatiye pîrozandin, Rojhilat jî bi doktrîna Buddhayê hatiye pîrozandin. Yewnanî piştewaniya hemû çanda mirovan bi lehengiya Prometheus⁸ ve girêdan, Romyayî avakirina bajarên xwe bi Aîneîas⁹ ve girêdan (Campbell, 2015: 40). Rustemê Zal jî bo hemwelatîyê xwe heman mîsyonê digire ser xwe. Rustem, serfirazê her şerî ye. Di her tengasiya welatê xwe de derdikeve meydanê, hatina wî dibe mizgîniya rizgariyê. Bi tena serê xwe fil û dêwan dikuje, leşkeran û artêşan têk dibe, avakerê biserketînen dîrokî ye. Gelê ku tê de pehlewani wek Rustemê Zal hebin, dibin xwediyê nişana serfiraziya daîmî. Rustem bi rêya van biserketinan welatê xwe teqdîs dike.

Di encama rêwitiya serkeftî ya lehengê de, herîkîna jiyane serbest dimîne. Ev herîkîna, herîkîna enerjîyêkî çalak e, raza berdehamiya cihanê ye (Campbell, 2015: 44). Leheng nîşana çerx kirina cihanê, ji nû ve ji dayîk bûn û bêdûmahîtiyê ye. Tevgera lehengê veguherîna enerjîyê nîşan dide. Çawa ku enerjî li rûyê erdê qet winda nabe û her dem bi awayekî digere, hebûna mirovê jî qet winda nabe. Ev veguherîn mirovê ji tîrsa fanî bûnê xelas dike. Mirov ji ramana tûne bûnê û bi dawî bûna her tiştê ditirse. Ji

⁸ Lehengekî mîtolojiya Yewnanê: ji yezdanan agirê (agir sembola şaristanî û zanistê ye) girtiye û daye mirovan. Ji ber vê jî aliyê yezdanan ve hatiye ceza kirin.

⁹ Yek ji lehengên “Troya”yê. Li dû têkçûna bajarê Troyayê, bi rêhevalên xwe re Romyayê saz kiriye.

ber vê bi jiyana piştê mirinê yan jî bi reenkarnasyonê bawer dike. Mewcûdiyeta lehengê û liv û tevgera cihanê ya bêdawî dilê mirovan rehet dike.

Leheng her ku diçe ji xeyalîbûnê dûr dikeve, dawîya dawîn li pey efsaneyên kevneşopiyên heremî di wextên qeydkirî de derdikeve holê (Campbell, 2015: 279). Rustemê Zal, ji vebêjeyên mîtolojîk derbasê efsaneyan, ji efsaneyan derbasê çîrokên asayî bûye. Bi gotina Campbell, di demên mîtolojîk de binyada şaristaniya mirovan dihat danîn, lê bi pêşveçûna dewra cihanê ve edî serdema proto-mirovan qediya û dema pêdiviyên nûjen hat (2015, 280). Leheng, bi dewra bêsekan a cihanê re guherî, hêdî hêdî taybetiyên mîtolojîk ji ser xwe avêt û taybetiyên asayîtir li xwe bar kiriye. Rustemê Zal jî wek lehengekî ji heman veguherînê para xwe girtiye. Rêwitiya Rustem ji mîtolojiyê dest pê kiriye, hetanê romana nûjen hatiye.

Heke kesayetek dîrokî bi kirinên xwe wek leheng xuya bike, ji aliyê efsanebêjan ve sêrpehatiyên guncav li çîroka wî tê zêdekirin (Campbell, 2015: 284). Li gorî hin lêkolîneran Rustem kesayetekî dîrokî û rastî ye. Dibe ku ew bi rastî jî di jiyana xwe de kêrdariyan nîşan dabe û hêmanên derasayî li çîroka wî ya rastî hatibe zêdekirin.

Campbell di rêwitiya lehengê de jin wek sembola azadiyê, hakimî û hêza jiyanê dibîne. Dildar, nivê din a lehengê ye, yek ji wan heman demê de ya din e jî: heke leheng cihan be bakîre cihan e, heke leheng şervan be bakîre navûdeng e. Bakîre, îmajê qedera lehengê ye (2015, 301). Rustem û Tehmîne mîna ku ji mêj ve hevdu nas bikin, bi dîtina yekem dil ketibûn hevdu. Çawa ku Rustem bi pehlewaniyê navûdeng dabû, Tehmîne jî bi rind bûnê navûdeng dabû. Dawiyê jî bi heman şînî -mirina Sohrab- dil şewitî bûn.

Di biyografiya lehengê de lêkera dawî mirina yan jî veqetîn e. Di vê gavê de hemû wateyên jiyanê tê kurte kirin. Heke mirin lehengê netirsîne, ew nikare bibe leheng, şertê yekem bi gorê re sulh kirin e (Campbell, 2015: 314). Dema birayê Rustem ew xapand û xist çalê, Rustem heta ruh jê kişiya ji bo xelasiyê li çareyekî geriya. Heta nefesa dawî hewl da ku ji mirine xelas bibe. Bi hêza xwe ya dawî jî tîrê davêje ku birayê xwe yê xayîn bikuje lê nikare.

Li gorî Campbell herçend faîl leheng be jî digel hemû xetere û êşê em bi cih anîna peywirê wek karê “destekî îlahî” dibînin. Leheng, di nava hemû kêf û kedera cihanê de “hêza îlahî” nîşanê me dide (2015: 303-304). Leheng, nûnerê hêza Xwedayê ya li cihanê ye. Tiştên nemimkûn dixuyê, dike mimkûn. Ev peyama Xwedayê ye ji mirovan

re. Ango Xwedê bixwaze bi hêza xwe ya bêpivan dikare her tiştê bike. Leheng wek pêxemberan hem mirovî ye hem ser mirovî ye. Ji ber vê peyama “hêza îlahî” dikare neqlê mirovan bike.

Leheng ji nediyariyê peyda dibe lê dijmin bi hemû hêza xwe li meydana ye. Ew dijmin e, ejdeha ye, tîran e çimkî desthilatiya xwe ji statûya xwe digire. Tîran pozbilind û qure ye, dawiya wî jî ji ber vê ye. Nefsbilind e, mîna ku jêdera hêzê ew bixwe be tevdigere. Madde û şewqê tevî hev dike, xapîn bextê wî ye (Campbell, 2015: 296-297). Lê leheng hay ji kaniya hêzê û bingeha hebûnê heye. Yê ku xwe bispêre hêza îlahî, her dem bi ser dikeve. Leheng li dijî dijminên bi her awayî, piştî xwe dide Xwedayê – heyîna yegane, afirînende, heybera yekem- û bi vê hêzê derdikeve meydana şer. Heta li piştî wî vê hêza îlahî hebe tu car bi bin nakeve. Ji ber ku ne ji xwe ji vê hêza îlahî bawer dike qet têk naçe. Rustemê Zal li gorî çîroka xwe ya *Şehnameyê* mirovekî bawermend e. Dua û şikir ji ser zimanê wî nayên xwarê. Lê ya li hemberî wî -dêw, fil, şah, leşker- ji ber nefsbilindiyê her dem mehkûmê têk çûnê ye.

Dêrûnnas Otto Rank, li ser lehengên mîtolojîk bi rêbazên psîkanalîzê xebatekî kiriye. Çîroka gelek lehengên Yewnan, Roma, Cihû, Xiristîyan, Hînt û Germen daye ber xwe. Mîten li ser ji dayik bûna lehangên -Sargon, Musa, Oedîpus, Parîs, Gilgameş, Herkûl, Îsa û hwd.- vekolaye. Di çîroka lehengên mîtolojîk de motîfên her tim tê dubare kirin bala wî kişandiye. Li gorî Rank, ev motîfê mîtolojîk wateyên dêrûnî yên gerdûnî dihewînin. Li ser vê xebata xwe ya bi navê “Mîta Bûyîna Lehengê” saz kiriye. Em ê li ser teoriya Otto Rank hûr bin.

Tevahiya neteweyên giregir –Babîl, Misr, Îbranî, Hîndu, Pers, Yewnan, Roma, Germen û hwd.- ji demên berê heta niha lehengên xwe yên neteweyî bi çîrok û efsaneyan payebilind dikin. Çîroka ji dayik bûn û ciwantiya lehangên nemaze bi taybetiyên xeyalî ve girêdane. Ev taybetmendî herçend aîdê gelên ji hev gelek dûr be jî, navbera wan de wekhevî heye (Rank, 2018: 9). Wekheviya nava van berhemana aîdê hêza xeyala mirovan e (Rank, 2018: 14).

Rank, pergala motîfên li çîrokên lehengê mîtolojîk wiha diyar dike: Dê û bavê lehengê kesên bijarte ne, gelemperî kurê şah e. Beriyê astengî û qedexeyên ji derve hene, an dê û bav nagihîjin hev an jî zarok ji wan çênabe. Hin di ducanîtiya dayikê de li gorî xewnan an jî kehanetan ji bo desthilatdariyê bavê -şahê- wek xeter tê dîtin.

Gelemerî dema ji dayik dibe di nava zembîlekî de tê bi dûr xistin. Dûre ji aliyê ajalekî an jî mirovekî ji rêzê ve tê xelas kirin û xwedî kirin. Mezin dibe, bi awayekî dê û bavê xwe yê heq dibîne. Ji aliyekî tola xwe ji bavê xwe distîne ji aliyê din xwe îspat dike. Dawiyê paye û rûmetekî bilind bi dest dixe (Rank, 2018: 74). Çend xalên vê pergale em dikarin di çîroka Rustemê û ya Zal de jî bibînin. Hem Rustem hem Zal zarokê mirovên ji rêzê nîn in, kurê pehlewaniyê navdar in ku ev pehlewaniya hema hema asta şahan de ne. Diya Rustem keça şahekî ye. Dê û bavê Rustem ji du gelên neyar in. Rustem hin di zikê diya xwe de jî nebû, sternas derbarê wî de pêşbînîyên xwe digotin. Bi wan eyan bibû dê navûdengê pehlewaniya Rustem li cihanê belav bibe. Bavê Rustem jî pehlewaniyê navdar bû, ango Rustem bavê xwe derbas dikir. Lê ev ji bo Zal û Rustemê nebûye sedema dijberiyê. Ji dayik bûna Rustem jî bi alikariya ajalekî efsaneyî, Sîmirxê ve bûye. Di bûyîna Rustem de motîfa bi dûr xistina ji malê tune. Lê ya Zalê de heye: Zal dema ji dayik dibe birû, bijang û porên wî tev spî ne. Bazê wî ev wek bêyomî dihesibîne. Motîfa ji aliyê ajalekî ve xwedî kirinê jî bi Zal re heye. Ew dema li çiyayê Elbruzê tê ter kirin, ji aliyê Sîmirxê ve tê xwedî kirin. Dijberiya bi bavê re hem ji bo Rustem hem ji bo Zal tu car peyde nabe. Navbera Sam û Zalê de jî, Zal û Rustemê de jî her dem piştgirî heye.

Mît, ji aliyê lehengan ve hatiye honandin, qet nebe ji aliyê lehengên zarok ve; lê ev demeke dirêj e wek berhemên mezinan tînan zanîn. Di xiyala mirovan de çîroka lehengên derasayî ancax ji zarokatiyekî tekûz dikare were. Ev zarokatiya derasayî ji aliyê afirînerên mîtan ve hatiye saz kirin. Afirîner, bîranînan zarokatiya xwe ango xwe, bi lehengê re wekhev dibîne; di kesayeta xwe de lehengê dibîne. Ji ber vê lehenga esas “ego” ye (Rank, 2018: 95-96). Rank, bi van ramanên xwe li ser erka lehengên mîtolojîk nêrînekî taybet dide ber me. Bi gotina wî mirov hemû fanteziyên xwe li ser lehengê îfade dike. Mirov îsyar, xeyal, armanca û daxwazên li ser lehengê dide der. Leheng çiqas xwediyê taybetiyên derasayî û efsaneyî be jî, mirov xwe beramberê wî dibîne.

Li gorî Rank hêmanên esas ên lehengiyê dadmendî û mecbûriyeta tevgerê ye. Ji ber vê tînan teqdîr kirin û ecibandin. Leheng ji ber kirinên xwe yê xerab nayê sîncdar kirin (Rank, 2018: 109). Her tevgerê lehengê ji bo armanca wî ya pîroz e. Mirovan bikuje, kelehan hilweşîne, welatan wêran bike tew kurê xwe yan bavê xwe jî bikuje dîsa bi çavekî xerab lê nayê nêrîn. Her dem pesndayî ye. Mirov, bi vê rêyê kirinên xwe yê xerab jî wek yê lehengê pak dibîne. Ji bo armanca pîroz her tiştê mubah dibîne.

Mîrcea Eliade, li ser peywîr û wateyên mîtan xebatan kiriye. Eliade, ji ser mîtan ramanên sereke yên gelên arkaîk vekolaye. Li pêy lêkolînên hûrgilî, teoriya xwe li ser dubarekirina daîmî ya mîtan ava kiriye. Eliade, li ser têgehên “arketîp” û “dubarekirinê” û ontolojiya arkeîk sekiniye.

Kirinekî yan jî heyberekî ancax bi dubarekirin an jî teqlîdkirina arketîpan dibin rastî. Heqîqet tenê bi dubarekirin û tevlîbûnê bi dest dikeve. Tiştê ku ji nimûneya wî tune be wateya wî jî tune ye. Lewma mirov meyla arketîpî û paradigmaticbûnê dîkin. Mirov ji bo resen be divê arketîpan dubare bike. Ev wek nakokî dixuyê (Eliade, 2018a: 49). Mirov dema bi kirinên xwe arketîpan dubare bike dem, wext, dîrok ji holê radibe. Bi vê awayê xwe digihîne demên mîtolojîk (Eliade, 2018a: 50).

Şervan, bi tevgerên xwe “lehengekî” teqlîd dike û hewl dide ku xwe bigihîne vê arketîpê. Li cihên ku hîn bandora kevneşopiyê lê heye, hikumdar xwe wek teqlîda lehengê yekem dibînin (Eliade, 2018a: 52). Bi gelemperî şervan, fermanîdar, şah û padişahên Kurd û Faris -yên ku îdîa dîkin ji eslê Rustemê Zal in- xwe wek cîgirê Rustemê Zal dibînin. Bi vê serbilind dibin. Heke bi awayekî xwe bi Rustem ve girêdin ew ê jî wek Rustem bibin şaneya sefiraziyê.

Bêguman lehengên helbestên epîk kesayetên dîrokî ne. Lê belê dîrokîbûna wan lehangên ji ber pêkhatina mîtan hildiweşe. Êdî bûyera dîrokî ji bîra mirovan wînda dibe û bîranînên bûyera dîrokî çiqas nêzê şewaza mîte be ewqas bibandor dibe. Bûyer û kesayetên dîrokî di bîra gel de ancax du yan jî sê sedsalan dikare bimîne. Gel, bûyerên şexsî û tîpên rastî zu ji bîr dike. Lê avahî nayên jibîrkirin; kategorî dikevin şûna bûyeran, arketîp dikevin şûna kesayetên dîrokî (Eliade, 2018a: 57-58). Ne mimkin e ku Rustemê Zal bi çîroka xwe ya rastî ewqas bandorê li çand û bîra gel bike. Ew bi formeke mîtolojîk, li ser demê û mekanê ye.

Bilge Seyidoğlu jî lehangên çîrokên mîtolojîk dişibîne heyînen îlahî. Dibêje; ew xwediyê taybetmendiyên derasayî ne, aîdê asîmanê yan bihuştê ne. Yên duyem lehangên netewî ne ku serpêhatiyên wan yên efsaneyî tê vegotin. Zaroka malbatekî ji rêzê dibe xelaskerê gelê xwe, gelê xwe ji cinawiran, dijminan, xelayê xelas dike (Seyidoğlu, 2017: 17). Ev raman gelek li Rustemê Zal tê. Rustem ne kurê şah e, ne kurê yezdanê ye. Lê di her tengasiyê de dibe hêviya gelê xwe.

Mîtolojiyên mezin bi demê re qîmeteke edebî bi dest dixin. Kevneşopiya mîtolojîk ya gelên seretayî, bi destê helbestvan û alimên dînî ji nû ve hatiye saz kirin; bi vî awayî mîtolojî wek metnên nivîskî derketine meydana. Mîtolojiya ewilî ji aliyê seyah, mîsyoner û etnografan ve hatine keşf kirin, carinan ji aliye keseke afirîner bi bandaro çandekî bilind derbasê nivîsê dibin (Seyidoğlu, 2017: 15-16). Firdewsî, *Şehnameyê* li ser mîtolojiya Îranî afirandiye. Ji xuliqandina alêmetê hetanê lehengên derasayî vebêjeyên mîtolojîk li berhema xwe reşandiye. Çîrokên çanda devkî berhev kiriye û materyalên bidestxistî berhemeke xwedî naveroka dewlemend nivîsandiye. Li pey 30 sal xebatê ji mîtolojiya Îranî dîroka Îranê afirandiye.

Civakên seretayî bi hemû hêza xwe mîtan dubare dikin. Ji bo wan tiştê girîng zanîna mîtan e. Heke mîtan bizanibin sedeme hebûna xwe jî hîn dibin. Bi hînbûna mîtan û tekrarkirina mîtan; kirinên yezdanan, lehangên, bav û kalên xwe dubare dikin. Hînbûna mîtan, tiştên nediyar û nepenî eyan dike (Seyidoğlu, 2017: 20). Dibe ku belavbûna lehengên wek Rustemê Zal jî ji vê sedemê be. Kesê ku çîroka wî hîn bibe, dubare bike, vebêje xwe digihîne sîrrê hêza wî. Vebêjer dema çîroka Rustem dubare dike, ew bixwe tevgerên wî jî dubare dike. Ango xwe digihîne wî.

Mît, ji demên ewil heta niha pîrsgirêkên derûnî û zorayiyên li pey şer û cengan çareser dike. Mirovên civaka kevnare bi heman çavê li her pîrsgirêkê dinêre. Ji bo wan şer, nexweşî, tarîfî, çembilekî şikestî, jinekî bêzarok tev wek hev in. Rewş çiqas bêhêvî be jî dubarekirina mîtan pîrsgirêkê çareser dike (Seyidoğlu, 2017: 28).

Efsane nîşaneyê pêdivî, daxwaz, hêvî û tirsên mirovan in; rewşa û siruştê mirovî rave dikin. Efsaneyên lehengî, ji bo mirovan şêwazên tevgerê peyda dikin. Efsane bersiva pîrsên daîmî ye: Ez kî me? Divê jiyana xwe çawa derbas bikim? Efsane li ser van pîrsên hevpar, ji bo her çandê bersivên cuda dide (Rosenberg, 2003: 15). Efsane û destanên lehengî yê gelan, ji bo endamên wî gelê kar û tevgerên munasîb, nîrxên û hêmanên çandî nîşan dide. Ji ber vê peywira xwe ji bo gelek girîng e (Rosenberg, 2003: 20). Wek lehengên efsaneyî ji bo her çandê mirov îro jî rast li hilbijartinên krîtîk tî, nabera daxwazên şexsî û berpirsiyariyên civakî de dimînin. Heke dixwazin bi ser kevin û armancê xwe bi dest bixin divê ew jî wek lehengê wêrek û bibiryar bin (Rosenberg, 2003: 16).

Mît, wek modelên neguher derdikevin holê û bi vê rewşa xwe bergehên nû didin ber mirovan. Cureta tevgerekî nû û hêza dahêneriyê dide mirovan. Mît dibêje, ev tengasiyên li ber te berê niha jî hebûn heke wextekî lehengekî bi ser ketibe tu jî dikari bi ser kevî (Eliade, 2018b: 191). Peyama mîtê ev e: çawa ku Rustemê ji gelê te di wextê xwe de dêwan kuştiye, fermanbaran têk biriye, ji heft xanê derbas bûye tu jî dikarî li dijî her zehmetiyê bi ser bikevî. Hêza Rustemê ya derasayî ji bo mirovên ji rêzê dibe hêvî. Mirov heman hêzê di xwe de jî dibîne.

Peyva “arî” hem bavê yekem hem lehenga esilzade îfade dike. “Arî” modela nimûne ye ku ji bo mirov xwe bigihîne safitiya nijadî, hêza fizîkî, esaleta lehengê tê teqlîdkirin (Eliade, 2018b: 241). Rustemê Zal ne tenê kesekî qewî û bihêz e, di heman demê de ew esilzade ye. Ji lewre kes an jî gelê xwediyê Rustem be, bixwe jî nijada arî ye.

Rustemê Zal bi hin taybetiyên xwe dişibe, ji mîtolojiya Yewnanî Heraklasê û Prometheusê. Ew jî wek wan herdem li dijî xerabiyê ye û herdem biserketî ye (Yıldırım, 2008a: 295). Heft Xanê Rustem jî dişibe “Dozdeh Xan”ê Herkul ê ya mîtolojîta Romayê. Rustemê Zal, hem di çanda Îranê de hem di çanda Kurdan de remza têkneçûnê ye. Her gel dixwaze bibe xwediyê lehengên wek Rustem. Bi tevê vê Rustem tu car li pey menfaetên şexsî neketiye. Her dem ji bo gelê xwe û welatê xwe şer kiriye. Ji ber vê xisletê xwe peywireke cîvakî digire ser xwe. Di hişmendiya gel de xwedibûna Rustemê, li hemberî gelê din dibe sedema serdestiyê. Hêza Rustem dibe hêza wî gelê. Ev hêz divê tenê wek heza fizîkî neyê dîtin. Ev hêzekî manewî ye ku di nava xwe bawermandî û wêrekiyê jî dihewîne.

Hêmanên wek kuştina Sohrab, heft xan, Rexş, kuştina dêwê spî, bûyîna Rustem, têkiliya Zalê û Sîmirxê, çiyayê Elbruzê motîfên sereke ên mîtolojiyê ne. Motîfên manendê vana di mîtolojiyên gelen cur bi cur de derdikeve pêşiya me. Wateya van motîfan kêr zêde wekhev in û di her çîrokê de bi taybetiyên çandî tîn xemilandin. Wek ku hemû teoriyên li ser lehengan de me dît gel çiqas ji hev dur bin jî heman motîfan bi heman çavê dibînin. Mîtolojî, di her welatê de nişaneyê binbîra cîvakî ye.

Ha di helbestekî nivîskî de be ha di çîrokekî gelêrî de be Rustemê Zal, di her formê de wek heman motîfa mîtolojîk derdikeve pêş. Me dît ku kesayetên dîrokî karên çiqas girîng kiribin jî rojekî tîn jibîrkirin lê motîfên mîtolojîk nayên jibîrkirin. Rustemê

Zal dê her û her bi awayekî di bîra miroavan de cih bigire. Berê tenê wek lehengekî mîtolojîk, dûre li nava efsane û destanan, ji wir derbasî çîrokên gelêrî, dawiyê di her teşeyên edebî yên modern de ew ê hebe.

BEŞA SÊYEM

DI ÇANDA KURDAN DE ŞEHNAMEYA FIRDEWSÎ, ŞEHNAMEYA KURDÎ Û RUSTEMÊ ZAL

Kurd û Faris bi tevê rehên hevpar ên dîrokî, xwediyê gelek hêmanên hevpar ên çandî ne jî. Navbera Kurd û Farisan de ji aliyê nijad, erdnîgarî, kok, ziman û çandê ve nêzikayî heye. Rehên Kurd û Farisan yên hevpar, ji bo fehm kirina hêmanên hevpar ên di çand û edebiyata her du gelan de jî dibe alîkar. Ji vê çanda hevpar hêmanên devkî hêdî hêdî bûne mijara berhemên edebiyata nivîskî. Em dikarin efsane û destanên li nava gel ku dûre dikevin naveroka helbestên klasîk, wek mînak bidin. Li gorî Abdurrahman Adak “Kurd hem ji aliyê zimên hem jî ji aliyê coxrafi ve nêzî Farisan bûn û edebiyata Farisî berî ya Kurdî kemilî bû, wekî edebiyatên di yên rojhilatê Kurdî jî kete bin bandora edebiyata Îranê de ne. (2015: 35)” Ev bandor, di helbesta klasîk de zelaltir xuya dike. Helbestên klasîk, hem ji aliyê teşeyê ve hem aliyê naverokê ve nîşaneyên edebiyata Farisî dihewîne.

Bandora Îranê ne tenê ji aliyê zimên ve çêbûye, ji aliyê naverokê ve jî hemû unsurên çanda coxrafyaya Îranê di edebiyata Kurdî de reng vedane. Dema em dibêin çanda Îranê, em wî çanda ku di nav gelên Îraniyan/Ariyan û Asyayê tevan de peyda bûye qesd dikin û kesayetên dîrokî, efsane, baweriyên dînî û gelek tiştên di yên wan gelan têxin nav wê (Adak, 2015: 42). Mîtolojiya gelên Îranî jî di çand û edebiyata Kurdan de derdikeve pêş. Kes û bûyerên mîtolojîk ji çîrokên gelêrî bigire hetanê helbestên klasîk û romanên modern cih digire.

Kevneşopa *Şehname* nivîsînê jî yek ji mînakên vê çanda hevpar e. Berhemên di forma *Şehnameyê* de nemaze li edebiyata Îranê, li tevahiya edebiyatên gelê rojhilata navîn tê bikaranîn. Di nava Kurdan de jî wek cureya edebî mînakên *Şehnameyê* hene. Ji xeynî vana *Şehnameya Firdewsî* bi mijar, naverok, bûyer û lehengên xwe di nava Kurdan de eleqe dîtiye. Tesîra *Şehnameyê* em dikarin helbest, efsane, destan, çîrok, stranên Kurdî de bibînin.

Shahab Valî li ser tesîra *Şehnameya Firdewsî* ya li ser çandên cuda wiha dibêje:

Şehnameya Firdewsî, gotegata taybet a Firdewsî ye ku ji çîrokên destanî û mîtolojîkî yê qewmên curbicur ên erdnîgariya Îranî pêk tê. Ji ber vê ye ku gotegota cuda û cihewazî yê çîrokên destanî di nav qewmên Îranî de gelek in. Yanî her qewm, versiyona xwe ya taybet a van çîrokan heye. Wek mînak, Şehnameya Lekî yan Şehnameya Bextiyarî û Şehnameya Kurdî (Valî, 2015: 285).

Di warê çanda Îranê de *Şehnameya* Firdewsî ji bo edebiyata Kurdî çavkaniya herî girîng e ku tê de derheqê Pîşdadî, Keyanî, Eşkanî û Sasaniyan de agahiyên tarîxî û efsanewî tên dayîn. Di edebiyata Kurdî de gelek caran kesayetên wan dewran ên wekî Cemşîd, Dahak, Ferîdun, Rustem cih digirin (Adak, 2015: 42-43). Kesayetên *Şehnameyê* yê efsaneyî û mîtolojîk bi taybetî çanda devkî ya Kurdan de, lehengên li ber çav in. Li ser van lehengan gelek çîrok, efsane, gotegot, biwêj, stran hene.

Yek ji navgînên Kurdan ku dîroka xwe pê veguhestine, çîrokên *Şehnameyê* ne (Vali, 2018: 72). Teqez *Şehname* bi leheng û çîrokên xwe ve ji bo Kurdan li cihekî taybet disekine. Girîngiya *Şehnameya* Firdewsî ji bo Kurdan, tenê ji ber hewandina hêmanên çanda hevpar nîn e. Firdewsî di berhema xwe ya berfireh de li ser rehên Kurdan çîrokekî efsaneyî jî neql dike. Çîroka li ser Kurdan di *Şehnameyê* de ji çîrokên pêşîn hatiye dayîn yek e. Çîroka li ser rehên Kurdan a di *Şehnameyê* de wiha ye: Dahhaqê li ser texta Ereban kesekî dilxerab bû û bi şeytan re hevkarîyê dikir. Şeytan, rojek di dilqê aşpêjê de her du milên Dahhaq maç dike. Bi vî awayî ji her du milên Dahhaqê bu mar derdikeve. Tu çareserî ji bo van maran nehat dîtîn. Şeytan îcar jî ket dilqê hekîmê rêyekî nîşanî Dahhaqê da. Got heke rojê mêjîyê du ciwanan bi maran bidin xwarinê dê demeke din mar bimirin, heke na ew ê Dahhaq ji destên van mara bimire. Dahhaq li ser vê çareyê her roj du ciwanan dida kuştin û mêjuyê wan dixwar. Dahhaqê zalim li pêy Cemşîd îcar hat ser texta Îranê. Hezar salan li ser text ma. Tevahiya cihanê girt bin desthilatdariya xwe. Di dewra wî de qencî ji rûyê erdê rabû, xirabî belav bû. Dahhaq dema padişahê Îranê bû jî rojê du ciwanan dida kuştin û mêjîyê wan dixwar. Li vê welatê du aqilmendên bi navê Ermayîl û Germayîl hebûn. Ermayîl û Germayîl bi niyeta xelas kirina ciwanên welatê xwe wek aşpêj ketin qesra Dahhaqê. Her rojê du kes ji bo mêjîyên wan were girtin dihatin qesrê. Ermayîl û Germayîl ji van ciwanan yekî didan kuştin û mêjîyê wî digirtin. Ya din vedişartin û bi şûna wî de mêjîyê miyê digirtin. Mêjîyê miyê û yê ciwanekî bi nav hev dixistin. Ermayîl û Germayîl kesê ku ji

destê zordariya Dahhaqê rizgar dikirin, dişandin çiyayekî û li wir vedişartin. Mehê sîh ciwan bi vê awayê direviya wê çiyayê. Gav bi gav hêjmara wan kesan zêde dibû. Eslê qewmê Kurdên îroyî ji wan kesan tê. Kuştina Dahhaqê zordar bi alikariya Kawayê hesinker dibe.

Aydinlu (2012: 15), li ser rizgarbûna Kurdan ya di saya Ermayîl û Germayîlê de çend berhemên din jî wek mînak dide: “El Bedî û Tarîhî-Mukaddesî, Ehbarî-Teval Dînverî, El Maarîf Îbn-î Kutaybe, Mecmelul Tevarîh Ve Kisas, Asarul Bakîye-î Bîrunî, Tarîh-î Balamî, Gorar Ahbar Salebî û Zeynul Ahbar Gerdîzî.”

Peydabûna gelê Kurd bi kesayetên *Şehnameyê* ve girêdayî ye (Vali, 2018: 73). Bêguman sedema *Şehname* di nav Kurdan de evqas tê hez kirin ew e ku tê de li ser kokên qewma Kurdan hin hikayet hene (Aydinlu, 2012: 14). Ev gotegota li ser rehên Kurdan ya li *Şehnameyê*, di nava gelê Kurd de jî tê zanîn û tê pejirandin. Shahab Valî li ser vê mijarê agahiyan neql dike, “*Şehname* bingeha çanda Kurdan e. Li gorî girîngiya xwe yekem xal ev e ku mîtosa koka kurdan yanî çîroka Kawayê Hesinker pêwendiya xwe rasterast ligel çîrokên destanê heye (2015: 285).” Di vê çarçoveyê de Aydinlu jî van agahiyan dide ku ka *Şehname* ji bo dîroka Kurdan çavkaniyeke çawa ye:

Di *Şehnameyê* de mijara din ya li ser Kurdan, di cenga navbera Sasaniyan û Îskenderê de ye. Vê cengê de fermanarê Sasaniyan Erdeşîrê Babekan bi Kurdan re şer dike. Cara ewil, Kurda zora Erdeşîrê birin, lê cara din Erdeşîr Kurdan têk bir û dest da ser xenîmetan. (Aydinlu, 2012: 15-17)

Li gorî nêrîna Kurdan şecereya Kurdan bi hin kesayetên ku di *Şehnameyê* de çîrokên wan hatine vegotin ve girêdayî ye. Shahab Valî di berbarê vê nêrînê de ji hin lêkolîneran wiha neql dike:

Îro hê jî kurdên kelhurî xwe wisa dibînin ku ji Ferhad an jî Guhderz hatine. Kurdên gûranî ji Behram Gûr hatine, kurdên herema Hewramanê zarokên Rustem in. Her wiha tê gotin ku Isfendiyarê ku yek ji kurên padişah Goştasp e, bapîrê Loran, Bextiyariyan û kurdên Hewramî ye. (2018, 73)

Kurdan ne tenê *Şehname* rind dizanî, lê hela dinê Firdewsî nas jî dikirin. Wana jî mînanî cînarên xwe Farisan di derheqa Firdewsî de çîrok û hikayat afirandine (Cindî, 1977). *Şehname* bêyî xalên sereke wek bûyer, kesayet, efsane û lehengên tê de; ji aliyê mezmûn, teswîr, cih, dem, rê û rêzanên rojane, çanda gel, çîrokên evînî, şerkerî,

heyberên mîtolojîk, astengiyên li dijî lehengan, lîstik û hwd. hêmanên curbicur ve jî ji bo edebiyata Kurdî bûye palpişteki xurt.¹⁰ Çîrokên *Şehnameyê* di çanda Kurdan de cihê xwe yê folklorîk girtiye û bi awayekî xurt bi dîroka Kurdan re tevlihev bûne ev çîrok, ji jidayîkbûna van gelan bigire heta jiyana wan a rojane (Vali, 2018: 73). *Şehname*, bi naveroka xwe ya dewlemend hem ji edebiyata Kurdî ya nivîskî hem ji ya devkî re bûye çavkaniyekî girîng.

Gelek berhemên Kurdî yên ku binyada xwe ji *Şehnameyê* digire hene. “Nivîskarê Kurd Mîrzakerendî, çîrokên ‘Heft Xanê Rustem’ û ‘Rustem û Sohrab’ wergerandiye Kurdî. Di destê mîrekiyên Kîrmanşanê de nusxeyek destxeta *Şehnameyê* ya bi Kurdî heye ku li gorî hin lêkolîneran ev berhem wergera Serhenk Elmas Xan Kûneleyî ye (Aydinlu, 2012: 17-18).”

Şehname wek cureyekî edebî beriya Firdewsî jî piştî Firdewsî jî formekî berbelav bû. Lê li pêy Firdewsî zêdetir eleqe dît. Di gelên rojhilatê de *Şehname* hem bi wergeran hem wek berhemên telîf peyda dibe. Bi zîmanê Kurdî jî bi taybetî bi Goranî *Şehname* hatine nivîsîn, çanda Kurdan xwedî *Şehnameya* xwe ya bixwe ye ku wek *Şehnameya* Kurdî tê zanîn (Vali, 2018: 73). Di edebiyata Goranî de gelek mesnewiyên tarîxî û epîk di bin tesîra *Şehnameya* Firdewsî de hatine nivîsîn û ev mesnewî bi awayekî kollektîf wek “*Şehnameyê* Kurdî” hatine binavkirin ku jimara van mesnewiyan digihîje 30î (Adak, 2019b: 253). *Şehnameya* Kurdî bi hin taybetiyên xwe ji *Şehnameya* Firdewsî cuda ye. Vali, agahiyên berfireh derheqê *Şehnameya* Kurdî de dide:

Şehnameya Kurdî yek ji çavkaniyên herî girîng a çanda kurdî ye. Ev *Şehname* kuliyateke mezin e li ser gotgot û çîrokên mîtolojîk, hemasî û lehengî ku hem kevneşopiya ayînî, dînî, civakî û neteweyî vebeyan dike, hem jî ligel taybetiya xwe ji *Şehnameya* Firdewsî cuda ye. Hemû kurd bi giştî çîrokên *Şehnameyê* dinasin û dikarin çend beytan ji wan bixwinin. Yanî çîrokên *Şehnameyê* û jiyana, dîrok û civaka kurdan di nav hevdûde ne. Ji bo vê, li gor hin pisporan, pêwendîya kurdan ligel *Şehnameya* berî Firdewsî bûye (Vali, 2015: 285-286).

¹⁰ Ji bo mînakên hûrgulî bnr. (Aydinlu, 2012)

Firdewsî dema *Şehnameyê* saz dikir ji çavkaniyên curbicur istifade kiribû. Di nava van çavkaniyan de yê devkî jî yê nivîskî jî hebûn ku me behsa wan kiribû. *Şehnameya Kurdî* jî çend çavkaniyên cuda sûd wergirtiye. “Çavkaniyên *Şehnameya Kurdî*; edebiyata Îranî ya berî û piştî Îslamê, edebiyata devkî, edebiyata dînî (Vali, 2015: 286-287).” Taybetiya wekhev a *Şehnameya Kurdî* û *Şehnameya Firdewsî* yek jî ji aliyê mijarê ve dabeş kirina wan e. Li gor Shahab Vali, *Şehnameya Kurdî* li gor naveroka xwe ji sê beşan pêk tê û ew wek mîtolojîk-lehengî, dînî û dîrokî hatine tesnîfkirin (Vali 2015: 289-91) Herwisa Vali derbareyê versiyonên *Şehnameya Kurdî* de van agahiyên girîng jî dide:

Şehnameya Kurdî bi awayê devkî û nivîskî ye. Vebêja versiyona devkî dengbêj in. Nivîskarên versiyona nivîskî yê *Şehnameya Kurdî*, bi piranî ne diyar in. Behsa çend nivîskarên wek Elmas Xanê Kenduleyî û Mustefa Goranî tê kirin. Em dikarin bibêjin ku çîrokên *Şehnameya Kurdî* bi piranî anonîm in. (Vali, 2015: 286)

Herwisa li gor Valî, *Şehnameya Kurdî*, adaptasyon yan jî kopyakirina ji *Şehnameya Firdewsî* nîne. Yanî *Şehnameya Kurdî*, hem ji aliyê naveroka xwe hem jî ji aliyê mijar û avahiyê aîdê gelê Kurd e ku ew berhem di di pêvajoya xwe ya dîrokî ya taybet de hatiye avakirin (Vali, 2015: 293).

Di warê çanda Îranê de *Şehnameya Firdewsî* çavkaniya herî girîng e, di edebiyata Kurdî de gelek caran kesayetên *Şehnameyê* yê wek Cemşîd, Dehhaq, Ferîdun, Rustem cih digirin (Adak, 2019b: 50). Ji lehengên *Şehnameyê* Rustemê Zal di edebiyat û zargotina Kurdî de pirî caran derdikeve pêş. Di *Şehnameya Kurdî* de jî, di zargotin û edebiyata Kurdî de jî cihê Rustemê Zal gelek girîng e. Bê guman Rustem kesayeta herî berbiçav a çîroka destanî ya cîhana Îranî ya, lehengê herî mezin ê hemû deman e (Vali, 2018: 250). Herçend Firdewsî di *Şehnameyê* de rasterast nehanibe ziman jî li gorî lêkolîneran Firdewsî bixwe jî Rustemê wek Kurd dibîne. Selim Temo di pêşgotina *Kürt Şiir Antolojisiyê* de dibêje: “Firdewsî di *Şehnameya* xwe de destana Rustemê Zal wek destana Kurdan nîşan dide û ev destan wek destana Memê Alan ji bo Kurdî şopên dîrokî ne (2007, XIII).” Rustem wek lehengekî adil, bihêz û bawermend di çavkaniyên *Şehnameyê* yê nivîskî û devkî de jî cih digire. Rustemê Zal di edebiyata Kurdî de jî gelek tê hez kirin û pirî caran derdikeve pêşberî me. Rustemê Zal di nava Kurdan de wek lehengekî pevxistî ya *Şehnameyê* nayê dîtin, ji *Şehnameyê* cuda wek lehengekî

resen û Kurd dibînin. Efsane û çîrokên li ser Rustem ên bi Kurdî bi taybetî yên devkî berbelav e. Rustem bi nasnava xwe ya Kurd ve, lehengekî hezkirî û naskirî ye. Heciyê Cindî di pêşgotina “Şaxêd Êposa Rostemê Zalê Kurdî” de derbarê tekiliya Rustemê Zal û Kurdan de dibêje:

Lê di nav kurda da serpehatîyên derheqa Rostem da yên usa rast tîn, ku bi xusûsiyetên xweva ji “Şehname”yê gelekî dûr in. Di van şerta da em nikarin testîq bikin, ku ew perçên şaxa ji erfandinên Fîrdoûsî hatine hildan. Lê tişteke ji sedî sed e, ku hinek ji wana paşdemê da ser da hatine zêdekirinê, hinek ji wana jî dibe berî nivîsara “Şehname”yê hebûne. Dibe jî çend malûmatîyên derheqa Rostemê Zal da, ku berê da di nav kurda da hebûne, Fîrdoûsî bi kar anîye, an jî şair bi xwe dikaribû derheqa wan da bizanibûya û dema nivîsara perçên derheqa Rostem da, şaxên kurdî jî bi kar anîye, hela dibe ew şax bi zmanê kurdî jî bihîstibe, ji ber ku kurdî nêzîkî farisî ye. (Cindî,1977)

Hin lehengên pehlewaniyê yên ku ji aliyê Îraniyan ve wek lehengên millî tê qebûlkirin, di hefizeya tarixî ya Kurdan de jî wek lehengên Kurd ên efsaneyî tê qebûlkirin (Adak, 2019a: 31). Li hin eyaletên Kurdistanê tê vegotin Rustem pehlewaneke Kurd e û bi defîka birayê xwe Şagadê hatiye kuştin (Aydinlu, 2012: 19). Shahab Vali jî çavkaniyên cuda van agahiyan neql dike: “Digel vê yekê, kurd bi piranî xwe ji nîjada lehengên Şehnameyê dizanin (2015: 285).” Rustemê Zal ber dilê kurda ewqasî ezîz û navdar e, ku çend qebîlên kurda niha jî xwe wek zureta (peyhatîyên) ewî mêrxasê navdar dihesibînin (Cindî, 1977). Di nava gelên Hînt-Îranî de nemaze di nava Kurdan de nirx û tesewira mîtolojiyên Rustemê roleke girîng û bingehîn digire (Cizîrî, 2017: 357). Celadet Alî Bedirxan ji zanyarê Rûs ya bi navê Şarmoy wiha neql dike: “Milletin hene bi cengawerî û dîlaweriya hin serdarên xwe, xwe dane naskirin. Kurd ji wan in. Navê kurdan hêj di pêşiya zemanê kevn de bi derbên Rostem bilind û geş bûye. (Bedir-Xan, 2012b: 207)”

Çavkaniya ku Kurd bûna Rustemê Zal tîne ziman yek jî *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* ye. Pehlewaneke egîd û dîlawerê wêrek Rustemê kurê Zal, di dewra hikumdariya Siltan Keyqubad de jiyabû, Kurd e (Şerefxan Bitlisi, 2015: 64). Şerefxan (2015); ji xeynî Rustemî, Behramê Çûbînî yê li *Şehnameya Firdewsî* jî wek Kurd bi nav dike. Ji aliyê din ve di *Şerefnameyê* de nêrîna ku derheqê îzah kirina neseba Kurdan hatiye

vegotin, bi ya *Şehnameyê* re wekhev e. Ji ber ku Kurdan di nav rabirdûya çanda Îranî de roleke girîng listine, hevpariya van lehengan di nav her du çandan de tiştê gelek asayî ye (Adak, 2019a: 33).

Çavkaniyên ku Rustemê Zal wek Kurd didin nas kirin tenê çavkaniyên Kurdan û yên Kurdî nîne. Di salnameyên dewra Osmaniyan de jî ev agahî hatiye dayîn. Salnameya wîlayeta Bedlîsê ya sala H.1310 (M. 1892), ji aliyê Ebru Polat ve di teza lisansa bilind de hatiye transkrîbe kirin. Di beşa bi navê “nifûs, sekene û eqwam” ya vê salnameyê de tê gotin ku Rustemê Zal ji Kurdan e (Polat, 2006: 116, 392).

Di nava Kurdên Yarsan de jî Rustemê Zal xwediyê cihekî taybet e. Dijî kevneşopîyên din ên cîhana Îranî, di kevneşopiya yarsanan de Rustem ne kesayetêkî mîtolojîk e ne jî destanî (Vali, 2018: 251). Di derheqê girîngiya Rustemê Zal ji bo baweriya Yarsanan de Shahab Vali van agahiyan neql dike:

Li gorî kevneşopiya yarsanan, beriya afirandina cîhanê di Paymana navbera Xwedê û ferîşteyan de, Xwedê soz dabû ku dê di demeke guncav de xwe nîşanî însanan bide. Li gorî peymanê, Pîr Binyamîn “Pîrê Şertê” ye. (...) “Damyar Binyamîn” nêçîrvanê balindeyan e, lewre di enkarnasyonên xwe yên cihê de, di destê wî de tora wî heye û li Balindeyê nuwaze ango li Xwedê digere. Ji ber ku Pîrê Şertê ye, ji bo pêywira xwe pêk bîne hewl dide ku Xwedê bigire, bi girtina wî, Xwedê soza xwe bîne cih, ev enkarnasyona ku ji bo însanan xwe nîşan dide bextewariya herî dawî ye; û di dîtina ewil de, di tîketina laşê însanekî de ji bo Xwedê sînorek heye, dora wî digire, ango wî zeft dike, digire.(...) Peyman beriya her tiştî bi Pîr Binyamîn re hat kirin û ew wek Mîtra ye û bi karên vê cîhanê re berpirsiyar e. Li gorî doktrîna yarsanan, peywira “Rêberî/Pîr” yê ji bo Pîr Binyamîn û her wiha ji bo Rustem hatiye dayîn. Ev doktrîna peywira Rustem di Şahnameya Firdewsî de jî heye. Ew bixwe jî “nêçîrvaniya” padişahên Îranê dike û wan tîne ser text. (...) Pênasekirina Rustem bi Pîr Binyamîn re, di doktrîna yarsanan de cihê girîng ê Rustem nîşan dide. Êdî Rustem ne kesayetêkî lehengî ye ku bi saya hêza xwe padişahên Îranê diparêze û li textê wan xwedî derdikeve. Di kelimên yarsanan de, Rustem ji şeweya xwe ya normal derdikeve û nasnameyeke ruhanî ya kûr digire ser xwe. (Vali, 2018: 252-253)

Ramanên li ser Kurd bûna Rustemê Zal, pêwendiya Kurdan a *Şehnameyê* re - Rustem di *Şehnameyê* de cihekî gelek berfireh digire- haniye astekî bilind. Bi tevê ve di *Şehnameyê* de çîroka binyada Kurdan cih digire, ev yek jî girîngiya *Şehnameyê* ji bo Kurdan îzah dike. Ji sedemên girîngiya *Şehnameyê* yek jî ev e ku tê de derbarê jiyana û çanda Kurdan de hêmanên dewlemend hene. Ji ber van sedeman *Şehname* ji bo Kurdan wek berhemekî ji rêzê nayê dîtin.

Firdewsî, bi *Şehnameya* xwe, rasterast bandor li mesnewiyê epîk/tarixî ên Kurdiya Goranî kiriye, bi qasî ku tê dîtin di edebiyatên Kurmancî û Soranî de bandoreke bi vî rengî ya Firdewsî çê nebûye (Adak, 2019b: 250). Ciyê *Şehnameyê* ji bo Kurdan ewqas girîng e ku alim û felsefevanê navdar Muhammed Tabatabayî *Şehnameyê* wek “kitêba pîroz” ya Kurdan bi nav dike (Aydinlu, 2012: 19). Efsane, çîrok û bûyerên li *Şehnameyê* di edebiyata anonîm ya Kurdî de bi gelek formên cuda derdikeve pêşberî me. Em dikarin şopa van mijaran di efsane, destan, çîrokên gelêrî, stran û biwêjên Kurdî de bibînin.

3.1. DÎ EDEBİYATA KURDÎ YA KLASÎK DE RUSTEM

Di vê beşê de em ê di berhemên edebiyata Kurdî ya Klasîk de û helbestên Kurdî de bi kar anîna Rustemê Zal vekolin. Ji ser beyt û çarînên nimûne em ê nêrîna helbestvanên serdema klasîk, li Rustemê bibînin. Bi vê awayê em ê bibînin ku di helbestan de Rustemê Zal bi çi armancê, bi kîjan wateyê di helbestên xwe de bi cih kirine û Rustem bi kîjan taybetiyên xwe derketiye pêş.

Kurdî, wek zimanê edebî bi rêya helbestê derketiye holê; pexşan (nesîr) dû re ava bûye. Şair, teşeyên helbesta Erebi-Farsi bi kar anîne (Blau, 2017: 15). Berhemên ewilîn ên edebiyata Kurdî di forma helbestê de ne. Ev ekola ku hem ji aliyê naverokê ve hem ji aliyê teşeyê ve bandora edebiyata Erebi-Farsî lê bûye wek “Edebiyata Klasîk” tê bi nav kirin.

Ji edebiyata Kurdî ya nivîskî ya ku di serdema Îslamî de di bin bandora dînê Îslamê, unsurên Erebi û Farisî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzikan hatiye meydana re “Edebiyata Kurdî ya Klasîk” tê gotin (Adak, 2015: 31). Bi qasî ku di vê pênaseyê de jî tê fehm kirin, edebiyata Kurdî ya klasîk ji çanda Îranê îlham girtiye. “Peyv û îfadeyên Farisî, hinek têgehên edebî û teşeyên nezmê ji edebiyata Farisî derbasî edebiyata Kurdî ya klasîk bûn. Bandora helbestvanên Faris yê wekî Hafîzê Şîrazî, Nîzamî ji yê Erebi

zehftir li ser helbestvanên Kurdan çêbûye (Adak, 2015: 41).” Bandora edebiyata Farisî ne tenê ji aliyê naverokê ve, ji hêla teşeyên edebî ve jî bûye.

Ji ber ku Kurd hem ji aliyê zimên hem jî ji aliyê coxrafi ve nêzî Farisan bûn û edebiyata Farisî berî ya Kurdî kemilî bû, wek edebiyatên di yên rojhilatê Kurdî jî kete bin bandora edebiyata Îranê (Adak, 2019b: 52). Hem nivîskarên Kurd hem zargotina Kurdî nîşaneyên bandora edebiyata Îranê dihewînin. Di navbera edebiyata Kurdî û edebiyata Îranê de gelek hêmanên hevpar hene. Em dikarin wekî hêmanekî hevpar a edebiyata Farisî û edebiyata Kurdî ya klasîk, Rustemê Zal û tradîsyona *Şehnameyê* jî nîşan bidin. Ev lehengê efsaneyî di edebiyata Kurdî ya Klasîk de û helbestên klasîk de semboleke naskirî.

Lehengên pehlewaniyê jî di çarçoveya kesayetên efsaneyî/mîtolojîk de di edebiyata Kurdî ya klasîk de cih girtine. Piraniya van lehengan Îranî (di hefizeya Kurdan de Kurdî) ne, wek Rustem û bavê wî Zal (Adak, 2019a: 28). Rustemê Zal, bi taybetî di *Şehnameya Kurdî* de xwediyê roleke girîng e. Em dikarin bêjin ku giraniya *Şehnameya Kurdî* li ser Rustemê Zal e. Di *Şehnameya Kurdî* ya ku ji 60 hezar beytan pêk tê de, mesnewiya bi navê “Rustem û Seqlabê Dew” ji 3800 beytan, mesnewiya bi navê “Rustem û Zenûn” ji 1280 beytan, mesnewiya bi navê “Rustem û Zerdheng” ji 1200 beytan, mesnewiya bi navê “Rustem û Suhrab” ji 1100 beytan pêk tê (Adak, 2019: 261). Divê em vê xale jî jibîr nekin; ev tenê mesnewiyên ku di serenava wan de navê Rustem derbas dibe ne. Ji xeynî van mesnewiyan di yên din de jî Rustemê Zal lehengeke sereke ye.

Rustemê Zal di helbestên klasîk de, bi îsnad kirina çîrokên li ser wî yên gelêrî û taybetîyên wî yên *Şehnameyê* tê bikaranîn. Wek remza hêz, mîrxasî û serfiraziyê derdikeve pêş.

Ehmedê Xanî di “Mem û Zîn”ê de dema pesnê Kurdên navdar dide û qala cesaret û dilêriya wan dike navê Rustemê wek nîşana hêzê bi kar tîne:

Her mîrekî wan bi bezlê Hatem

Her mîrekî wan bi rezmê Rustem (Ehmedê Xanî, 2010: 132)

Di heman berhemê de Xanî îcar pesnê Mîrê Botan dide. Rustemî jî ji bo qiyas kirinê dide ber Mîr. Lê Mîrê ji aliyê qewetê ve di ser Rustemî de dibîne:

Muhtacê sexaweta wî Hatem

Mexlûbê şeca'eta wî Rustem (Ehmedê Xanî, 2010: 175)

Xanî di *Mem û Zînê* de pesnê mêrxasiya Gurgînê hevrêyê Mem dide. Gurgîn ewqas bihêz e ku, Rustemî têk biriye:

Yûsif ji melaheta wî mehcûb

Rustem ji şeca'eta wî mexlûb (Ehmedê Xanî, 2010: 497)

Tacdîn, ji aliyê Xanî ve bi navê Rustemê Zal tê îfade kirin. Ji ber mêrxesî û wêrekiya xwe ve Tacdîn wek Rustemê Zal dibîne. Navê “Rustemê Zal” bi qesda Tacdîn ve bi kar tîne:

‘Arif wehe gote Rustemê Zal:

Ev emr-i bi min muhal e bê qal (Ehmedê Xanî, 2010: 535)

Xanî, di vê beytê de Rustemê Zal wek “Rustemê Gêw” hatiye bi nav kirin ku mebest ji “Gêw”, Gîwê bavê Bîjen e. Li vir dîsa ji bo pêsnê mêrxasî û biqewet bûna Tacdîn hatiye bikaranîn:

Ew Rustemê Gêw e, lendeha ye

Gencîne me ez ew ejdeha ye (Ehmedê Xanî, 2010: 553)

Ehmedê Xanî di *Dîwana* xwe de birîna aşiqan dişibîne tîrê Rustemê Zal:

Eger husn e eger nûr e, eger nîzîk eger dûr e

Birîna aşiqan kûr e, ji sertîra Kurê Zalî (Ehmedê Xanî, 2014: 172)

Di “*Diwan*”a Melayê Cizîrî de çend caran navê Rustemê Zal derbas dibe. Di helbesta bi navê “Şah Bi Qesda Kuştina Min” de, Rustem û Cemşîd ji bo hêza mecazî hatine bikaranîn:

Rostem û Cemşîd û Xalid Hemze yan Şêrê Elî

Aferîn ya şehsiwarê tirk û rimbazê ereb (Melayê Cizîrî, 2012: 45)

Helbesta bi navê “*Kes Bi Dada Me Nepirsit*” navê Rustemê îcar bi tevê Ferhad – lehengekî ji efsaneya Hûsrew û Şîrîn- hatiye gotin:

Bi şîrînê negihit dest-i eger Rostemî bit

Dê bi bazû û milan şubhetê Ferhadê çi kit (Melayê Cizîrî, 2012: 62)

Mela, di helbestên xwe de navê Rustemê bi tevê lehengên navdar ên cuda bikartîne. Helbesta bi navê “*Neyşekera Gerden ‘Ac*” Rustem û Efrasiyabê dijminê wî bi hev re dihewîne:

Keyber reşandin bêhisab misrî ku dan sîqal û tab

Sed Rostem û Efrasiyab kuştin li wan ker kir cesed (Melayê Cizîrî, 2012: 97)

Di helbesta Feqiyê Teyran “*Dilo Rabe*” de navê Rustem bi vê avayê derbas dibe:

Ne Cemşîd ma ne Rustem ma

Ne Qeyser ma ne Hatem ma

Ne Asef ma ne Xatem ma

Ne malxwo ne serkar e (Feqiyê Teyran, 2014: 226)

Siyahpoş, di xezelekî de hêz û mêrxasiya Rustemê Zal derdixe pêş:

Nehin min qewwet û taqet di baxê Îrem û weslet

Eger bim Heyderê Xazî weyaxud Ristemê Zale (Siyahpoş, 2018: 183)

Rustemê Zal ji aliyê mey vexwarinê ve jî bêhempa bû. Di xezela Siyahpoş de navê Rustem bi meyê re hatiye bikaranîn:

Wek Heyder û Ristem ji meya ‘eşqê hebîbê

Zillet bidehem sefşîkînan elhemdulillah (Siyahpoş, 2018: 193)

Cardin Siyahpoş, di berhema xwe ya bi navê *Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal* de qehremaniya Rustemê Zal tîne ziman:

Xirabê wan wekî Rustem bizanin

Bi deng û nav û zor wek qehreman in (Siyahpoş, 2018: 219)

Navê Rustemê Zal, di beytên Hacî Qadirê Koyî ya ku ji aliyê Kadri Yıldırım ve ji bo Kurmanciyê hatiye wergerandin de derbas dibe. Ev beyt dişibin yên Ehmedê Xanî ku me li jorê wek mînak nîşan dabû. Di van beytan de Hacî Qadirê Koyî mêrxasî û wêrekiya Rustemê Zal derdixe pêş:

Be şecaet hemû weku Rustem

Be sexawet hemû weku Hatem

(Ji aliyê wêrekiyê ve hemî wekî Rustem in

Ji aliyê comerdîyê ve hemî wekî Hatem in)

Le cûd da Hatemî Taî

Le şer da Rustemî meydan

(Ji aliyê comerdîyê ve Hatemê Taî ne

Di şer de Rustemê meydanê ne)¹¹ (Yıldırım, 2016: 70)

3.1.1. Di Hin Helbestên Modern De Rustem

Ji xeynî serdema klasîk, di edebiyata Kurdî de di helbestên demên cuda de jî Rustemê Zal bi heman taybetmendiyên xwe ji aliyê helbestvavan ve hatiye bikaranîn. Di van helbestan de Rustemê Zal lehengeke Kurd bi hêz, feraset, wêrekî û cengaweriya xwe bal dikişîne. Em ê ji bo van helbestan jî çend mînakên bidin.

Helbestvanê ku di berhemên xwe de zêdetir cih daye Rustemê Zal, Cegerxwîn e. Cegerxwîn di helbestên xwe de Rustemê Zal wek şêr û cengawerê mezin ê Kurdan dibîne. Di vê helbestê de Cegerxwîn ji ber girîngî û mezinayiya Rustemê bi navê wî sond dixwîne:

Sonda me şax û kulahê Rustem

Yan em te bigrin, yan tev biçin em

Ji ser xwe rakin derd û kul û xem (Cegerxwîn, 2014: 17)

¹¹ Beytên di nava kevanekê de wergera Kadri Yıldırım in. Yên din ên Hacî Qadirê Koyî bixwe ne.

Cegerxwîn, nemaze helbestên xwe yên ku bi hestên welatparezî hatine nivîsîn de navê Rustemê Zal bi lêv dike. Di helbesta bi navê “Hey Qehreman Milletê Kurd” de ev rêz di dawiya her çarînê de tê dubare kirin:

Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î

Îro tu di gundê beg û axa de felah î (Cegerxwîn, 2014: 19-20-21)

Di van beytan de jî Cegerxwîn li dora qehremaniya Rustemê Zal, kevanê wî ya navdar dixê bîra xwendevanan:

Du Bîrhên te jî kevanê Rustemê Zal

Du zulfên te jî tîrên qehremanî (Cegerxwîn, 2014: 53)

Helbestek ku Cegerxwîn jî bo pesndayîn û şîretkirina ciwanên Kurd nivîsandiye, cardin navê Rustemê Zal dihewîne:

Te digo sera û paytextê Şehbal

Xwe lê dibênim Rustem kurê Zal (Cegerxwîn, 2014: 124)

Di vê helbestê de Cegerxwîn cardin şîretan li gelê xwe dike:

Bibin yek ey millet çine kurmanç û lor û gor

Dest bidin şûrê Rustem û Guhreş û Şêrgoh (Cegerxwîn, 2014: 142)

Di vê helbesta ku paşê wek stran jî hatiye gotin de wiha dibêje:

Lo lo pismamo zanim xweşmêr î

Pismamê Rustem yan Êzdîn Şêr î (Cegerxwîn, 2014: 174)

Îcar navê Rustem û Îsfendiyar bi hev re derbas dibe:

Pîşî bi remz û nazîna ceng bû bi kulm û bazina,

Paşê bi lav û gazina wek Rustem û Esfendiyar. (Cegerxwîn, 2014: 227)

Cegerxwîn di helbesta xwe ya bi navê *Xondekaranê Kurd* de bi tevê Rustemê Zal, hin lehengên *Şehnameyê* wek Guhderz, Behram, Bîjen jî cih digirin. Em dîsa gurz û şûrê Rustem ê navdar dibînin:

Were Rustem kurê Zalê kurê Sam

Bi destê xwe tu bigre gurzê hengam

Digel tîr û kevan û şûr û mertal

Bikuj dijmin ji bo me ey kurê Zal

(...)

We her çaran biwartin not û yek sal

Bi şahanî weke Rustem kurê Zal (Cegerxwîn, 2011: 13,15)

Di helbesta bi navê *Şahanê Erdelan* de em dîsa di çend beytan de navê Rustemê Zal dibînin:

Were şah Rustemê çalak û serdest

Binêr kurden te tev de bûne bindest

(...)

Were Axûr kurê Rustem ciwan î

Şehinşah î li ser textê cihan î

(...)

Were şah Rustemê lawê Cihangîr

Li ser textê cihan rûne tu xweş mîr (Cegerxwîn, 2011: 31)

Di vê helbestê de jî navê Rustem nayê gotin lê bi Zal û Bêjenê (Bîjen), Rustem hatiye bi bîr xistin:

Kemer bavê milê xwe lawê Zalê

Tu me derxe wekî Bêjenê ji çalê (Cegerxwîn, 2011: 48)

Wek Cegerxwîn helbestvanên heman serdemê jî, Rustemê Zal bi xisletên wî yên wek mêrxasî, pehlewani û qeweta bêdawî di helbestên xwe de bi cih kirine:

Ruhnîya xizan û sêwî ruhniya ezman û çeng

Ruhniya polad û Ristem ruhniya çavan û reng (Bedir-Xan, 2012a: 67)

Di van helbestan de jî Rustemê Zal pehlewani Kurd e:

Ristem ji me ye û Şah Nadir

Siltan Selahadinê denggîr (Bedîrxan, 1998: 14)

Helbestvanên ku di kovara *Hawarê* de helbestên xwe weşandine, bi heman wesfên Rustemê Zal di helbestên cih danê:

Ev Ristemê zemanî, Behramê wextê me bû

Ji çar mehên buharê tirqan digel wî şer bû (Cîweleq, 2012: 364)

Helbestvaneke bi navê Ferîdun di helbesta xwe ya di *Hawarê* de, Rustemê Zal bi tevê gelek kesên Îranî re -Îrec, Menûçehr, Keykawus, Xusrew- vedibêje:

Ka Rostemê kurd û kanî Çopîn

Ka Nîlûferê egît û Gurgîn (Ferîdun, 2012: 391)

Dîsa di helbestek *Hawarê* de Rustem wek sembola mêrxasî û şervaniyê hatiye dîtin:

Roja cengê em tev mêr in şagirtên Rostem

Serbestî doza me ye heroj û her dem (Namî, 2012: 679)

Ristem bi pehlewaniya xwe ya bêhempa ji bo Kurdan wek mîsal hatiye nîşan dan:

Derbê paşî ê me ye wek Ristemê kurd pehlewani

Sed sipas bo lawê kurdan paşê rastî diçne Faw (Botî, 2012: 860)

Osman Sebrî di helbesta xwe ya bi navê “*Xortê Hêja*” de wesfên ciwanên Kurd rêz dike û pêşniyaran li ciwanan dike. Ji bo “*xortê hêja*” Rustemê Zal wek model nîşan dide:

Ez qenc dizanim, tu ne qels î, xurt û çalak î

Bê west dikarî barê me yê ketî, tu rakî.

Tenê, tu divê bê dudilî derkevî meydan

Heya bikari wekî Ristem, bibî xwedî şan. (Sebrî, 2004: 36)

Bi heman awayê û wateyê di helbesteke din de Osman Sebrî dîsa wek Rustemê wek nîşana hêz û qudretê nîşan dide:

Heke wa nebî, çawan dikarin bêjin em mêr in?

Daketiyên Med, çêliyên Ristem, Guhderzê şer in. (Sebrî, 2004: 86)

Wek Ristemê Zal nayê girêdan bi kernendan

Nayê bîra wî ka berî çendekê çî mer bû. (Sebrî, 2004: 115)

Di van helbestan de Rustemê Zal, Kurd e û helbestvan dixwaze bi qudreta Rustem qudreta gelê xwe nîşan bide:

Îro me serî danîye bê rûmet û çavpehn,

Bi me nakeve em pismamê Ristemê Zal in. (Sebrî, 2004: 42)

3.2. DÎ EDEBÎYATA KURDÎ YA GELERÎ DE RUSTEM

Edebiyata Kurdî ya devkî qadekî gelek berfireh digire nava xwe. Di çanda gelêrî ya Kurdan de cihê efsane, destan, çîrok, stran û hwd. girîng e. Ev çanda vegotinê, ji serdemên berê heta vê rojê bi çandên cîran re di nava danûstandinê de ye: di serî de jî bi çanda Îranê re. Di çand û edebiyata van her du gelên cîran de bandora çanda qedîm ya Med û Pers îrojî bi hêsanî em dikarin bibînin. Heke em wek mînak hêmanekî hevpar bigerin, bêguman Rustemê Zal li ber çavan e.

Hafizeya civakî ji bo hin gelên wek Kurdan, bi rêya metnên nivîskî nayê neql kirin (Tek, 2018: 164). Ji bo van gelan çanda devkî rêya qeyd kirin û neql kirina hafizeya kolektîv û dîrokî ye. Belkî dewlemendbûna çanda devkî, bi kêmasiya dokumentên nivîskî re girêdayî ye. Hebûn û wendanebûna van gelan ancax bi çanda devkî, bi rêya neqilkirina çanda devkî pêk tê. Ji ber vê jî wateya çanda devkî û edebiyata gelerî ji bo van gelan ji edebiyatê zêdetir e.

Metnên ewilîn en gihîştîne ber destê me yê edebiyata Kurdî bi tîpên Erebi-Farisî hatine nivîsîn, ji ber vê ev edebiyat demeke dirêj tenê ji bo kesên xwendî û bajariyan bû. Piraniya Kurdan -gundî, koçer, nexwendî- giraniya xwe dane edebiyata devkî (Blau, 2017: 13). Edebiyata klasîk di medreseyan de; edebiyata devkî jî di çol, çiya, deşt û zozanan de ava bû. Çîrok, destan, metelok, stran û hwd. berhemên gelêrî wek xezîneya gel ya hevpar hatine afirandin. Ev berhem ji bi awayekî devkî -bê nivîsîn- neqlê nifşên nû bûne. “Edebiyata devkî” di demên ku hîn xwendin-nivîsîn di nava gel de berbelav nebûye de peyde bûye û edebiyata gelêrî ye ango nivîskar-afirînerê wî ne dîyar e.

Di berhemên edebî yê pala xwe dane bûyeran ên wek destan, mesnewî, roman, çîrok û şano de; lehengeke sereke heye ku bûyer li derdora wî saz dibin û bingeha berhemê ew kes e (Kaplan, 2016: 9). Rustemê Zal ji van kesan yek e ku di edebiyata

devkî ya Kurdî de -bi piranî di destanan de- serleheng e, ji bûyînê hetanî mirinê jiyana wî gav bi gav dibe mijara berheman. Di edebiyata Kurdî de destan, yek ji hêmanên bingehîn ya çanda devkî ye. Rustemê Zal, di edebiyata Kurdî ya devkî de ji lehengeke mîtolojîk zêdetir taybetmendiyên lehengên destanan nîşan dide. Çîrokên derbarê Rustemê Zal, bi gelemperî di forma destanan de ne, lê ev destan di nava xwe de hêmanên mîtolojîk jî dihewînin.

Destanên Kurdan de bi gelemperî mijarên derdikevin pêş ev in: cengawerî, berxwedan, bêbextî, buxtan, fidakarî, dilsozî (Çolemergi, 2012: 316). Destanên Rustemê Zal, destanên cengawerîyê ne; lê di van destanan de berxwedan, bêbextî, dilsozîyê jî em dikarin bibînin. Destan û çîrokên Rustemê Zal ên di edebiyata Kurdî ya devkî de, bi gelek sembolen dewlemend ên dîrokî, mîtolojîk, çandî, edebî hatine nexşandin.

Têgeha “dîrok”ê bi bibîranîn û bibîrxistinê ve girêdayî ye. Qada dîrokê bi tenê ji belgeyên fermî ava nabe; xebatên li ser hefizeya kolektîv û bîranîn jî “dîroka ne-fermî” ronî dikin (Tek, 2018: 145). Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin lehengên destanan jî di hafîzeyê kolektîv a gel de perçeyek ji “dîroka ne-fermî” ne. Rewşa Rustemê Zal li van fikran re lihevhatî ye. Rustemê Zal, di Şehnameyê de jî di destan û çîrokên gelerî yên Kurdî de jî, di nava şeran de -ev şer li gorî agahiyên dîrokî şerên rastî ne- bi fermandar û padîşahan re ye. Rustemê Zal, li ser sînora fiktîv û rastîyê de sekiniye. Di hefizeya kolektîf û hişmendiya gel de lehengeke rastî, hêdî hêdî bûye lehengeke fiktîf ya çanda devkî û edebiyata gelerî. Gelên wek Kurdan çand, dîrok û çîrokên xwe bi awayekî devkî saz dikin. Ji ber vê lehengên destanan ji aliyê dîroka gelan ve jî xwediyê mîsyonekî girîng in.

Christine Allison, di lêkolîna bi navê “Kurdish Oral Literature”ê de tîne bîra me; ji ber bandora çanda Ereba, Faris û Tirkan û ji ber ku Kurd di welatên xwe de bi Ermenîyan, Tirkmenan, Xiristiyan ên Aramî diaxivin û Cihûyan re di nava hev de jiyane, çîrokên Kurdî ji bandorên cîranan nehatiye îzole kirin (Alexie, 2017: 132). Di berhemên edebiyata devkî ya Kurdî de hin bûyer, leheng û hêman bi çandên cîran re hevpar in.

Lehengeke wek Rustemê Zal zêde hatiye efsaneyîkirin, ji bo gelên Hînt-Îranî bûye temsîlkarê nîrxên erênî, Rustemê Zal lehengê gelêrî ye ku li dijberî êrîşên Ereban gelên

Hînt-Îranî parastiye (Cizîrî, 2017: 356). Rustemê Zal, lehengekî ji mîtolojiya Îranî ye û îro di edebiyata Kurdî de jî kesayetekî navdar e. Jêdera çîroka Rustem, vebêjeyên devkî ne. Lê ketiye naveroka berhemên nivîskî jî. Rustem di edebiyata Kurdî de zêdetir wek çîrokên gelêrî û bi awayekî devkî belav bûye. Dengbêj û çîrokbêj stranên li ser Rustem, çîrokên li ser Rustem bi rêya jîberkirinê neqlê nifşên nû kirine.

Kurd gelek şaxên çîroka Rustemê Zal û pehlewana dizanin, cenglemeyên¹² dirêj li ser wan dibêjin, ku nav û dengê wan di nava gel de gelekî belavbûyî û hezkirî ye ku şaxên Rustemê Zal di nava Kurdan de bi navê “Cengleme” yan jî “Rustemî” tê zanîn (Celîl & Celîl, 2013: 21). Di nava gelê Kurd de efsane li ser Rustemê Zal pirr in, li ser hêz û gurzê Rustem, li ser mêranî û qêrîna Rustem gelek tişt hatine gotin (Cizîrî, 1996: 94) Di civat û dîwanan de serpêhatiyên Rustemê Zal û malbata wî di şev û rojên dirêj de dihatin gotin. Kesê ku vê çîrokê ji ber ve bêje payeyekî bilind bi dest dixist. Serencama Rustem carinan ji bûyîna wî heta mirina wî di yek çîrokê de dihat gotin. Lê gelemperî her bûyerê sereke wek çîrokekî serbixwe tê vegotin. Di van çîrokan de mekan Îran be û serdema şahên Îranê be jî, Rustemê Zal teqez Kurd e. Jixwe destanên mêrxasiyê wek Memê Alan, Xanê Lepzêrîn, Kerr û Kulik nava Kurdan de zêde tê hezkirin û ecibandin.

Gel wisa bawer dike ku Rustemê Zal Kurd bûye wekî carinan zarbêj navê heft kal û bavên wî wiha rêz dikin: Rustemê Zal, Zalê Dal, Dalê Kam, Kamê Sam, Samê Narîman, Narîmanê Qereman (Celîl & Celîl, 2013: 21). Li ser ciyê Rustemê Zal yê di çanda gelêrî ya Kurdî de û nêrîna Kurdan ya li Rustemê Zal Şerefxan Cizîrî wiha dibêje:

Li Nisêbînê li gundê Xirbezilê kalekî kurd wuha behsa Rustemê Zal dikir; heft berberan bi hev re porê Rustem diqusandin, lê wan hevdû nedidîtîn! Serê Rustemê Zal pirr mezin bû û dema ku Rustem mir heft kerî pez bi hev re di serê wî de cih digirtin... Ew aliyê meselê yê mîtolojî ne. Di rastiya xwe de Rustemê Zal rast e û dîrokî ye.. (Cizîrî, 1996: 94)

Di vê beşê de em ji edebiyata devkî ya Kurdî çend mînakên çîroka Rustemê Zal bidin. Ji bo vê em ji çend berhemên ku çîrokên gelêrî berhev kirine û derbasê nivîsê kirine havildar bibin. Yek ji wan “*Kayıp Dîwan*” a Muhsîn Kızılkaya ye. Kızılkaya “Destana Kela Dimdimê”, “Çîroka Rustemê Zal”, “Strana Sînem Xan”ê ji devê dengbêjekî neql dike. Ya duyem “*Destana Rustemê Zal*” ji aliyê Nezîr Ocek ve ji

¹² Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di berhema xwe ya bi navê *Zargotina Kurda* de ji bo çîrokên qehremanî/epîk/hemasî vê peyvê bi kar anîne.

çîrokbêj Meazê Reşanî hatiye berhev kirin. Ya sêyem pirtûka bi navê “*Zêrka Zêra*” ye. Di vê berhemê de amadekar Necat Keskin, ji herema Mêrdînê mînakên cureyên edebiyata gelêrî pêşkêşê me dike. Ya çarem çîrokek gelêrî ji berhema Hecîyê Cindî ya bi navê *Folklor Kurmancîyê* ku têde mînakên zargotina Kurdî berhev kiriye. Ev çîrok di pirtûkê de bi serenava “Rûdevê (Şaxek ji Rostemê Zal)” cih digire. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, di “*Zargotina Kurda I, II*” de cih dane pênc tayên ji êposa Rustemê Zal. Ev pênc çîrok di berhemê de bi van serenavan cih digirin: Cangîr-pelewan, Zewaca Rostem, Qeremanê Qetil, Bêcan-pelewan, Sebxî Xurêsan. Em ê cih bidin van çîrokan jî.

Di *Kayıp Dîwana* Muhsin Kızılkaya de dengbêj Abdulkadîr çîrokekî Rustemê Zal, bi serenava “Şehname Rustemê Zal” vedibêjê. Ev dengbêj ji herema Colemêrgê ye û ev çîrok bi devoka Behdînanî ye. Bûyera li vir, çîroka Rustem û xelaskirina Bîjenê ji bîrê ye. Ev çîrok di *Şehnameyê* de jî bi heman awayê cih digire. Kes, dem, cih û bûyera her du çîrokan ji xeynî çend detayên hûrik wekhev in:

Zemanê Rustemê Zal, Keyxusrew Paşa, Paşa ê Îranê bû.

Rustemê Zal, xweşmêr û serbilindê cihê Îranê bû. (Kızılkaya, 2001: 154).

Wek Şehnameyê Rustem dîsa pehlewaneke navdar e, li welatê Îranê ne û serdema hikumdariya Keyhusrew e. Lehengên sereke yên çîroka heman in. Gelek motifên her du çîrokan jî wek hev in. Bîjen û Menîceya keça serwerê Turanê Efrasiyab dil dikevin hevdu. Efrasiyab, Bîjenê di bîrê de derdest dike. Rustemê Zal, hem Bîjenê ji bîrê xelas dike hem şer li Turanê vedike û Turaniyan têk dibe. Dîsa şerê navbera Îran-Turanê derdikeve pêş. Rustem dîsa bi tena serê xwe artêşa Turanê têk dibe. Di vê destanê de gelek pesnê Rustem tê dayîn:

Rustemê Zal kete nav Tûraniyan

Navî li xwe dan got:

Ez Rustem im Rustemê Zal im

Ez dê wî hêlim yê ji bavê xwe nevekeftî

Ez dê wî hêlim yê ji diya xwe nebûy

Ez dê wî hêlim yê ne hatiye ser dinyayê

Tovê hewe dê birînim

Nifşê hewe dê qelînim?

Rustemê Zal destê xwe da siwarên hespan

Destê xwe da siwarên extan

Ser milên xwe de avêtin

Bû reqêna nalên hespan, her wekû şeqşeqa berên aşan,

Rustem kete nava wan Tûraniyan her wekû gavanek Dizeyan yê bê mirwet,
kevîte nav garanê çêl û gan, dete ber fidkan

Ewî ew Tûranî we dane ber gurz û rîman (Kızılkaya, 2001: 177).

Em lehengên çîroka “Şehname Rustemê Zal” û *Şehnameya* Firdewsî bidin ber hev.¹³

1. Bêjen- Bîjen: Li gorî vê çîrokê xwarziyê Rustem e. Lê di *Şehnameyê* de ev agahî cih nagire.
2. Menîca- Menîce: Keça serwerê Turanê û dildarê Bêjenê ye.
3. Elfisyabê Bapîşey- Efrasiyab: Qiralê Turanê.
4. Hejale- Gûrgîn: Hevrêê Bêjenê.
5. Gêwê Guhderzê- Gîw: Bavê Bêjenê.
6. Rudahbe: Li gorî vê çîrokê diya Bêjenê û xwişka Rustemê Zal e. Ev yek di *Şehnameyê* de cih nagire. Li gorî *Şehnameyê* Rûdabe diya Rustemê Zal e.
7. Rexşa Belek- Rexş: Hespa Rustemê.

Du çîrokên Rustemê Zal ên gelêrî ji aliyê Necat Keskin û Fikret Koşar ve hatine berhevkirin û di heman pirtûkê de hatine weşandin. Ev her du çîrok ji navçeya Qoserê ya li ser Mêrdînê hatine berhevkirin. Ev her du çîrok, ji cureyên edebiyata gelêrî wek “hikaye” hatine binavkirin. Çîroka yekem dirêjtir e:

“Zal lawê Zêrîn bû. Zêrîn şêrîne ber dilê Kêf Xusranê Mubarek bû. Li Îranê. Ewana betil bûn, ji ewil de betil bûn, yanî pêlewan bûn (Keskin, 2019: 31).”

Di vê çîrokê de Rustem kurê Zal e, Zal kurê Zêrîn e. Welatê Îranê ye serdema hikumdariya “Kêf Xusranê Mubarek” e. “Zêrîn” di *Şehnameyê* de ji ber porên spî bernavka Zalê ye, li vir wek navê bavê wî ye. Çîrok bi mirina Zêrînê dest pê dike. Zal ji bo parastina gora bavê xwe bi yekî re şer dike. Dûre pê dihesa ew kes keça bi navê Ra’ol e, pê re dizewice, Rustem tê dinê. Rustem hin çend rojî ye, ji ber girîna wî derdor

¹³ Navê pêşiyê hatiye nivîsîn yên “Şahname Rustemê Zal” e, ya duyem ê *Şehnameya* Firdewsî ye.

tev elaman dikin. Kêf Xusra, ji Zalê re dibêje vê zaroka bibe bavêje newalê. Zal Rustemê davêje li dilê wî pê dişewite roja dinê diçe tîne. Ev sêrpêhatî di *Şehnameyê* de cih nagire. Du birayên Rustem hene: Bêcen û Hejîro. Her dem pê re ne û alikariya wî dikin. Ev yek jî di *Şehnameyê* de tune ye. Rexşê Belek di vê çîrokê de jî cih dihire lê Rustem îcar hespê bi peran dikire. Rustem ji bo şer gurza kalê xwe Zêrînê digire.

Şerê navbera Îran û Turanê di vê çîrokê de jî derdikeve pêşberê me. Li gorî çîrokê Rustemê Zal misilman e, Turanî fille ne. Rustem li pey hespa xwe diçe welatê Turanê. Li wir bi keça qrala Turanê re dizewice û kurê wî Zohrab tê dinê. Lê haya Rustem ji wî tune ye. Di şerê Îranê û Turanê de Zohrab û Rustem tîne hemberê hev, Zohrab bi destê Rustem tê kuştin. Ev bûyer bi heman awayê di *Şehnameyê* de jî heye. Dawiya çîrokê mesele tê ser kurê Rustemê Zal ya din Sîxûçê Gerdenzerî. Rustem ji bo heyfa kurê xwe Gêwê dîkujê.

Çîroka din ya li heman pirtûkê ji ya din kintir e:

“Dibê Rustemê Zal hebû wext’kê. Te dî behsa wî heye. Rustemê Zal pehlîwanekî gelik şeçîh bû dibêjin. Dibê roj’kî karê wî jî seyd bû, diçû seydê. (Keskin, 2019: 54).”

Di vê çîrokê de dem û cih nediyar e. Rustem li seydê dibe şev, xwe dispêre şikeftêkî. Sibehê dibîne ku ew şikefta tê de serê mirovekî ye. Eceb dimîne, Zal lê eyan dike. Ew serê kalê wî yê rehmetî ye. Rustem ji bo heyfa kalê xwe kujerê wî “Silêmanê Sindî” dîkujê. Ev çîrok bi tu awayê di *Şehnameyê* de cih nagire. Hêmana ku navbera *Şehname* û vê çîrokê de hevpar tenê gurza kalê Rustem e ku Rustem bi wî gurzê şer dike.

Nezîr Ocek ji çîrokbêj Meazê Reşanî “Destana Rustemê Zal” berhev kiriye. Ev destan ji şeş tayan pêk tê. Tayê yekemîn:

“Carek ji caran rehmet li da û bavê guhdaran.

Li welatê Îranê zilamekî bi navê Sam hebû, Sam rojekê radibe dest tavêje tîr û kevanê xwe berê xwe dide çiyê û derdikeve rav û nêçîra xezal û pezkûviyan (Ocek, 2019: 11).”

Çîrok bi Samê kalê Rustem dest pê dike. Çîroka vê beşê gelek dişibe ya *Şehnameyê*. Hêmanên wek Rexşê Belek, gurza kalê Rustemê, şerê navbera Îran û

Turanê dîsa derdikevin pêşiya me. Şerê Rustemê Zal û şahê Turanê Ewlesiyabê Ebapêş dûr û dirêj hatiye vegotin.

Tayê duyem:

“Carekê ji caran Rehmet li Da û Bavê Guhdaran

Rojeke Şahê Îranê û Zal bi hev re dikevîne nava sihetê, behsa tûraniyan dikin.

(Ocek, 2019: 35).”

Di vê çîrokê de mijara sereke şerê Îran û Turanê ye. Rustem îcar bi dêwên efsaneyî re şer dike.

Tayê sêyem:

Li welatê Îranê şahekî bi navê Keykawûs hebû. Temenê şahî pê de çûbû û pîr bûbû. Keykawûs Şah di wî temenê xwe yê pîrbûniyê de jineke ciwan ji xwe re tîne. Şahî bi tenê kurek ji jina xwe ya mezin hebû. Navê kure wî Siyawîş bû. (Ocek, 2019: 45)

Ev jî çîroka navbera Siyawîş-Ewlesiyab-Rustemê Zal e. Wek çîroka *Şehnameyê* Siyawîş bi bêbextiya Ewlesiyab tê kuştin û Rustem heyfa wî ji Turaniyan digire.

Tayê çarem:

“Rojekî Şahê Îranê cewabekê ji Rustemî re dişîne û dibêje, divê tu zû bê paytexta Îranê (Ocek, 2019: 53).”

Li gor vê çîrokê du kurê Rustem hene: Birzo û Feramez. Birzo li Esfahanê marê ku dest daye ser ava bajarê dîkuje. Ev mar hefteyê carek keçeke ciwan dîkuje û dixwe. Ev bûyer dişibe bûyera “Dehaq”ê ya li *Şehnameyê*. Birzo, Têmûrê kurê xwe ya ji keça şahê Esfahanê ji destê dijminan vedîşere. Têmûr mezin dibe li pey bav û kalên xwe dikeve diçe welatê wan. Rustemê Zal û neviyê wî Têmûr bi nezanî bi hev re şereke dijwar dikin. Di *Şehnameyê* de ev bûyer di navbera Rustemê Zal û kurê wî Sohrabê de derbas dibe. Lê di vê çîrokê de Rustem hîn Têmûrê nekuştîye pê dihesse ku ew kurê Birzo ye.

Tayê pêncem:

“Carekê ji caran rehmet li da û bavê guhdaran

Rêjekê Birzoyê kurê Rustemê Zal li hespê xwe siwar dibe, berê xwe dide çiyê û diçe rav û nêçîra xezal û pezkoviyan (Ocek, 2019: 65).”

Ev çîroka Birzoyê kurê Rustemê Zal e ku di *Şehnameyê* de cih nagire. Lê hêmanên bi *Şehnameyê* re hevpar wek Rexşê Belek, pehlewaniya Rustem, şerê Rustem û dêw hene.

Tayê şeşem:

“Carek ji caran rehmî li da û bavên guhdaran

Li welatê Îranê şahek hebû, Şahî jinek hebû navê jina wî Kêfxwesre bû. Ew maweyekî dirêj bê zarok dimînin (Ocek, 2019: 73).”

Di vê çîrokê de -bi tevê hin cudatiyan- çîroka Rustemê Zal û Esfendiyarê kurê şahê Îranê ya di *Şehnameyê* de jî cih digire hatiye vegotin. Xala din ya bi *Şehnameyê* re hevpar mirina Rustemê Zal e. Rustem, bi destê birayê xwe di çalê de tê kuştin.

Heciyê Cindî, di *Folklorê Kurmanciyê* de cih daye çîrokekî gelêrî ya Rustemê Zal. Çîrok bi Rûdeveyê keça Selmîyanî Sindî dest pê dike. Ev leheng, di *Şehnameyê* de wek Rûdabeya keça Mihrabê cih digire. Di *Şehnameyê* de Zal, diçû welatê Rûdabeyê lê di vê çîrokê de Rûdeve diçe welatê Zal. Rûdeve ji bavê xwe dixeyîde, cil û bergê zilaman li xwe dike û ber bi Zabilê ve bi rê dikeve. Rûdeve, navûdengê Zalê pehlewaniyê bîhîstibû. Rûdeve di dilê xwe de dibêje: *“ Ez ê herim, go, pelewaneke xurt e, go, ez ê têkevim, herime meydana wî. Eger destê wî ser destê min ra bû, ez ê bistînim, herke ne ser destê min ra bû, ez ê lêxim bikujim (Cindî, 2016: 208).”*

Zal û Rûdeve li meydana şer derketin pêşberî hev. Zal nezaniyê ku yê li hemberî wî jin e. Demeke dirêj hev dibin û tînin, dawiyê Zal bi ser dikeve. Zal piştrê pê dihesa ku kesê wek pehlewaniyê pê re şer kiriye jin e. Rûdeve wek soza dila xwe Zalê distîne. *“Neh meh, neh roj, neh seher, neh deqe temam bûn û Rûdeve welidî; ket ber welidandinê û nikaribû biwelidîya (Cindî, 2016: 209).”* Navê zarokê datinî “Rostem”. Di vê çîrokê de jî bûyîna Rustem wek *Şehnameyê* bi awayekî derasayî pêk tê. Motifa ducanî û welidîna bi zehmet wek *Şehnameyê* di vê çîrokê de jî cih digire. Rustem hîn di zarokatiya xwe de yekê laşgir û bi hêz e.

Ji aliyê din ve Selmîyanî Sindî ji ber xwe ve dibêje: *“Çûkekê li mala Zal wê rabe, go, wê qesasê serê min be, ecelê min wê bi destê wî bive, navê wî jî Rostem e. (...) Ez ê herim ber bi Zabilê, mala Zalê, herim belkî bikaribim Rostem bikujim, xwe jê xilaz bikim (Cindî, 2016: 209)”* Selmîyanî Sindî bi niyeta kuştina Rustem, bi ser Zabilê ve

diçe. Êrîşê Zal dike. Zal, di destê Selmîyanî Sindî de derdest dibe. Selmîyanî Sindî bi şerta ku ew Rustemê bişîne meydana şer, Zalê berdide. Lê Zal, qêmîşê Rustem nabe ku hîn di van salan wî yê biçûk de Rustamê bişîne şer. Çend sal diborin, Zal meseleyê ji Rustem re vedibêje.

Rustem bi tevê Bêjengê xwarziyê xwe bi rê dikeve da ku tola bavê xwe bistîne. Rustem û Bêjeng di rê de rast li gundekî têne ku gundî ji ber zordestiya Selmîyanî Sindî neçar mane. Rustem hem ji bo heyfa bavê xwe hilîne hem jî ji bo gundiyan ji destê zilmê xelas bike, êrîşê Selmîyanî Sindî dike û wî dikuje. Bêjeng jî dil dikeve neviyê Selmîyanî Sindî û bi wê re dizewice. Rustem bi serfirazî bi tevê Bêjeng û hezkiriyaya wî vedigere welatê bav û kalên xwe.

Di vê çîrokê de çend motîfên bi *Şehnameyê* re hevpar hene. Di *Şehnameyê* de Hespa Rustemê Zal Rexş e, lê di vê çîrokê de navê hespê “Eşqerîdêmzer” e. Ew pêşiyê hespa Zal e, dema ku Rustem diçe şer bavê wî hespa xwe dide Rustem. Motifa “gurz”ê ku di vebêjeyên di derbarê Rustemê Zal de pirî caran tê bikaranîn di vê çîrokê de jî cih digire. Cardin motîfa “şûrê di erdê de çikbûyî” di vê çîrokê de jî derdikeve pêşiya me. Di vê çîrokê de Rustem şûrê kalikê xwe yê ku tu kes nikare ji erdê derdixe, radike.

Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di berhema xwe ya bi navê *Zargotina Kurda* ya ku mînakên zargotina Kurdan tê de berhevkirine de li ser Rustemê Zal û malbata wî de jî çend mînakan dane. Ev çîrok di berhemê de bi serenava “*R’ostemî û Cengleme*” hatine dayîn. Wiha dest pê dike:

Go, hebû R’ostemê Zal. R’ostem diçû diger’îya, R’ojkê sîyar bû çû nêç’îrê, k’êfa nêç’îrê da ser Rostem. R’ostem çû nêç’îrê, ze’f ger’ya h’etaki nîvro, aciz bû, kanîk k’ete pêşîya R’ostem, R’ostem ser kanîyê peya bû. R’ostem, R’exşê wîne qudretê hatibû, R’ostem wekî peya dibû, çîqa r’aba hazir ba, dikire gazî: “R’exşê Belek”, R’exşê Belek dihat ber disekinî. Erê... (Celîl & Celîl, 2013: 110).

Di vê çîrokê de Rustemê Zal bi tevê hespa xwe Rexşê Belek li nêçîrêye. Rexşê Belek ji Rustemê direve û Rustem li pey diçe. Rexşê Belek xwe digihîne bajarê Zabilê, Rustem jî li pêy diçe. Rustem, li der û dorê dipirse çiyê Rexşê hîn dibe ku Rexşê li hewşa “Mesîh’anê A’dil” ku ji begên wê bajarê yek e girêdayîye. Mesîh’an û maiyeta wî ji ber hatina Rustemê Zal gelek kêfxweş dibin û dixwazin diyariyên biqîmet bidinê.

Dawî biryarê didin ku keça Mesîh'anê bidin Rustemê Zal, wan bi hev re bizewicînin. Rustem bi "Fir'eng Şahabî" ya keça beg re dizewice, ew her du çil şevan bi hev re dimînin. Lê êdî dema çûyîna Rustem hatiye, divê ew vegere welatê xwe. Rustem dema xatir ji wir dixwazê bazbenda xwe wek nîşan ji Fir'eng Şahabî re dihêle da ku heke zarokê wan çêbû, bidê. Ev çîrok heta vir gelek dişibe çîroka li *Şehnameya Firdewsî*. Di *Şehnameyê* de Rustemê Zal bi heman awayê diçe Semenganê, li wir bi Tehmîneya keça Mihrab re dizewice. Rustem dema ji Semenganêvedigere û ji bo nîşane bimine bazbenda xwe dide Tehmîneyê. Ji vê zewacê Sohrab tê dinê.

Li gorî çîrokê Rustem pêş de cardin li pey Rexşa Belek çûye bajarekî biyanî, li wir bi yekî re zewiciye, ji vê zewacê kurê wî "Zohrab" hatiye dinê. Zohrab gelek pehewanên Îranê kuştiye, di qada cengê de zora şervanên Îranê biriye. Ji ber vê yekê padişahê Îranê "K'ey Xosraw" dibêje dê cardin wek cara berê, kurê Rustemê Zal ji keça begê Zabilê çê be û wek Zohrab li wan were xezebê. Rustem ji ber van raman û xemên padişah dixeyîde, welatê xwe terk dike, diçe Hindistanê. Lê li vê welatê nû navê xwe ya rastî aşkere nake.

Ji aliyê din ve li Zabilê ji Rustemê Zal re kureke bûye. Navê wî danîne "Cangîr". Ew jî wek bavê xwe xwediyê hêzekî bêhempa ye. Dema ku Cangîr çardeh-panzdeh salî ye pehewanên Turanê ji xeracê bigirin diçin Zabilê. Ev pehewanên Turanî, Cangîrê ji bo dijî Îranê bi wan re şer bike digirin cem xwe. Cangîr ji bo Turaniyan bi Îraniyan re şer dike. Di van şeran de gelek pehewanên Îranê têk dibe, bi ser de "Feremez" ê kurê Rustemê yê din jî bi Cangîr re di meydana pehewanan de şer dike. Cangîr, Feremezê jî bi bin dixê. Lê haya wan ji hev tune ye ku birayê hev in. Zal, di hewarê neviyê xwe Feremezê de tê da ku heyfa wî ji Cangîrê hilîne. Cehd dike Cangîrê bikuje, wê demê de pê dihesin ku Cangîr kurê Rustemê ye.

Cangîr û Feremez bi piştewaniya kalikê xwe Zalê ve diçin Hindistanê. Hetanê xwe digihînin Rustemê Zal, her du birayê pehewan dikevin nava gelek şeran. Dawiyê Rustemê jî digirin, vedigerin welatê xwe.

Ihsan Colemergî, di nivîsa xwe ya li ser destanên Kurdî de, ji bo destana Rustemê Zal, dibêje: "Qeweta derasyî, -li gorî pêdiviya serdemê- bandorekî girîng li destana Rustemê Zal kiriye. Destan zêdetir bi vegotinên mîtolojîk hatiye xemilandin (2012:

318).” Colemergî çavkaniya destanê nabêje, lê beşeke wiha ji destana menzum ya Rustemê Zal neql dike:

“Qirênen Rûstem de;

Kevir ji kendalan diveresin

Jinikên du canî, zarûkên wan ber diçin

Melayîket, pêyên xwe dihilkişîne asûmana

Sîmerx; xwe vedikêşîne, pişta çîya ê Qaf” (Çolemergî, 2012: 318)

Vebêjeyên li ser Rustemê Zal, ewqas berbelav bûne û eleqe dîtine ku hin nivîskar van vebêjeyan ji formên çîrokên gelêrî girtine, di forma romanê de cardin honandine. Ji bo nimûne em dikarin romana Xurşîd Mîrzengî (b. 1954) ya bi navê “*Ristemê Zal*” bidin. Mîrzengî (1999: 6) di pêşgotina romana xwe de dibêje: “ Min ev serûwenên Ristemê Zal, di piçûktiya xwe de, ji Qasimê Mehmed Keyayê Helhelê guhdarî kiribûn û jiber kiribûn. Lê vê dawiyê min hinek serûwenên din jî ji Eliyê mala Bebê guhdarî kirin û ev berhem anî pê.” Nivîskar bixwe jî aniye ziman jêdera vê romanê çavkaniyên çanda devkî ye. Di vê berhemê de, her beş ji çîrokek serbixwe pêk tê. Serenavên çîrokan li gorê rêzê wiha ne: Xofa Kal Zal, Zewaca Ristem, Gewja Ceng û Zal, Gihîştina Ristem ya Rexşê Belek, Çûyîna Ristem ya Nêçîrê, Cenga Ristem û Erzaqê Cadî, Kurê Ristemê Cîhangîr, Qîza Ristem Pîvokê, Hatina Nijdevanan Ji Zîqelayê, Çûyîna Zorav Ji Malê, Bêhişîya Mala Zalê û Soxraf, Apê Gêwê û Siyapûşê Gerdenzêrîn, Siyapûşê Gerdenzêrîn (Mîrzengî, 1999). Bi qasî ku em ji vê berhemê dibînin bûyer, ji dema “Zal”ê bavê Rustem dest pê dike hetanê dema neviyê Rustemê “Siyapûş”ê didome. Lê herçend ev berhem wek “roman” hatibe binavkirin jî em ji bo vê berhemê nikarin bêjin di forma romanên modern de ye. Mîna ku çîrokên gelêrî bi awayekî kronolojîk hatibe rêzêkirin.

Bi heman awayê Edîp Polat jî romanekî bi navê “*Ristemê Zal*” nivîsandiye. Ev xebat formên menzûm û mensûr bi hev re di nava xwe de dihewîne. Polat jî dema berhema xwe honandiye hem ji çavkaniyên nivîskî hem ji çavkaniyên devkî istifade kiriye. Polat aniye ziman: “Me bi tehera romanek dîrokî ev berhem nivîsî, lê belê carna bi pexşenî em lê germ bûn, carna jî me helbest nivîsî.” Nivîskar agahiyên çavkaniyên xwe jî dide. Li gorî ku dibêje çîrokan ji Çîrokbêj Evdilqadirê Cafo -ji Bismilê- gohdarî

kiriye. Lê xeynî vê *Şehnameya* Firdewsî û ji çend berhemên nivîskî jî sûd girtiye (2007, 10).

Berhem, bi mirina Ferîdûnê şahê Îranê dest pê dike. Di dawiyê de jî Rustemê Zal Bîjenê ji zindana Turaniyan rizgar dike û artêşa Turanê têk dibe. Di vê romanê de bûyer, dem, mekan, kesayet bi *Şehnameya* Firdewsî re paralel e.

Em dixwazin wek mînak destaneke epîk ya li ser Rustemê Zal bidin nasîn. Ev destan di tezeke lîsansa bilind de hatiye transkirîbe kirin.¹⁴ Ev destan metneke bi herfên Erebi lê bi zimanê Kurdî ye, di *Şehnameya* Kurdî de cih digire. Nivîskarê vê metnê ne diyar e lê berhevkarê wê Ebdullah Muhammed e û kesê ku vehandiye jî Mela Mistefa Oremarî ye (Çalışır, 2019: 1).

Rustemê Zal, di nava Kurdan de di pozîsyona hêmaneke çandê û dîrokê de ye. Destana Rustemê Zal, bi awayê devkî ji nîfşên neqlê nîfşên nû bûye, bi berhevkirin û qeydkirina berheman jî hetanê îro digihîjin ber destê me. Ayhan Tek (2018: 146) ji bo bîranîn xwe yê guhdarkirina çîroka Rustemê Zal wiha dibêje: “Heta dawiya salên 80î bapîrê min agahiyên xwe yê li ser çanda devkî û dîrokê neqlê me dikir. Yê ‘Rustemê Zal’ û ‘Leyla û Mecnûn’ 2-3 şevan dewam dikir. Lê piştî çûyîna wî ya hacê êdî -ji ber ku ev gotinên derewîn in- efsane û çîrokan venegot.”

Wekî em ji van mînan jî dibînin vebêjeyên Rustemê Zal di zargotina Kurdî de xwediyê cihekî girîng û balkêş e. Destana Rustemê Zal ji her aliyê ve bandoreke mezin li li çanda Kurdan kiriye. Di vê çarçoveyê de Heciyê Cîndî jî di pêşgotina “Şaxêd Êposa Rostemê Zalê Kurdî” de wê yekê wisa vedibêje:

Tiştêkî balkêş e, ku navên ku di evê destanê da derbaz dibin, ji aliyê kurda da gelek hizkirî ne û gelek kurda ew nav li zar û nebiyên xwe kirine, wek: Rostem, Feremez, Birzo, Serzangezar, Frangîz, Tûzo, Aywez, Bêjen (eva navê hespan e jî), Manîçe. Ew mîrxasên di evê berhemê da him bi navê xwe, him jî bi şaxên xwe va bi gelê kurd ra bûne xûn û qinê û gelek cara jî xwe wek kurd dibînin. (...) Destana “Rostemê Zal” bûye serkanîya nemiçiqî bona perwerdekirina nîsleta. Mîrxasên wê Zal, Rostem, Gêvo, Zohrab, Sîyawûş, Bêjen û yê mayîn bûne mîrxasên wek Memê, Qeretajdîn, Sîyabend, Kerr û Kullik, Xanê Çengzêrîn û yê

¹⁴ Ji bo agahiyên berfireh bnr. (Çalışır, 2019).

mayîn. (...)Vêrsiyonên kurdî yê “Rostemê Zal” bi armanc û hêvîyên xwe mînanî destana azirîya “Koroxlî” ne. Ev destan jî bal hemû gelên rohilatê gelekî belabûyî ye û bûye berhemêke here hizkirî. (...) Şaxên “Rostemê Zal” bi sala-zemana di bîra mîlet da mane, timê hatine tezekirinê û “per û baskên” nû jê şîn bûne. Ê niha, weke ku bêy “Dimdim”ê, “Kerr û Kullik”, herweha bêy vê berhemê jî em nikarin destana kurdî ya mêrxasîyê bi tevayî bînine ber çeva. (Cindî, 1977)

Di destan û mesnewiyên serdemên kevn de -bi gelemperî- lehengên xwediyê heman taybetmendiyên cih digirin. Ev kes, bi hin cudatîyên biçûk di berhemên serdemên cuda de jî derdikevin pêşberî me (Kaplan, 2016: 9). Lehengên wek Rustemê Zal ku bi hêz û cengawerîyê tên zanîn, di edebiyata Kurdî de jî di edebiyata cihanê de jî kêr zêde bi hin hêmanên wekhev di berhemên cûr bi cûr de cih digirin.

Bi vî awayî bi rehetî tê dîtîn ku Rustem di nava zargotina Kurdî û çanda gelerî de wekî lehengeke numûne cih digere. Herwisa di nav zimanê rojane de jî em rastê hin referansan tên ku insan ji bo zîrekî, cesaret û wêrekiya xwe taybetiyên Rustemê Zal bikartînin. Yanî Rustemê Zal di nava zimanê rojane de wek unsureke teşbîhê tê bikarînan ku ew jî nîşana wê yekê ye ku wek lehengeke zinde, di tesewwurê de cihê xwe girtiye.

ENCAM

Çîrokên *Şehnameyê* ji aliyê Firdewsî ve, ji gelek çavkaniyên devkî û nivîskî hatibûn berhevkin. Bêguman ev çîrok, ji bo edebiyata Kurdî jî bûne kaniyeke xurt û bikêr. Ihtimaleke mezin Kurdan, bêriya *Şehnameyê* jî hay ji van çîrokan hebûn. Bi tevê vê yekê tê zanîn ku Kurdan hay ji Firdewsî û *Şehnameya* wî jî hebûn. Edebiyata Kurdî, ji çanda dewlemend a Kurdan ya devkî gelek sûd girtiye. Bûyer û mijarên *Şehnameyê* yên ku ji çanda devkî ya Farisî pêk hatine, ji ber çanda hevpar di çanda Kurdî de jî derdikevine pêşberî me. Ji van hêmanan yek jî Rustemê Zal e ku bi pehlewaniyê nav û deng wî belav bûye. Rustemê Zal di *Şehnameyê* de ciheke gelek berfireh digire. Bêguman di belavbûna efsaneya Rustemê Zal de bandora *Şehnameyê* gelek zêde ye.

Ji aliyê din ve di *Şehnameyê* de di derbarê rehên Kurdan de hin agahî hene, ji ber vê yekê *Şehname* ji bo Kurdan xwediyê cihekî taybet e. Her wiha Kurd, ji lehengên *Şehnameyê* Rustemê Zal, Kawayê Hesinkar û hwd. wek Kurd dihesibînin. Ev jî yek ji sedemên eleqe dîtina *Şehnameyê* ye.

Di edebiyata Kurdî de berhemên li derdora Rustemê Zal saz bûne gelek in. Bi taybetî di zargotina Kurdî de efsane, destan û çîrokên Rustemê Zal tîne vegotin û neqlkin. Di *Şehnameya* Kurdî de jî em Rustemê Zal, wek serleheng dikarin bibînin. *Şehnameya* Kurdî, wek *Şehnameya* Firdewsî berhemek yekdemî nîn e, ji aliyê yek kesekî ve nehatiye nivîsîn. Kuliyateke dewlemend e, gelek efsane û destanên çanda Kurdî di vir de hatine komkin. Ji bo edebiyata hemasî mînakê baş e, tê de çîrokên şer û pehlewaniya Rustemê Zal cih digirin. Piraniya van çîrokan gelêrî ne û ev çîrok di gelek xalan de ji *Şehnameya* Firdewsî cudatir in. Ne tenê ji bo çîrokên Rustemê Zal, ji bo mînakên ji çanda Kurdan jî çavkaniyeke rengîn e.

Rustemê Zal, hem li gorî çîroka xwe ya di *Şehnameyê* de hem wekî di edebiyata Kurdî de lehenga edebiyata hemasî ye. Lê ji aliyê din ve çîroka Rustemê Zal hêmanên mîtolojîk jî dihewîne. Ango Rustemê Zal, ji çîrokên mîtolojîk, heta efsane û helbestên epîk di çarçoveyekî gelek berfireh de cih digire. Jixwe mîtosên demên ewilîn gav bi gav cihê xwe dihêle efsaneyan, destanan û çîrokên gelêrî. Rustemê Zal jî wek lehengeke mîtolojîk ava bûye, hêdî hêdî veguheriye di efsane, destan û helbestên epîk hetanê romanê de jî bûye serleheng. Ji ber vê yekê ye ku em di ceşnên edebî yên cur bi cur de dikarin bandora Rustemê Zal bibînin.

Rustemê Zal bi gelek taybetmendiyan xwe û bi rêwîtiya xwe, bi xebatên li ser lehengan -nemaze lehengên mîtolojîk- lihevhatî ye. Teorî û xebatên li ser rêwîtiya lehengên mîtolojîk û efsaneyî kêm zêde çarçoveyeke sabit dide ber me. Xebatên li ser mîtolojiyê yê nûjen bi gelemperî, xwe dispêrin psîkanalîzê. Li gorî van xebatan leheng û bûyerên di çîrokên efsaneyî û mîtolojîk de, xwediyê mîsyoneke derûnî ne. Tiştê ku ev xebat nîşanê me dide ev e: mirov ji serdemên ewilîn heta niha bi rêya vebêjeyên mîtolojîk xem, xeyal, raman, tirs û daxwazên xwe daye der. Rustemê Zal jî hem ji bo Kurdan hem ji bo Farisan bûye ji van hêmanan yek. Rustem, ji jidayikbûna xwe hetanê mirinê di her gavê de bi lehengên derasayî yê cur bi cur re taybetmendiyan hevpar nîşan dide.

Lêkolîner, li ser van taybetiyên hevpar ên lehengên efsaneyî hin teoriyan afirandine. Lord Raglan di xebata xwe de ji bo serpêhatiyên lehengê kevneşopiyê 22 xalên sereke diyar dike. Li gorî Lord Raglan, leheng ji bûyîna xwe heta mirina xwe kêm zêde ji van merheleyan derbas dibe. Em dibînin ku ji vana 11 xal, di çîroka Rustemê Zal de jî xuya dibe. Jixwe Raglan, bi mînakan jî dide xuyan ku her leheng mecbûr nîne yek bi yek ji tevahiya van merheleyan derbas bibe.

Yek ji navdartirîn lêkolînerê li ser rêwîtiya lehengê xebatan kiriye yek jî Joseph Campbell e. Di xebata Campbellê de gav bi gav rêwîtiya lehengê hatiye vekolandin û şablonekî derketiye holê. Campbell, bi nêrîneke psîkanalîtîk mîsyona lehengê daye ber çav. Li gorî nêrînên wî rêwîtiya lehengê çerxa bêsekan a cîhanê sembolîze dike. Rustemê Zal, ji bo gel nîşaneyê hêza bêdawî ye. Ango gelê ku bibe xwediyê lehengên wek Rustem, dibin xwediyê wê hêza bêdawî.

Mircea Eliade, ji bo rola lehengan li ser têgeha “arketîp”ê disekine. Îfade dike ku gel, ancax bi dubarekirina mîtan xwe digihîne heqîqetê û dubarekirina mîtan bi vegotina çîrokên mîtolojîk çêdibe. Bî vegotina çîrokên Rustemê Zal, heqîqet bi dest dikeve. Herçend xwediyê hêmanên derasayî be û derbarê jiyana wî de delîlên tekûz tine be jî, di hişmandiya gel de ew lehengeke rastîn e. Dîroka Rustemê Zal dîroka gelê wî ye. Çîroka wî çiqas zindî bimîne, gel jî ewqas zindî dimîne. Gel bi dubarekirina çîroka Rustemê dixwazê xwe bigihîne dîroka xwe û heqîqetê ku bi vê awayê her dem zindî bimîne. Ji ber vê ye, navê Rustemê Zal ji nava gel qet kêm nabe.

Rustem, ji bo gelê xwe di rola xelaskerê gel de ye. Her dem ji bo xweşiya gelê xwe dixebite, tu car li pey berjewendiyên şexsî nakeve. Rustemê Zal bûye sembola hêza bêdawî.

Di vê xebatê de em li ser rengvedanên lehengê *Şehnameyê* Rustemê Zal yê di edebiyata Kurdî de sekinîn. Wek leheng li rola Rustemê Zal hûr bûn. Hem di helbestên klasîk de hem di çîrokên gelêrî de bi mînakên taybet, em li pey şopa bikaranîna Rustem ketin. Em ji serencama Rustemê Zal bi rê ketin û me teoriyên li ser lehengan li ser çîroka wî tatbîq kir.

Rustemê Zal, di edebiyata klasîk û helbestên Kurdî de wek serleheng û mijara sereke cih nagire. Bi gelemperî bi gurz û şûrê xwe, bi mîrxasî û qeweta xwe wek sembola pehlewaniyê derdikeve pêşberî me. Li gorî van helbestan Rustemê Zal pehlewaneke mizaffer ê Kurd e. Nemaze di helbestên epîk de, Rustemê Zal bi wêrekî û hêza xwe ya bêdawî çavên neyaran tirsandiye. Bi vê erka taybet, ji bo ciwanan wek mînak hatiye nîşandan.

Bereksê edebiyata klasîk, di edebiyata Kurdî ya devkî de Rustemê Zal serleheng e. Di çîrokên mîtolojîk, efsane, destanên epîk û çîrokên gelêrî de Rustemê Zal di rola lehengê xelasker de derdikeve pêş. Di van çîrokan de Rustem, ne ji bo xwe ji bo gelê xwe, welatê xwe, şahê xwe şer dike. Bi tevê Rustem bavê wî, kalê wî, kurên wî, neviyên wî jî wek Rustem pehlewaniyê navdar û payebilind in. Carinan di nava van çîrokan de serpêhatiyên van kesan jî tê vegotin. Li gorî çanda devkî ya Kurdan Rustemê Zal, Kurd e û têkoşîna wî ji bo gelê wî ye.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Adak, A. (2019a). “Mît û Efsane Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk De: Tema, Jêder û Bikaranîn”. *Kürt Tarihi*, Sayı 35, 25-35.
- Adak, A. (2019b). *Teşeyên Nezmê*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Alexie, S. (2017). Oral Literature of Iranian Languages. Keskin, Abdullah (ed.), *Kürt Edebiyatı*. Heval Bucak (çev.). (131-134). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Aydınlu, S. (2012). *Firdevsi'nin Şehname'sinde Kürtler*. Erkan Çardakçı (çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bakır, A ve A. Altıngök (2011). “Klasik ve Çağdaş Kaynaklar Işığında Turan-İran Kavramı ve Tarihsel Coğrafyası”. *Tarih İncelemeleri Dergisi*, Sayı 2, 361-422.
- Bedir-Xan, C. A. (2012b). “Sultan Selaheddînê Eyyûbî”. *Hawar (Hemû Hejmar)*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Bedîrxan, K. A. (1998). *Kulîlkên Ezêb*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bedir-Xan, Q. A. (2012a). “Şîm û Pesna Zînê”. *Hawar (Hemû Hejmar)*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Blau, J. (2017). Kürt Edebiyatı. Keskin, Abdullah (ed.), *Kürt Edebiyatı*. Heval Bucak (çev.). (11-42). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Botî, M. E. (2012). “Feryad”. *Hawar (Hemû Hejmar)*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Cambridge Dictionary. “Hero”.<https://dictionary.cambridge.org/tr/s%C3%B6zl%C3%BCk/ingilizce/hero> (Dîroka Xwegihandinê: 17.02.2020).
- Campbell, J. (2017). *Kahramanın Sonsuz Yolculuğu*. Sabri Gürses (çev.). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Cegerxwîn (2011). *Şerefnameya Menzûm*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Cegerxwîn (2014). *Sewra Azadî*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Celîl, O. û C. Celîl (2013). *Zargotina Kurda* (Cilt 1, 2). Diyarbakır: Aram Yayınları.

- Cindî, H. (1977). Şaxêd Êposa Rostemê Zalê Kurdî. <https://krd.riataza.com/2015/11/14/saxen-destana-rosteme-zal/> (Dîroka Xwegihandinê: 28.04.2020).
- Cindî, H. (2016). *Folklor Kurmancîyê*. Diyarbakır: Lîs Yayınları.
- Cîweleq, E. (2012). “Tarîxeq”. *Hawar (Hemû Hejmar)*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Cizirî, Ş. (1996). *Kultur û Raman*. Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Cizirî, Ş. (2017). *Tarih ve Uygarlık*. Diyarbakır: Lîs Yayınları.
- Çağrıç, M. (2010). “Şecaat”. *TDV İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 38. İstanbul: Türk Diyanet Vakfı.
- Çalışır, R. (2019). “Destana Rustemê Zal”. (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin Artuklu Üniversitesi TYDE.
- Çelikleş, S. (2018). “Tîpolojiya Lehengê Kurd Li Çarçoveya Nêrînên Joseph Campbell.” (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin Artuklu Üniversitesi TYDE.
- Çeper, R. (2014). *Ferhenga Etîmolojiyê*. İstanbul: Ar Yayınları.
- Çobanoğlu, Ö. (2010). *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*. Ankara: Akçağ Yayınları
- Çolemergi, İ. (2012). Sözlü Kürt Edebiyatında Destanlar. *İnatçı Bir Bahar*. Vecdi Erbay (drl.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Durmuş, İ. (1997). “Hamâse.” *TDV İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 15. İstanbul: Türk Diyanet Vakfı.
- Ehmedê Xanî. (2010). *Mem û Zîn* (hzl. Jan Dost). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Ehmedê Xanî. (2014). *Dîwan*. (hzl. Kadri Yıldırım). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Eliade, M. (2018a). *Ebedî Dönüş Miti*. Ayşe Maral (çev.). İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Eliade, M. (2018b). *Mitlerin Özellikleri*. Sema Rifat (çev.). İstanbul: Alfa Yayınları.
- Erhat, A. (1996). *Mitoloji Sözlüğü*. İstanbul: Remzi Kitabevi Yayınları.
- Feqiyê Teyran. (2014). *Jiyan, Berhem û Helbestên Wi*. (amd. M. Xalid Sadîni). İstanbul: Nûbihar Yayınları.

- Feridûn. (2012). “Xwenaskirin.” *Hawar (Hemû Hejmar)*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Firdevsî. (1994). *Şehnâme*. (Cilt 1, 2, 3, 4). Necati Lugal (çev.). İstanbul: Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları.
- Goodrich, N. L. (1999). *Sam, Zal ve Oğlu Rüstem*. Nergiza Tori (çev.). İstanbul: Peri Yayınları.
- Güncel Türkçe Sözlük. “Kahraman”. <https://sozluk.gov.tr/kahraman> (Dîroka Xwegihandinê: 17.02.2020).
- Kanar, M. (1996). “Firdevsî.” *TDV İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 13. İstanbul: Türk Diyanet Vakfı.
- Kanar, M. (2010). “Şâhnâme.” *TDV İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 38. İstanbul: Türk Diyanet Vakfı.
- Kaplan, M. (2016). *Türk Edebiyatı Üzerinde Araştırmalar 3: Tip Tahlilleri*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Karataş, T. (2007). *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Keskin, N. (amd) (2019). *Zêrka Zêra*. İstanbul: Avesta Yayıncılık.
- Kızılkaya, M. (2001). *Kayıp Dîwan*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Kültürâl, Z. (2010). “Şâhnâme.” *TDV İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 38. İstanbul: Türk Diyanet Vakfı. 290-292.
- Melayê Cizîrî. (2012). *Dîwan*. (amd. Emin Narozi). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Mîrzengî, X. (1999). *Ristemê Zal*. Stockholm: Weşanên Rewşen.
- Namî. (2012). “Marş.” *Hawar (Hemû Hejmar)*. Diyarbakır: Weşanên Belkî.
- Ocek, N. (2019). *Destana Rustemê Zal*. Ankara: Sîtav Yayınları.
- Onay, A. T. (2016). *Açıklamalı Divan Şiiri Sözlüğü*. Ankara: Berikan Yayıncılık.
- Oxford Learner’s Dictionaries. “Hero”. <https://www.oxfordlearnersdictionaries.com/hero> (Diroka Xwegihandinê: 17.02.2020).
- Pala, İ. (2018). *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapı Yayınları.

- Polat, E. (2006). H.1310 (M. 1892) Ve H. 1316.1317.1318 (M. 1898.1899.1900) Tarihli Bitlis Vilâyeti Sâlnâmelerinin Transkripsiyon Ve Değerlendirmesi. (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Erciyes Üniversitesi SBE.
- Polat, E. (2007). *Ristemê Zal*. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Raglan, L. (1998). “Geleneksel Kahraman”. Metin Ekici (çev.). *Milli Folklor*, Cilt 5, Sayı 37, 126-138.
- Rank, O. (2018). *Kahramanın Doğuş Miti*. Gökçe Yavaş (çev.). İstanbul: Pinhan Yayıncılık.
- Ritter, H. (1993). “Firdevsî.” *İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 4. İstanbul: Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları.
- Ritter, H. (2011). *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi Karşılaştırılmalı Edebiyat Metinleri*. (ed. Mehmet Kanar). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Rosenberg, D. (2003). *Dünya Mitolojisi*. İstanbul: İmge Kitabevi Yayınları.
- Sebrî, O. (2004). *Dîwana Osman Sebrî*. A. Balı (berhevkar). İstanbul: Weşanên Perî.
- Seyidoğlu, B. (2017). *Mitoloji Üzerine Araştırmalar*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Siyahpoş. (2018). *Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal*. (amd. Bedirxan Amedî) İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Şerefhan Bitlisi, (2015). *Şerefname* (Cilt 1). Abdullah Yegin (çev.). İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Şerîfi. (1999). *Şehnâme Çevirisi*. (Cilt 1, 2 ,3). (hzl. Zuhâl Kültürel ve Latif Beyreli). Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Şişman, B. ve M. Kuzubaş (2017). *Şehname'nin Türk Kültür ve Edebiyatına Etkisi*. İstanbul: Ötüken Neşriyat.
- Tek, A. (2018). “Felaketin Belleği: '66 Varto Depremi ve Etrafında Oluşan Kolektif Hafıza.” *Kebikeç*, Sayı 45, 145-170.
- Temo, S. (2007). *Kürt Şiiri Antolojisi*. (Cilt 1). İstanbul: Agora Kitaplığı.
- Tökel, D. A. (2016). *Divan Şiirinde Şahıslar Mitolojisi*. İstanbul: Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Yayınları.

- Vali, S. (2015). “Nêrîneke Giştî li Şehnameya Firdewsî û Şehnameya Kurdî.” (ed.) Ramazan Pertev. *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*. (275-296). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Vali, S. (2018). *Kurdên Yarsan*. Sevda Orak Reşitoğlu (çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Yıldırım, K. (2016). *Xaniyê Duyem: Hacî Qadirê Koyî*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Yıldırım, N. (2008a). “Rüstem-i Zâl.” *TDV İslâm Ansiklopedisi*. Cilt 35. İstanbul: Türk Diyanet Vakfı.
- Yıldırım, N. (2008b). “Rüstem-i-Zâl.” <https://nyildirim.wordpress.com/2008/02/01/18/%E80%9Crustem-izal> (Dîroka Xwegihandinê: 15.03.2020).
- Yıldırım, N. (2015). *İran Mitolojisi*. İstanbul: Pinhan Yayıncılık.

KURTEJIYAN

Ferda BİNGÖL, di sala 1993an de li Mûşê ji dayîk bû. Dibistana seretayî li Tetwanê, dibistana navîn û lîseyê li Muşê xwend. Di sala 2014an de li Zanîngeha Dîcleyê beşa Mamostetiya Zimanê Tirkî xelas kir. Di sala 2017an de di Zanîngeha Mûş Alparslanê Enstituya Zanistên Civakî beşa Zîman û Çanda Kurdî de dest bi lisansa bilind kir. Ji sala 2014an pê ve li Mûşê wek Mamosteyê Zimanê Tirkî dixebite.

ÖZGEÇMİŞ

Ferda BİNGÖL, 1993 yılında Muş'ta doğdu. İlkokulu Tatvan'da, ortaokul ve lise öğrenimini Muş'ta tamamladı. 2014 yılında Dicle Üniversitesi Ziya Gökalp Eğitim Fakültesi Türkçe Eğitimi Bölümünden mezun oldu. 2017 yılında Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında yüksek lisans programına başlamıştır. 2014 yılından beri Muş'ta Türkçe Öğretmeni olarak görev yapmaktadır.